

Naverok

Sergotar	2
WERGER	
Karl Valentîn: Amadekar; Welîd Murad	3
Havîna Hespê Spî; William Saroyan	5
Bêdeng; A. Hicrî Îzgören	9
Mirovê Bêçav: Mackinlay Kantor	11
DOSYE: Helîm YÛSIV	
Nivîsandin Çavê Sêyem e: Hevpeyvîn Bi Helîm Yûsiv Re	13
Çîroknivîsê Ku Ji Mirinê Jiyanê Vedijîne; Nezîr Melle	14
Helîm Yûsiv Di Stêrên Esmanê Bilind De; Qado Şêrîn	22
Helîm Yûsiv Û Derdên Koçberiyê; Heyder Omer	24
Zarokên Bê Zarokti; Husên Duzen	27
Destên Spasdar; Dilawer Zeraq	31
Xwendinek Di Kurteçîroka Kurdî De; Îsmail Badî	35
HelîmYûsiv: Destpêşxerî Û Hêvîxwazî; Sebrî Silêvanî	38
Dengê Bêdengiya Binxetiyar; Ayhan Meretowar	41
Şûrê Surrealîzmê Dikare Çi Bibire?; Rêzan Tovjîn	43
	46
HELBEST	
Peyvê; Serkan Birûsk	49
Baz; Dost Çiyayî	50
Zarokên Dilkoçber; Dilşad Serkanî	51
CERIBANDIN	
Şûrê Ronesansa Kurdan: Model; Evdile Koçer	52
Wêjeya Eberî, Bîneşeya Dîrokî; Hesen Îrandost	54
BÎRANÎN	
Xalê Kiriv; Behlûl Zelal	57
ÇÎROK	
Cotek Sol; Ehmed Ronîar	60
Mari; Nezîr Silo	61
ÇAND	
Dengbêj Tehsinê Evdirehman: Amadekar; Hilmî Akyol	63
Ruşwet: Berhevkar; Rojîn Zarg	64

Kovara W Kovara dumehane Hejmar VII Rezber-Kewçer 2005 Xwedî û Berpirsiyara Nivîsaran Rojîn Tûrkekul Edîtor Dilawer Zeraq Şewirmendê Hiqûqê: Av. Muharrem Erbey Navnîşan: Înönü cad. Magûl iş hanı. No: 60 Diyarbakır	Çapxane: Berdan Matbaa Mizanpaj: M. Janbar-M. Mîrxan- D. Zeraq e-mail: kovaraw@yahoo.com kovaraw@hotmail.com Web: www.kovaraw.com Nivîsên ku ji bo weşanê ji kovarê re tên şandin li xwediyê wê nayê vegeandin. Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.	Şertên Abonetiyê: Nava Welêt, Salek: 20.000.000.TL.(20.YTL) Welatên Dereke, Salek: 60 Euro Banke: Rojîn Tûrkekul Ziraat Bankası Merkez Şubesi/ Diyarbakır Nimroya Hesaba Bankayê: TL: 101 27 71 Euro: 1044279
--	---	---

YEKSALIYA KOVARA W

Salek berê me biryara çêkirina dergûşekê da. Lê wek tê zanîn çêkirina dergûşekê gelek zor e. Car caran hîn Xwedê ew nedaye dimire. Car caran virnî Xwedê dide. Car caran jî kêmendamiya û kêmlibat Xwedê dide. Kovara W jî, tevî van metirsiyan Xwedê ew da.

Piştî hatina 'W' yê, gelekani digot em nizanin nêr e an mê ye. Hinekan digot wekî kor xuya dike, hinekan jî digot ker e, dengê me naçiyê. A herî ecêb ew bû ku hinekan digot we çima bê(yî) me ev dergûş çêkiriye.

Gelek dergûşên me yên wek 'W' yê çêbûn. A yekemîn, navê wê Rewşen bû: Mirov qîmîş nedibû lê binêre. Bi gelek zor û zehmetî me ew gihand çar saliya wê, lê qeda li felêkê bikeve. Ew jî destê me girt. Piştî keçeke me ya din çêbû: Me got bila navê rewşenê bimîne, lê em jiyanê jî bidin ber navê wê û bila bibe Jiyana Rewşen. Jiyana Rewşen jî wek xwişka xwe bedew bû. Gava te lê dinêrî te digot qey Zîna Zêdan e û dimeşe. Felaka xayîn ew jî jî destê me girt. Helbet em gelek li ber ketin. Gelek dem û zeman mîna ku em lal bûbin, peyv bi ser zimanê me ve neket. Me got were em nameyan jî van zarokan re bişînin. Me her roj nameyek dişand. Piştî keçeke din çêbû. Me nameyên ku şandibûn dan ber navê her du xwişkên wê û navê wê lê kir: Rewşen-Name. Gelek kêfa me hat. Lê sed heyv û mixabin emrê wê ancax bi qasî çar mehan domand û ew jî çû... Piştî her sê Rewşenan, dergûşa me çêbû. Me got gelo em çi navî lê bikin. Her yekî navek got. Yekî got bila Lîs be, ê din Zaremya, ê din, Sersot... Em serê we neêşînin, Îrfan Amîda rabû got ka bisekinin bila bixeberdanê keve em hîna nav lê bikin. Em li benda xebardana dergûşê man. Ber êvarek bû: Ha me dît ku deng pê ket û got; "û W, û W..." Îrfan dîsa peyivî û got; "Dergûş dibêje; 'W'. Xwedê temenekî dirêj bidîyê, de bila navê dergûşê bibe W" Gelek kêfa me jî jî navê 'W' ê re hat. Her yekî jî yê din re digot "Kovara W, delaliya me."

Piştî me ev nav jî lê kir, gelek nakokî derketin. Hindek jî cîranên me got; "Xwedê xêra we bide, ma di nav navê 24 hezar pêxemberan de we ev nav dît, ê din digot her lingekî 'W' ê li hêlekê dinihêre... û gelek şiroveyên din.

Me tu gotin li ser van gotinan zêde nekir.

Em dibêjin; pirêzeya dergûşê li ber çavan e; tevî hemû xêr û gunehên xwe...

Û va ye dergûşa 'W' e bû yeksalî.

De ka werin em hemû bi hev re bêjin:

Rojbûna te pîroz be Kovara W!

Yeksaliya te pîroz be Kovara W!

Nîşe: Xwendevanên delal, di hejmara 7an de me wekî nûbûnekê logoya kovarê guhert û ji ber kambaxiya rewşa aborî, me bihayê kovarê zêde kir.

Karl Valentin

Werger û Amadekar: Welîd Murad

Navê wî yê rastî "Valentin Fey" e. Ew di sala 1882yan de li bajarê Münchenê (Munîh) li Elmanyayê, ji dayik bûye. Piştî dema dibistanê û qerebalixa xwendinê, ew di sala 1902yan de berê xwe dide dibistana huner û şanogeriye û ew qonaxa destpêka wî ye ku bi berfirehî tê naskirin.

Di sala 1908an de, di şanoyeke ku wî bi xwe amade kiribû de, bi serkeftineke bêhempa jê derdikeve û deng vedide.

Di sala 1911ê de, hevnasînê bi "Liesl Karlstadt" re çêdike û wê ji xwe re dikê heval (jin). Wan her duyan bi hev re di sala 1915an de dest bi pêşkêşkirina şano û lîstikan li Münchenê kirin. Di salên bîst û sihê de, ew gelek caran li Wienê paytexta Austuriyê, li Zurichê paytexta Siwêseyê û li Berlinê paytexta Elmanyayê bi huner û şanogeriya xwe dibûn mêvan. Li wan cîgehên lîstîk û parçeşano pêşkêşî cemawerên xwe dikirin.

Di sala 1931ê de, Valentin ji bo xwe û hunera xwe, şanogehêk taybetî damezirand. Ji bo wê mebest û armancê jî, hemû sermiyana xwe jê re terxan kir. Û tiştê di wan salan de kom kiribû, tev di oxira wê de xerc kir. Ev şanogeh di sala 1934an de, bi şêweyekî fermî hate vekirin û karên hunerî tê de hatin pêşkêşkirin. Lê mixabin, piştî salekê, ji ber eger û astengiyên aborî, neçar dimînê ku wê dîsan bigire. Hingê, ne tenê kesayetiya wî, lê belê di wê demê de, ya hemû welatên Ewrûpayê rastî gelek pîrsgirêkan tên. Û êdî berê wan dikevê bi



aliyê cenga cîhanê. Dema wê cenga bi qirêj dest pê kir, berhemên Valentin ên şanogerî jî qels bûn. Vêca kêman caran li ser textebanên şanogehan dihat dîtin. Tevî wan mercên dijwar, wî hewl daye ku gelek diyalog, monolog, skêç, çîrok û parçeşanoyan binivîsîne. Piştî ceng radiweste û welatê wî di nav xwelî û wêrankirinê de dimîne, di navbera salên 1947-1948an de, ew hewl dide ku dîsan li şanogeriye vegere. Lê sed mixabin, êdî dem nema alîkariyê pê re dikê û divê xatirê xwe ji jiyanê bixwazê. Di roja 9ê sibatê sala 1948an de bar dike û diçê ser dîlovaniya Xwedê.

Heya niha hezkiriyên wî di nav gelê wî de pir in. Wî bi şanoyên wî, bi komedyayên wî bi bîr tînin. Heta radexa gelek mirovên dema wî, berhemên wî ji ber kiribûn û bi sirûştî dixwendin.

Di sala 1920î de, helbestvan û şanogerê Elmanî yê gewre Bertolt Brecht, di nameyekê de ji hevalekî xwe re wiha dinivîsîne: "Do êvarî, ez û Valentin li kabereyê bi hev re rûniştibûn. Wî ez gelekî kenandim û hindik mabû ji ber kenê ez ji ser paldankê bikevim."



Heznameyeke Qeşmerokî
(Monolog)

dilberê.....!

(li vir axiver navê xwe dinivîsîne)

Ez destê xwe yî xemgîn û dilo van li destikê pê nûsa pirtikî radipêçim, da ku ji bo te vê nameyê binivîsînim. -çima tu ji mêj ve, nema ji min re dinivîsînî?- hingê wî çaxê te ji nû ve dest bi nivîsandinê kiribû, heger min ji te re nenivîsandiba, ne jî te ji min re dinivîsand! -do bavê min jî ji min re nivîsandibû, wî nivîsandibû ku wî ji te re nivîsandiye. Lê li ser wê te peyvek tenê jî ji min re nenivîsand, ku bavê min ji te re nivîsandiye.- heger te ji min re binivîsanda, ne ku bavê min ji te re nivîsandiye, wilo min ê jî ji bavê xwe re binivîsanda, ne ku te dixwest ji wî re binivîsînî, lê mixabin dema te ji

nivîsandinê re nebû, nexwe te yê ji wî re binivîsanda ne? Heger te nikaribû binivîsînî, jixwe ew tiştekî dî ye, hingê ez yekcar nema ji te re dinivîsînim, ji ber hingê nivîsandin bêtir xêr û bêtir derd ye. -lê wisan ez bawer dikim tu dikarî binivîsînî û tevî wê heger ez ji te re binivîsînim jî! tu ji min re nanivîsînî.

Va ye ez nameya xwe bi dawî dikim û pê re hêvî dikim, ku dawî tu ji min re binivîsînî. Nexwe ev nivîsandina ku niha ez wê ji bo te dinivîsînim, wê bibe nivîsandina dawî. -heger careke din tu nexwazî binivîsînî, wisan bi kêmanî ji wî namegihênê ku wê nivîsara min ji te re bîne re bibêje, kengî û li kîjan cihê em dikarin îro hevrûyî hev bibin.

(axiver, bi van bêjeyan re, nameya xwe dîsan da namegihên:)

Ji dêvla min, şîreteke xweşik lê bike û ez ê katijmêr duduyê nivê şevê li enîşka cehda "dachauerstrasse" û li meydana "Isartorplatz", li benda wê bim.

(axêver kwîtand (fîkand), an parçeya dawî ya ji strana xwe got û çû.)

*Ev kurtedanasîn û her wiha ev monolog, min ji pirtûkeke danehevî ku baştirîn berhemên wî di nav rûpelên xwe de kom dike, girtine. Û ev tekstên di vê pirtûkê de cihêwaziya wan ji yên di her heşt cildên wî de nîn in. (Karl Valentin, Sämtliche Werke in acht Bänden. Herausgegeben von Helmut Bachmaier und Manfred Faust. Piper Verlag, München 1991 ff: Karl Valentin, berhemên giştî di heşt cildan de)

Havîna Hespê Spî

William Saroyan



Rojek ji wan rojan, berê neh saliya min jiyan bi xweş xeyalên me yê nefsî xemilandi bû. Pismamê min Murad, ji xeynî min, ku ji alî her kesî ve nehs û xerab dihat nasîn, saet çarê sibehê hatibû ber deriyê şibaka menzela min û teqêreq ji camê anî û ez şiyar kirim.

Wî bangî min kir û got, "Aram."

Ez ji nav nivînan hilçenîm û min li şibakê mêze kir. Min bawerî bi tiştê dît neanî.

He ne sibeh bû, lê berbangeke havînê bû. Nêzik ne dûr, bi fecrê re zerayî ketibû erdê û êdî min dizanî ne xewn e.

Pismamê min Murad li hespekî spî û xweşik siwar bû. Min serê xwe ji şibakê daqûlî der kir û çavên xwe firkandin.

Wî bi ermenîkî got, "Erê ev hesp e. Ne xewn e. Eger tu dixwazî siwar bibî, bilezîne."

Dizanim pismamê min jî wek her kesên bi kar û barê dinyayê daketî xwe diaveje nav êgir. Ji bo zindîbûnê xwe dixist nav rîsk û talûkeyan. Lê min tu carî hêviya vî tiştî jê nedikir.

Ya rastî, hesp li hişê min bû û min gelek dixwest li hêsp siwar bim.

Ev tişteki pir xweş e.

Lê li aliyê din, em gelekî hejar bûn.

Loma ev tiştê bi çavên xwe dîtî min ê tu carî jê bawer nekira. Qirûşek qûl bi me re nin bû. Eşîra me gelekî hejar bû. Bavik û malbatên eşîra Garogelaniyan li hemû derê dinyayê hejar in. Hemû kesên ji xeynî extiyarên malbata me eceb diman gelo em çawan û ji ku derê pereyan ji bo gezek nê nê hûrê xwe pêde dikin. Tiştê herî girîng û balkêş, ev yazdeh sed salan bi duristbûna xwe dihatin nasîn. Heta niha dewlemendbûna me, ji dilê xwe re, çawa ji dinyayê hez dikin wisa dihezîrîn. Ya pêşî em bi hisyet in, ya din durist in û ya dawî em ji rastî û qencyê bawer in. Dev ji diziyê berdî, heta niha kes ji me neqesidiye nan û ava tu kesî.

Çi qasî ez wisa bifikirim jî talî min hêsp dît û rewneqdariya wî pir şîrîn bû, dûre min hîsa behn danûstendina wî ya ku hiş ji serê yekî dibe, kir. Min nedixwest ez gelek dilê xwe bi hêsp xweş bikim. Baweriya min nebû ku hesp ligel min û pismamê min Murad, an jî bi kesekî ji malbata me re bimînê. Ha xewn, ha rast ferq nedikir. Min dizanî pismamê min Murad nedikarî hesp bikire û jixwe eger nedikarî bikiriya gerek ew bidiziya. Min nedixwest yeqîn bikim ku wî hesp diziye.

Bêguman, tu kesî Garogelanî ne diz e.

Pêşî min li pismamê xwe, piştî li hêsp qenc meyzand. Aramiyeke olperestî, bêhis û deng di navbera wan de palan bû û vêca wexta min ew wisa dîtin neqebîna xêlîl û celîl de mam. Ji aliyekî ve kefa min ji wan re dihat ji aliyekî ve jî ditirsiyam.

Min got, "Murad" û jê pirsî, "Malnexerabo, te ev hesp ji ku dizî?"

Wî got, "Eger dixwazî siwar bibî, zû xwe ji şibakê biavêje."

Ha vêca rast e. Ne hewceyî pirseke din e.

Teqez hesp diziye. Va ye min vexwendî ajotinê dike, êdî ez bi dilê xwe me herim an neçim.

Erê, tiştê dizanim, bi aqilan dikeve, diziya hespekî ji bo siwarbûnê ne dizî ye û ne wek diziya tişteki din ji bo pereyan e. Eger hûn xwe têxin bedêla min û pismamê min Murad, hûn ê ji bibêjin ne dizî ye. Çimkî, piştî min dît ku hesp ne ji bo firotinê hatiye dizîn û helbet me yê tu carî nefirota.

Min got, "Bise, ka ez cilên xwe li xwe bikim."

Murad got, "Baş e. Naxwe bilezîne."

Min xwe di nav cilan re kir.

Piştî, xwe ji şibakeyê avêt hewşê û li pişt pismamê xwe Murad siwar bûm.

Wê salê mala me li keviya bajêr, li Walnut Avenue bû. Pişt xênî tev melbend (beyar) bû. Her dever rez, dehl, werz, coyê avê û rêkên şivanan bûn. Piştî sê deqeyan me sikak li xwe ba da û em gihan Olive Avenue. Piştî hesp dest bi çargavkan kir. Bêhn, danûstendina hewayê hênîk kat di dilên me de şîn dianî. Hiskirina revîna hesp a çargavî pir xweş bû. Muradê pismam ku di malbata me de herî şet e, dest bi strandinê kir. A rastî, dest bi orînê kir.

Hemû malbat xwedî taybetmendiyeke, xwedî rayeke dînîtiya veşarî ne. Muradê pismam bi xwe ew neviyê xweristî eşîra me bû. Berî wî apê min Xosrevo li newala San Joaquin wek betlekî girs, simbêlboq û porreş û hêrsok, bêsebr û bêhteng ku bi mirovan re bi orîn dipeyivî û wan radiwestand, seraqet bi dengêki bilind digot, "Xem nake, tişt nabe."

Ev her tişt bû, ma kesî ji bavê xwe dikarî tişteki din bêje. Carekê kurê wî Arak ber bi berberê ku bavê wî simbêlên xwe lê diçilpand ve bezî. Berber heşt avaniyan dûrî xênî bû û ji bavê xwe re got, agir bi mal ketiye. Xosrevê li ser kursî rûniştî bi orîn got, "Xem nake, tişt nabe."

Berber got, "Lê heyran, va kurik dibêje agir bi mala te ketiye gidî!"

Xosrev bi hers û dengêki bilind got, "Bes e!, ez dibêjim xem nake!"

Muradê pismam nik li wî hatiye, lê bavê Murad Zorab, tenê karê wî sivik e û tişteki din ê wî li wan nehatiye. Nizanim ev eşîra me çawa ye. Mirovek dikare bibe bavê yekî yê

bedenê, lê ev nayê wê wateyê ku ev mirov dê bibe bavê can û rih ji. Esas gava siruşt belav kirin li para malbata me behtengî û hêrsokîbûn ketiye.

Me hesp diajot û Murad distrand. Dengê wî li ve çolê ji alî her kesî ciranê me dihat bihistin û dizanîn em li ve çola beyar in. Me hesp heya dikarî bi revî diajot.

Dawî, Murad got min, "Peya be, ez dixwazim tenê li hesp siwar bim."

Min got, "Ma tu yê destûra min bidî ku ez ji tenê li hesp siwar bim?"

Pismam got, "Peya be. Hesp diingire."

Min got, "Hesp wê destûra min a ajotinê bide."

Wî got, "Em ê niha bibînin. Lê ji bîr neke, ez xwedî şewazek taybet im."

Min got, "Baş e, ma tenê şewaza te heye, ez ji xwedî şewaz im."

Wî got, "Tu bi qedrê Xwedê kî! Peya be, me tenê bihêle."

Min got, "Baş e, lê tu ji bîr nekî haa, te destûr da min ku tenê li hesp siwar bim."

Ez ji hesp peya bûm. Pismamê min Murad bi paniya xwe li hesp da û bi dengêki bilind qîriya, "Vazîre, dêh!"

Hesp rabû ser her du piyen xwe yên dawî û pîreniyek ji dev û bevilê hesp hat û ji nişka ve xurt revî ku min heya niha tişteki ev qasî xweş nedîtibû. Murad li erdên ku giya lê ziwa hesp bezand aliyê din û nêzikî coya avê bû hesp di ser coyê ve qevizand. Piştî pênc deqeyan şil û pil veqeriyên.

Roj hildihat.

Min got, "Ka vêca dora min e."

Pismamê Murad ji hesp peya bû.

Wî got min, "Siwar be."

Min xwe avêt ser piştê hesp û piştî kêlikê tirseke dijwar xwe bi qirika min girt. Hesp nedilivî.

Pismamê min got, "Pihînekê li masûlkeyê hesp bide. Tu li hêviya çi yî? Berî ku hemû kes şiyar bin gerek em hesp têxin cihê wî."

Min pihînek li masûlkeyê hesp xist. Careke din pîrênî ji dev û bevilên xwe anî. Piştî, çargavkî beziya. Min nezanî gelo ez çi bikim. Ji dewla ku hesp li nav erdan ber bi coyê ve baz de, wî berê xwe da rêka xwarê, bezî ber bi

rezê Dikran Halabian ve; xwe di ser mêwan ve hilavet. Berî bikevim hêsp xwe di ser heft mêwan ve hilavetibû. Piştî wî beza xwe domand.

Murad bi rev hat xwe berda binê rê.

Ew bi ser min hîlbû û got, "Ez qet li ber te nakevim. Zû rabe ser xwe. Gerek em dîsa wî hespî zeft kin. Tu bi vê riyê de here, ez ê jî bi wî alî de biçim. Eger tu nêzik bûyî heya ez bêm hesp neterqîne."

Min xwe bera biniya rê da û Murad jî cû nav erdan ber bi coya avê, wî aliyê din ê erdan ve.

Piştî qederê nîv saetê wî hesp dît û ew bi şûn de anî.

Wî got, "Baş e. A niha hemû dinya alem şiyar bûye."

Min got, "Em ê a niha çi bikin."

Wî got, "Ma em ê çi bikin, an em ê hêsp şûnde bidin, an jî heya sibê şevqê veşêrin"

Ji dengê wî tu xemgînî ne diyar bû û min dizanî dê hêsp veşêre û bi çi awayî be jî bi şûnde nede.

Min jê pirsî, "Ma tu yê hêsp li ku veşêrî?"

Wî got, "Ez derekê dizanim."

Min jê pirsî, "Ev jî kengî ve te ev hesp diziye?"

Ji nişka ve ket dilê min ku wî tenê vê sibehê jî bo kêliyê li hêsp siwar bûye, ew aniye û jixwe dizanî ku ez çi qasî li siwarbûna hespan hez dikim, loma hatiye gazî min jî kiriye.

Wî got, "Kî dibêje ku min hesp diziye?"

Min got, "Werhasil, Ji kengî ve tu her sibehê li hêsp siwar dibî?"

Wî got, "Hey ne jî vê sibehê ve ye!"

Min got, "Ma rast e?"

Wî got, "Helbet na, lê eger hin pê hisiyan, dizanî tu yê çi bibêjî ne? Ez naxwazim em her du derewîn derkevin. Tiştê tu zanî ku em jî vê sibehê ve li hêsp siwar tên."

Min got, "Baş e, tamam."

Ew hêdî hêdî ber bi hêsp ve çû, da wî têxe koxa rezê terikandî ku ew rezê rojekê Fetvajiyane cotkar şanazî pê dikir. Li koxê xamkêsan û resiyên ziwa hebûn. Em bi ber malê ve meşiyân.

Wî got, "Ne hesan e yek hespekî bi xweşikayî bihewîne. Pêşî hêsp xwest bi çolê

keve, lê wek min got, jî hespan fêr dikim. Ez dikarim wî bihewînim û çi dixwazim pê bidim kirin. Hesp jî min fêr dikan."

Min pirsî, "Tu bi Xwedê kî, ev tu çawa vê dikî?"

Wî got, "Em bi hev tê digihîjin, dilên hev dizanin."

Min got, "Temam, lê ev têgihîştinek çawan e?"

Wî got, "Yek gelek hesan û bi duristî ye."

Min got, "De baş e, bi hêvî me rojekê fêrî têgihîştina vî rengî hespan bibim."

Wî gote min, "Tu hê zarok î, gava tu hinekî din mezin bûyî; derdora sêzdeh salan tu yê bizanibî çawan e?"

Ez çûm malê û taştêyek gelek xweş bi dilê xwe xwar.

Wê piştî nivroyê, apê min Xosrov jî bo qehwê û titûnê hatibû mala me. Ew li hêwanê rûniştibû û qurtînî jî qehweyê dianî, titûna xwe dikişand û rojên berê yên li welatê xwe bi bîr dianîn. Piştî, mevanekî din hat. John Byro, cotkarekî Asurî ku bi tena serê xwe dijiya û fêrî axaftina ermenîkî bûbû. Diya min qehwe û titûn jî mêvên re anî. Wî cixareyek pêça, vexist û hilmek kişand nava xwe.

Piştî, kesereke kûr berda û got, "Min tu tişt jî wî karî fêr nekir. Ev heyvek e ku hê jî hespê min winda ye."

Apê Xosrev gelekî qehirî, kire bire bir got, "Vêca çi bû hespê te venegeriya malê, tişt nabe. Ma em hemû jî welatê bav û kalên xwe terke-dinya nebûne? Malhişaro, me tu jî xwe fêdî nakî ku di pey hespekî re dikûzî." John Byro got, "Erê ma ne xema te ye yabo heyran, efendî tu li mala xwe paldayî, hesanî tu wisa dipeyivî. Tu xweşbûna gerê jî nema. Ma ez ê bê hesp çawan bikim?"

Apê Xosrev bi orîn got, "Xem nake, tişt bi hespê te nayê"

John Byro got, "Ev deh mîl in dimeşim heya gihîştim vir."

Apê Xosrev bi birebir got, "Tu li ser xwe yî û piyên te saxlem in. Vêca çi bûye..?"

John Byro got, "Heya ez hatim paqê min î çepê jî êşê qut bû."

Apê Xosrev bi dengekî bilind got, "Tişt nabe, tişt nabe..."

Cotkar got, "Şêst dolar min mesref li wî hespî kiriye."

Apê Xosrev, "Oo to...! Tifi li peran!"

Ew rabû ser xwe, bi lez derket derve û bi şingînî derî dada.

Diya min got, "Mirovekî diltenik e û gelek meyla welatê xwe dike feqîrê Xwedê."

Cotkar bi dût ket û ez jî bi lez revîm çûm mala Murad.

Ew li bin dara xoxê rûniştî bû bi çivîkê re diaxivî û baskê çûkê boqijê ku nedikarî bifire dicebirand.

Wî got, "Xêr e, çi bûye?"

Min got, "John Byro, hat mala me, hespê xwe dixwaze. Ev mehek e ku hesp li cem te ye. Ez dixwazim tu sond bixwî heya ez fêrî siwarbûnê nebim tu hêsp nedî."

Murad gote min, "Heya salekê ancax tu fêrî siwarbûnê bibî."

Min got, "Em dikarin salekê hêsp li cem xwe bihêlin."

Muradê pismam piyê xwe li erdê da û bi dengekî bilind got, "Te go çi!? Ma tu mirovekî Garogelanî vexwendî diziyê dikî? Gerek hesp here ji xwediyê xwe re."

Min got, "Kengî?"

Wî got, "Pir pir heya şeş mehan."

Wî çivîk ber bi hewayê ve firand. Çivîkê li ber xwe da, lê ev du car in ku dikeve, cara dawî firî çû nav esmên, dût û bilind.

Ev du hefte ne, me serê sibehan hespê li koxa erdê terikandî veşartî derdixist û em lê siwar dibûn. Û her sibehê gava dora min a siwarbûnê dihat, hêsp xwe li nav mêwan û darên biçûk dixist, ez li wan deran ji ser xwe diavêtim û ew tenê dibezi bi dût ve. Lê dîsa ez ji ya xwe danediketim û min hêvî dikir rojekê wek Muradê pismamê xwe fêrî siwarbûna hêsp bibim.

Sibehê li ser rêya rezê Fetvajîyan em leqayî John Byro yê ku diçû bajêr hatin.

Murad gote min, "Bise, ez ê biaxivim. Ez jî cotkaran fêrî dikim û dizanim bi wan re biaxivim."

Murad gote cotkarî, "John Byro, sibeha te bi xêr."

John Byro şaşmayî çavên xwe li ser hêsp gerand.

Wî bersiv da, "Wey sibeha we jî bi xêr xortno."

Kurên hevalê min, navê hespê we çi ye?"

Murad bi ermenîkî got, "Dilo ye."

John Byro got, "We çi navekî xweş li wî hespê xweşik kiriye, yaho. Lê ez dikarim sond bixwim ew hespê min î berî niha bi çend hefteyan ji min hatî dizîn e. Bi destûra we ma ez dikarim li devê wî binêrim?"

Murad got, "Erê çawan, ser çavan, kerem bike!"

Cotkaro li nava devê hêsp meyzand.

Wî got, "Diran bi diran. Eger min malbata we nizaniya min ê sond bixwara ku ev hesp ê min e. Gelek baweriya min bi duristbûna malbata we tê. Li qisûrê nenêrin, mirovên dilwaswasî bawer nakin heya bi çavên xwe tiştan nebînin. Diyar e ev cewiyê hespê min e. Oxira we ya xêrê, xortino."

Murad lê veğerand, "Oxir be ji te re jî, xalê Byro."

Roja din serê şeveqê me hesp bir û xist koxa John Byro ku li nav rezê wî ye. Kûçikin bêdeng li der dora me çûn û hatin.

Min bi tirs û hêdika kir pistepist û got, "Kûçikan dibînî... Ez ditirsim ewteewtê bikin û me bidin dest!"

Wî bi rehetî got, "Ew ê ji hinên din re bikin ewtîn. Ez jî kûçikan fêrî dikim û li gor dilên wan diçim."

Pismamê Murad çengên xwe di stûyê hesp re birin û bêvila xwe danî ser bêvila hêsp û çend caran piçekî dewisand û piştî em bi dût ketin.

Wê piştî nîvroyê John Byro yê siwarê hespê xwe hat mala me. Hespê xwe nîşanî diya min dida û digot ev hespê wî yê hatî dizîn veşariyaye malê.

Wî digot, "Êdî ez hew dizanim çi bêjim. Sed carî şikir ji Xwedê re. Hespê min ji berê xurttir bûye."

Apê Xosrevê ku li hêwanê rûniştî, dîsa xwe aciz kir û bi dengekî bilind got, "Ma min negot, bitebite heyra! Xem nake, tişt bi hespê te nayê.."

wergera ji îngilîzî: Aydın Rengin
renginaydin@hotmail.com

Bêdeng

A. Hicri İzgören



Bêdeng dima tu û berf dibariya

Di çavên te de dest pê dikir şevê
Di pirtûkên nîvcomayî de didomiya
Kêreke ko bû roja ku li ser eniya me dihat tûjkirin
Wext awênayên şikestî bûn

Bêdeng dima tu bênavber bêdeng dima
Û berf dibariya

Rêbendan porê min ê gewrbûyî bû, dicemidîm
Sibat ewladekî bêxêr bû, qaçax bû
Û dûr bû havîn dêyek bû
Şopên adarê li ser bedena min e
Roj wek cêwiyên heman xeberoşkê bûn
Nîsan di porê min de şil dibû tim

Bêdeng dima tu bênavber bêdeng dima
Û baranê dest pê dikir

Em pir li hêviya xwe hiştin
Qet di wextê xwe de nehat Gulan
Pûşper Aram bû ango kesekî wisa bû
Wek dermankirina birînan bû
Belkî Tîrmeh xewnek bû
Tebax bi stêrkan digirt ser şeva me
Gulek di ser sûc de dihat zeftkirin
Îlon qîrînên zarokekî bû

Bêdeng dima tu bênavber bêdeng dima
Û bê dest pê dikir

Wek pelekê rêya xwe windakirî bû Cotmeh
Me xwe bi wexêrî sirgûnan dikir
Gelo yên mayî em bûn an yên çûyî, nedihat zanîn
Mijdar di bê de pêşrewek bû
Û hebekî Itrî
Berfanbar bi dengê xwe dilerizî

Her çi qas wek xewneke bêhnçikyayî bibihure jî
Tu demsal bi qasî çavên te
Bêmerhamet bi kar neanî neşter

Bêdeng dima tu bênavber bêdeng dima
Û berf dibariya

Wergera ji tirkî: Lal Laleş, Yaqob Tilermenî

Mirovê Bêçav

Gava ku mîrza Parsons ji otela xwe derket di kolanê de parsekek ber bi jêr ve dihat. Ew parsekekî kor bû. Di destê wî de gopalek kevn hebû û wekî kesên ku nabînin bi baldarî û hinek jî bi sextekarî pêşiya xwe dipeland. Bi pirç û gewde stûr bû. Paştû û bêrîkên sakoyê wî dohn girtibûn û destê wî li ser qirika gopal bêber dadileqiya. Tûrikekî reş avêtibû navmilê xwe. Wer dixuya ku tişteki wî heye bifroşe.

Hewayê biharê bû. Tav li ser asfaltê diqijilî û derûdor germ dikir. Mîrza Parsons li ber otela xwe sekinî û bala xwe da teqûreqa mirovê ku çavên wî nedidîtin. Ji nişka ve jî û jî bêhişiya xwe jî bo hemû zindiyên ku kor in dilê wî şewitî.

Mîrza Parsons fikirî û kêfxweş bû ku hîna jî dijiya. Çend sal berê tu bêjî hema karkerekî jîr bû; lê niha serkeftî bû, lê diheyirîn, rêzgirtî bû... .. û xwedî sîgorte... û tev bi serê xwe, bêalîkarî û digel astengiyan pêk anîbû.... Hê jî ciwan bû. Hewaya biharê ya şîn bi dûmenên teze yê avên ku bi bayê re pêl didan û kepezên bêhnfireh dikarî ew jî azweriyê biecanda.

Çaxa ku mirovê kor bi teqûreq jê derbas dibû, wî gavekî paş ve avêt. Mirovê şepirze zû bi zû li wî zivirî "Guhdarî bike Mîrza, tenê deqeyeke we..." Mîrza Parsons got, "Dereng e, civîna min heye, tu dixwazî ez tişteki bidime te?" "Ez ne parsek im Mîrza, tu bawer bikî! Tişteke xweşik û bifêde li ba min heye."

Bêrîkên xwe peland û tişteki biçûk xist nav destê Parsons.

"Ev tişt e ez difroşim. Yek dolar, hesteyê herî baş jî bo pêxistina cixareyê!"

Mîrza Parsons li wê derê sekinî, hinekî

Mackinlay Kantor



bêhteng bûbû. Parsons bi cil û kumê xwe yê gewr mirovekî bedew bû, di destê wî de gopalekî bi rengê şembelotê hebû. Bêguman ew kesê kor nedikare wî bibîne!..." Lê ez cixare nakêşnim" wî got.

"Guhdarî bike. Bawer im tu gelek kesên cixarê dikêşin dinasî. Xelateke biçûk û xweşik e." got û li ber geriya. "Mîrza ma tu alîkariya kesekî reben nakî?" parsêk xwe avête pêsîra Parsons.

Mîrza Parsons kire axîn û li bêrîka êlekê xwe nihêrî. Du dolar derxist û kir nav destê wî. "Helbet ez ê alîkariya te bikim. Wekî te jî got ez dikarim vê bidim kesekî din, dibe ku bidime xortê asansorê dişuxulîne." Kete nav dubendiyê. Her çi qas parsekekî kor be jî nedixwest tu kesî biêşîne.

"Gelo te çavên xwe bi temamî winda kir?" Mirovê şepirze her du dolar xistin bêrika xwe û bersîvand. "Ev çardeh sal in, Mîrza..." û bi awayekî ji xwe razî domand. "WESTBURY, Mîrza. Ez yek ji wan bûm."

"WESTBURY" dubare kir Parsons.

"Ya, erê. Teqîna kîmyewî... Rojname ev gelek sal in qala wê nakin. Lê di dema xwe de bobelateke mezin bû li..." "Her kesî ew ji bîr kir." got û lingên xwe bi zehmetî lebitand. "Ji te re bibêjim Mîrza, kesê di bûyereke wiha de li hundir be, wê tiştê hîç ji bîr ve nake. Tiştê dawîn min dît rûxandina herêma C yê bû. Ji camên peqiyayî gaz li hawîrdorê belav dibû."

Mîrza Parsons kuxiya, lê parsekê kor ketibû pey trêna bîranîna xwe ya dramatîk û aliyekî din jî difikirî ku dibe dolareke din di bêrika Mîrza Parsons de hebe.

"Bi tenê wê tiştê bifikire Mîrza. Sed û heşt kes mirin, nêzikî du sed kes birîndar man û pêncî kesan jî çavên xwe winda kirin. Erê, kor bûn mîna pêçermokan."

Hinekî din bi pêş de çû heya ku destên wî yên qirêj gihîşt pêsîra Parsons.

"Ez ji te re bêjim Mîrza, tiştê mîna şer xerab tune. Eger min çavên xwe di şer de winda bikira bila, min qebûl. Hîngê dê ez ê baş xwedî derketama. Bes ez bi tenê karkerek bûm û kapîtalîstan jî pere qezenc dikirin. Ew tev xwedî sîgorte bûn. Tu xema wan nebû. Ew..."

"Sîgorte." dubare kir Mîrza Parsons "Sîgorte, erê ez jî niha sîgorteyan difroşim."

"Tu dixwazî bizanibî çawa min çavên xwe winda kirin?"

Kire qîrîn parsek "Baş e, fermo guhdarî bike."

Peyv ji dev rijîyan û dest bi dîsgotineke ceribandî û dilşewat a çîrokeke dramatîk kir. Vegotîneke din ji bo pereyan.

"Ez li herêma Cyê bûm. Kesên paşvemayî tev direvîn. Her çi qas avahiyên li çep û rastê dihilçîyan jî, li derve fersenda xelasbûnê hebû. Gelek kesan xwe gihandin derî û filitîn. Û gava ez jî gihîştim, ku heya wê derê min navbera galonên mezin xwe

kaş kiribû, mirovekî li pişt min bi lingê min girt û got "Bihêle ez derbas bibim." "Dibe qeşmerek be jî ew kes, nîza'm Mîrza tu bawer bikî di dilê xwe de, hewl didim wî efû bikim". "Bes ew ji min girtir bû. Ez paş ve avêtim, hilkişya ser min û ez di nav heriyê de pêpes kirim û revî çû. Li vê derê mam, gaza bi jehr tijî dev û pozê min dibû, agir û alav jî pê re."

Parsek kire qurtîn, îskîneke ji derev de girtê. Bêdeng hêviya bersîvekê ma. Wî dikarî peyvên di rê de jî bifikirîya (Feleka reş, ax mirovê ezîz, niha ez dixwazim...)

"Erê çîroka min ev e."

"Hîna neqediya" got Mîrza Parsons. Parsekê kor wekî dînan ricifî.

"Hê jî na? Tu çi dibêjî? Tu-?"

Mîrza Parsons got, "Çîrok rast e. Lê berevajî gotina te qewimî"

"Berevajî gotina min!" Bû kufekufa parsek.

"De ka tu bêje."

"Ez jî li herêma C yê bûm" got Parsons. Ew bûyera bi rengekî din bû, ew mirovê ez avêtim paş û hilkişiya li ser min tu bûyî, tu ji min girtir î MARKWARDT!"

Mirovê kor qasekî bêdeng sekinî, bi dengê xizokî tifa xwe qurt kir.

"Parsons min dizanî ku tu yî!" û piştî bi awayekî dostane axivî: "Erê, dibe, dibe wisan be jî, lê ez kor im tu li vir sekiniyî û dihêlî ez li ber te bigerim, her û her bi min dikenî, ji lew re ez kor im."


Kesên li kolanê zivirîn da ku li wan mêze bikin.

"Tu diçî, lê ez kor im, tu dibihîsî? Ez..."

"Baş e" got Parsons "Nîqaşa vî tiştê neke MARKWARDT... Jixwe ez jî kor im!"

Navê orijînal ê çîrokê: A Man Who Had No Eyes

Wergera ji îngilîzî: Samî Hêzil



dosye

helîm

YÛSIV

Di sala 1967an de li Amûdê, rojavayê Kurdistanê (Suriyê) ji dayik bûye. Li zanîngeha Helebê Fakulteya Hîqûq qedandiye û ji sala 2000î de ye li Elmanyayê dijî. Bi dehan gotarên wêjeyî di kovar û rojnameyên erebî û kurdî de weşandine. Heta niha berhemên wî bi Kurdî, Erebî, Tirkî û Elmanî hatine weşandin. Hemû berhemên wî yên bi Kurdî ji hêla weşanxaneya Avesta yê ve li Stenbolê hatine weşandin. Ji 11.11.2000î de ye, bernameyeke wêjeyî, bi navê Gava Sêyemîn, heftane, di Medya, Roj û Mezopotamya TV de amade û pêşkêş dike. Bername heta niha berdewam dike.

Berhemên wî yên çapkirî:

1-Mêrê Avis-Çîrok-1991, bi erebî, Şam. 1997 bi kurdî. 2004 bi elmanî, Wergêr: Heidi Karge.

2-Jinên Qatên Bilind-Çîrok-1995, bi erebî Beyrût. 1998 bi kurdî.

3-Mîrî Ranazin-Çîrok-1996, bi kurdî. 2000 .1998 bi tirkî, Wergêr: Rehmî Batur.

4-Sobarto-Roman-1999, bi kurdî. 1999 bi erebî, Beyrût: 2004, Hewlêr.

5-Memê bê Zîn-Çîrok-2003, bi kurdî.

Ji Şanoyên ku ji nivîsên wî hatine girtin:

Komara dînan,

Bidarvekirina Pozekî,

Sol û serî.

NIVÎSANDIN ÇAVÊ SÊYEM E

Hevpeyvîn bi Helîm Yûsiv re

Dilawer Zeraq: Çîrok, bi giştî jî vegotin, di cîhana (jiyana) te de cihekî çawa digire?

Helîm Yûsiv: Cîhana min zencîreke dirêj e ji çîrokên negotî, çîrokên ku rojane dil dicûn û derfeta nivîsandina wan tune ye. Her çîrokeke nû tê nivîsandin mirov dibê qey dema ji nav destan reviyayî tê zeftkirin. Bi bidawîhatina çîrokê re şikestin zêdetir dibe û bîra xemgîniyê, ya ku bi pêûsê tê kolan, her û her kûrtir dibe. Çîrokê jiyana min xera kiriye. Gelek caran mirov nikare baş bijî, ji ber ku her dem û her gav çav li riya nivîsandinê ye û her bûyera ku mirov dijî, mirov pê re pê re ji xwe dipirse, gelo ez ê çawa vê yekê binivîsînim. Wekî ku mirov tenê ji bo nivîsandinê dijî, ne ku ji bo jiyane bi xwe. Nivîsandin jî heta radeyeke mezin girêdayî mirinê ye. Hem li pey şopa wê ye û hem jî dijî wê ye. Ango heta serbore, an tecrube neqede, derbas nebe û nemire, nabe mijara nivîsandinê û nivîsandin bi xwe jî hewildana bidestxistina wan kêlikên jidestreviyayî ye, ku ew bixwe mirin e û cûn e. Ji lew re nivîsandin hewldaneke têkçûyî ye ji hewldanên pozîkênandina mirinê. Ew tayê di navbera mirin û jiyane de li ba min qetiyaye. Nivîsandin rengê ji rengê xwexapandinê ye, berxwedaneke bêencam e li hember mirinê. Bejn û bala mirinê bilindtir e. Jiyan kin e, çend sal in, mirin jî dirêj e û heta hetayê ye. Vegotin bi xwe jî sedemek e ji sedemên hebûna min li cîhanê, çawa ku Xwedê zarokekî birîndar, an nexweş tîne cîhanê û ji ber êşa bedenê xwe dinale, çawa ku dînekî jî berdide kolanên dinyayê, da ku ji dil bikene û ji dil bigirê, wiha ez jî nalîna ji ber êşên xwe, matmayîn û hêrsa xwe, girî û kenê xwe dikim çîrok, roman û vegotin. Bi

çavekî digirîm û hêsir cîhanê dixînin rengê mijê, bi çavê din dikenim û li ser her tiştî bi tîqetîq dikenim û bi çavê sêyem jî li dora xwe dinêrim û dinivîsînim.

D.Z: Çi ne ew şert û merc û sedem ku dihêlin ku Helîm Yûsiv rahêje pêûsê?

H.Y: Di hemû şert û mercan de, rahiştina pêûsê, ji bo min, hewcedariyeke giyanî ye û pêwistiyeke ji bo dermankirina birînen xedar, ên dil û giyan, ku dermanê wan li cem tu bijîşkan û tu dermanxaneyan peyde nabe. Sedem jî pir in, lê ji wan ez dixwazim tenê qala tolhildanê bikim. Wekî zarokekî kurd ku her tişt li dijî wî ye û ji her tiştê xweş bêpar dimîne, zimanê dayikê di nav de. ema hinekî mirov tê digihîje xwesteka heyfîlanîn û tolhildanê ji her tiştî û her kesî siya xwe diavêje ser hestên mirov, nexasim ku têkçûn ew qasî mezin û bêsînor be. Dê û bavên me em li ser tirsê xwedî kirin û hemû pirsên me, yan bêbersiv dihiştin, an jî şaş bersiv didan. Mamosteyên dibistanan bi zimanê xwe, ne bi yên me, bi me re dipeyvîn û lêxistin her dem li dar bû. Tê bîra min, mamostayekî me yê matematîkê yê Şamî hebû, zixur û kevirên biçûçik bi guhên me ve difirkand heta ku xwîn jê dihat. An jî bi her du cênîkên zarokê ku bersiva pirsê wî nizanîbû digirt û wiha ew bilind dikir, qajîniya kûçikan bi zarokan diket. An jî, eger zarokek bêhemdî xwe bikeniya, ne tenê kefa dest belê piştê dest jî dida ber daran. Ji hêla din de jî hemû karmendên dewletê û polis û muxaberat ji derveyî bajar û netewa me dianîn û berdidan nav çavên me, mîna ku hatibin erdeke bêxwedî û her tişt, tev li zagon û qanûnan, li ber talanê bû. Jixwe hîna ev talan berdewam e. Ez jî, wekî bi hezaran, ji zarokên kurd, di

rewşeke awarte de mezin bûm. Vê rewşê kîneke mezin û hêseke mezintir di dilê me de çêkir û em avêtin nav xeleka êgir. Agirekî mezin û dilekî biçûk. Dema çavên min li ser vê rewşê vebûn, tenê ez bixwe dihisiyam ku bêçare dişewitim. Nizanim çawa hewldanên di riya rizgarkirina ji vî agirî de berê min dabûn nivîsandinê û xwesteka heyfhiilanînê dest pê kir. Ji nişkê ve min

nêrî ku çî tofan bi serê me de rakirine. Paşdemayîn, hejarî, zimanqedexe, nijadperestî, kuştina ji bo namûsê, heps û îşkenceya aşker, sînorên bombekirî, malbatên di navbera serxet û binxetê de parçebûyî, welatekî dagirkirî, şer û kuştina spî û ya sor, siyaseta Mehmûtkîû Itmankiyê, ji hemûyan girantir mana li derveyî dîrokê ye. Îcar li hember vê zîlm û zora giran a dîrok û cografîya û berjewendiyên dagirkeran, nivîskarê reben ji bilî

heyfhiilanîna reş a li ser rûpelên spî, çî dikare bike gelo?.. Erê, nivîsandin metodeke ji metodên tolhildan û heyfhiilanîna ji zalim û hestkujan e. Xwîna me gelek hedir bûye û me jî pir hindik nivîsandiye. Divê em wê xwîna zelal a zarokên doza xwe bêheyf li erdê nehêlin. Nivîsandin berxwedana giyan a ji bo hebûnê ye.

D.Z: Tu çîrokên xwe çawa dinivîsî? Para best û îlhamê çî qas heye di avabûn û pêkhatina çîrokên te de?

H.Y: Li vê derê kurteçîrokeke Kafka tê bîra min, ku li ser mişkekî ye. Mişk ji çar alîyan de, di nav çar dîwarên bilind û dorgirtî de asê maye. Dike nake nikare derkeve. Aliyê pêncan tenê li ber vedibe, ew jî devê pisîkê ye. Çîrok jî, ji bo min, ew aliyê pêncan e. Her ku giyanê min dikeve tengayiyê û di nav çar dîwarên hesinî de asê dimîne, ez berê xwe didim aliyê pêncan ku ew bi xwe jî êşê

zelaltir û birînê kûrtir dike. Lê her û her çareya sivikirina êşa giyan jî ew e. Tu pîlanên min ên amade ji bo çîroknivîsandinê tune ne. Geh di rojekê de zêdeyî çîrokekê zimanê xwe ji min re derdixînin, geh jî meh derbas dibin bêtir ku ez karibim tişteki binivîsînim.

Nivîsandina çîrokê dibe ku tenê çend saetan bajo, lê hetanî ku di mejî û dil de hazir dibe, demeke dirêj dajo.



Helîm Yûsiv li ber tirba E.Xanî, Quranê dixwîne

Ango, carinan bi mehan mijareke, mîna jineke ku ji mirov hez bike dide pey mirov û doza nivîsandinê dike. Ji her tiştî bêhtir hatina çîrokê dişibe hatina evînê, wekî ku evîn bêsoz û bêagahdarî tê. Wekî ku evîn kêra di piştê de ye, wiha jî çîrok.

D.Z: Piştî sê pirtûkên çîrokan, te romanek (Sobarto) weşand û di pey re jî

car din pirtûka çîrokê, Memê Bê Zîn. Çî ye ew sedem ku berê bîr û hişmendîya te ji ya kurteçîrokê dide bi aliyê nivîsandina romanê ve?

H.Y: Têkiliya min û romanê jî kevn e. Roman xwişka çîrokê ya mezin e û ez ji her duyan hez dikim. Bi giştî ez xwe di pexşanê de dibînim. Ji ber ku ez xwedî proje me. Tiştine cedî li ba min hene û ez wan tiştan zelal dixwazim ragihînim, wekî wêje wan ragihînim. Ji lew re jî, her dem navbereke mezin di nav min û helbestê de hebû. Ez xwendevanê helbestê me, temaşevanê şano û filmên sînemayê me, lê evîndarê çîrok û romanê me. Sobarto, romana min a yekem e ku piştî sê pirtûkên çîrokan hate weşandin. Hinek serbore hene nakevin kirasê kurteçîrokê, jê mezintir û firehtir tên. Ji bo serboreyên wiha pêwîstiya romanê wekî hambêzeke fireh tê holê. Ji aliyê din de jî,

dibe ku têkiliya vê meselê bi temen û serpêhatiyên hebe. Mijarên ku min di Sobarto de nivîsandin ez diêşandim, bêhna min teng dikirin. Wê demê, her piştî çîrokekê ez pê hest dibûm ku agirê hundirê min nehate vemirandin û hêşirin di di çavên min de mane, dixwazin ku derkevin. Min çend hewldanên nivîsandina romanê kirin, berî Sobarto, lê min neweşandin. Min dixwest ez tenê çîrokê binivîsîm, lê pêwîstiyê zora xwesteka min bir. Wiha xuya ye jî ku roman jî çîrokê bêhtir min ber bi xwe de dikişîne û her ku dem derbas dibe hest, tecrube, serpêhatî û pê re şewat mezintir dibin û bi taybetmendiyên romanê re bêtir diguncin. Ji roja min bîr biriye û heta niha ez di wê baweriyê de me ku pisporî yek ji sedemên nivîsandina serkeftî ye û temenê mirov jî têr nake ku di hemû waran de xwedî berhem be. Ji lew re, min temen daye pexşana kurdî û wê geh çîrok û geh jî roman bimînin encama şewitandina vî temenê kin û vê xapandina bêşnor a ku navê wê jiyana e.

D.Z: Hema çi bêje, hemû xwendevanên kurdî H.Yûsiv wekî 'Çîroknivîsê Surrealist' salox didin. (Wisa tê zanîn ku tu jî di vê dîtînê de yî) Tu çi dibêjî?

H.Y: Ez nabêjim ku ez ne di vê dîtînê de me û ne jî ez vê yekê piştrast dikim. Biryara nixwandinê ji ya min bêtir ya xwendevan û rexnegiran e. Ez her dem vê dibêjim, em di rewşeke surrealîst de dijîn. Ji realîteyan bêhtir em di nav kabûs, xewn û rûdanên ne asayî de dijîn. Ango jiyana me, wekî kurd, bi xwe surrealîzm e. Dagîrkirin û parçekirin û lihevparçkirin, welatê me û encamên ku vê yekê bixwe re anîne jiyana me kirine kabûs. Eger salê carekê mirovek li welatekî di, kabûsekî di xew de bibîne, diçe ser dixtoran ji bo rehet bibe. Ji bo me jiyana rojane kabûsan bi xwe re tîne. Em li ser nûçeyên kuştin û pevçûnê çavên xwe vedikin û li ser tehm û çêja mirinê di xew re diçin. Wekî mirin bûye xwarina me ya rojane, wiha jî kenê jidil û bi dengê bilind bûye vexwarina me ya rojane. Her ku kuştinê zêde dikan, hezkirina jiyane li cem me xurtir dikan. Her

ku qedexeya li ser zimanê me diwartir dikan, wiha jî evîna vî zimanê şêrîn û nivîsandina bi zimanê dayikê bi me xweştir dikan. Çi qasî zora wan giran dibe, wiha jî pê re pêkenokên me pirtir dibin. Ew feqîr dibin, ji ber ku tenê çek û sîlahê wan heye, em jî roj bi roj dewlemend dibin. Em ê zora wan bibin ji ber ku çavên diyên me ji çavên diyên wan reştirin, ji ber ku em ji wan xweşîktir in. Ji bo çespendin û selmandina vê xweşîkbûnê jî xwedîderketina li rastiye şerte. Bi çavekî di, di pencereya afirandinê re, dema mirov binêre, her tişt berevajî tê xuyakirin. Çawa di xewnan de tiştên durrî hev ku qet têkiliya wan bi hev re nîn e têne cem hev û tevliheviyên seyr û ecêb çêdibin, wiha jî em di nav tevliheviyên wisa de dijîn. Cudayî ew e ku di xewnan de carinan fêda tîrsa zêde ew e ku mirov vedicîniqê û şiyar dibe, lê di jiyana me ya rojane de ev tîrsa zêde tenê wêranî, xerabî, kambaxî û qutifandinê û mirovên seqet li pey xwe dihêle. Nivîskarê Kurd, di baweriyê min de, gava ku bi xwe re rast be, neçar e ku surrealîst be. Di vê çarçoveyê de surrealîzm bingeha jiyana me ya rasteqîne ye. Lê di heman demê de, baweriyê min ew e ku dema destnîşankirina nivîskaran li gor dibistan û êkolên hunerî qediyaye. Ango heman nivîskar dikare di deqekî xwe de sembolîzm, surrealîzm û realîzmê bîne cem hev. Deq ji êkolan firehtir e. Di dîroka wêjeyê de tê dîtin ku piştgirên her êkolekê heman nivîskar kişandine ber bi xwe de, mînak Dostoyevskî jî berbiçav e, wiha jî Kafka yan Aragon.

D.Z: Di çîrokên te de; vegotina rastî û rasteqîniyê, seqa û atmosfereke bisêhr û çîrçîrokî digel hev dimeşin. Gelo sedema vê; ji ber ku kurd nikarin van her duyan ji hev derxînin?

H.Y: Ez ne bi şeweyê rasteqîneya fotografîk re me. Ango ez dijî wê yekê me ku çîroknivîs mîna kamîrayekê bûyer û rûdanên derdora xwe tomar bike û mîna ku bûyer diqewimin ji me re jî pêşkêş bike. Wiha jî ez dijî wê yekê me ku xeyal û (atmosfereke sêhrî) bibin sedema tevlihevî û têngîhiştinê. Bikaranîna

rûdanên fantastîk û xeyalî metodeke pir bi tehlûke û xetere ye ji bo nivîskarê ku nikaribe bi hostayî vî karî bike. Di encamê de jî nivîseke bêser û ber, bêçêj û raman derdikeve holê. Mîna gelek kesên ku têgihiştina wan ya ji surrealîzmê re bi awayekî şaş bû û wiha jî bi behaneya surrealîzmê deqên pûç û bêwate nivîsandin û her dem jî digotin ku xwendevan fêmanakin, ji ber ku deqîne sewiye bilind, xwedê giravî, afirandine. Ez dikarim bêjim ku ji aliyekî de min dixwest ez rûmeta xeyal û fanteziyan biparêzim û ji aliyê din de jî, bi tundî, dijî slogan û klîşeyên (realîzma sosyalîst) rawestim. Her wiha di parastina rûmet û hestdariya deqê wêjeyî de beşdar bibim, dijî hewldanên siyasîyên seqet ku rola wêjê û edebiyatê ji rola zirneyê cuda nakin û her tiştî mîna alava piropagandaya partiya xwe û siyaseta xwe dibînin. Bi kurtayî ev sedem li pey vê yekê ne ku ez di berhemên xwe de vî şerê dualî dimeşînim.

D.Z: Dînîtiya mirovan, piroletiya kes û bûyeran, nelihevî... tim li pêş in. Gelo ev hêman her yek ew tişt in ku çîrokên te li ser piya dihêlin an jî ev şêwe yek ji şêweyên kurdan a liserpiyanmayînê ye?

H.Y: Ez bawer dikim jiyan li pêşiya çîrokan e, çîrok li pey jiyanê dimeşin. Lê ne her dem çîrok teqlîda jiyanê dikan, carinan jiyan jî teqlîda çîrokan dike. Stûnên bingehîn ji jiyanê kurdan re çî ne, wiha heman stûn jî bo çîrokên min jî dibin bingeh. Ji bo min çîrok, an nivîsandin bi giştî ne hobiyeke e û ne jî ji bo dagirtina dema vala ye. Nivîsandin parçeyek e ji jiyanê min û dibe ku sedema berdewamiya wê be jî. Ji lew re, dîrok û cografîya û civaka ku em tê de mezin dibin, em bixwazin nexwazin dibin reh û damarên deqên me yên wêjeyî. Dînbûnê her dem ez ber bi xwe de kişandime. Dînbûn, ne tenê tunebûna aqil û gera li cade û sikakan, belê dînbûn wekî têgiheke felsefî û helwesteke civakî. Tu dizanî ku Amûdê, bajarê ku ez lê ji dayik bûme û lê mezin bûme, bi pîrbûna dînan tê naskirin. Di civaka me de, kîjan kesê ku li derveyî zagon û qanûnên heyî tev

digere, yekser wî wekî dînekî bi nav dikan. Afirêner jî, wekî xwerist û bi awayekî siruştî, xwezayî, li dijî zagon û desthilatdariyê ye. Nemaze ku zagonên zalim û dagirkeran bin, wê gavê dijayetî diwartir dibe. Di vê xalê de (dîn) û (afirêner) dibin yek. Kesên çîrokên min, ne kes in bijarte ne, yan jî li gor planan tene bikaranîn, na, dibe her kes li her derê bibe kesekî sereke di çîrokeke min de. Lê divê ew tecrubeya wî, an jî ew kêlika ku tê de dijî, di wê astê de be ku bibe mijara çîrokê. Kesên min jî hemû ji derdora min û ji nav encamên tecrubeyên jiyanê min derdikevin. Jixwe tevlihevî û nakokî bêhtir dikarin bibin jêderên çîrokan. Ez nikar im li ser baranekê ku rojekê ji rojan porê min şil nekiriye, an jî li ser êşekê ku carekê ji caran hêsiir nexistiye çavên min, binivîsînim.

D.Z: Lê vegotina îronîk, hêmanên şanoyî û teatral?

H.Y: Çi qasî aliyê trajedîk di jiyanê me de berbiçav e, wiha jî aliyê komedîk xwe her gav dide pêş. Jixwe pêkenok bi xwe berhemeke ji berhemên zor û çewisandinê ye. Mirovê ku gelekî digirî hewcedariya wî ya bi ken zêdetir dibe. Mirin mîna trajedîtirîn rûdan, dibe ku bibe mijara qerf û henekan, gava ku bi awayekî awarte li deverekê rû bide. Kurd jî xelkin wiha ne ku dikarin bi her tiştî bikenin û her meselê bikin mijara ken û laqirdiyan. Taybetiyeke me, di vê derbarê de heye, ku her du alî, bi şêweyekî trajîkomedîk tev li hev dibin. Carinan ku tu hinekî di wateya qerfên kurdekî de kûr bibî, ji dêvla ken ve, bêguman wê giriyê te bê. Bi gotineke dî, şêweyê Kenê reş şêweyê herî serdest e di nivîsandinê me de. Baweriya min ew e ku her tiştê di jiyanê de hebe, wê di çîrokan de jî xuya bike. Ya dî, bikaranîna hêmanên şanoyî, mijareke girêdayî teknîkê ye. Hemû celebên wêjeyê û hunerê sûd ji hev du wergirtine. Ez piştgiriya ceribandîna dikim. Ji bo ku çîrokeke nûjen jî were holê ceribandîna û pê re wêrekî pêwîst e. Di her pirtûkeke xwe de min hewl daye ku ez formîna nû ji bo hinek çîrokên xwe bibînim. Sînorên min jî ew in ku divê çîrok taybetiya

xwe, wekî çîrok, wînda neke, lê her form û ceribandî ji bo xwe ez rewa dibînim. Eger ev yek ji bo çîroka erebî, an tirkî, an firensî carekê pêwîst e, ji bo ya kurdî deh caran. Hewcedariya me bi şewitandina qonaxan heye, da ku çîroka kurdî ya nûjen, li kêleka çîroka nûjen di zimanên din de, di heman astê de be. Berevajî vê, dibe ku derfetên li pêşiya pêşketina çîroka kurdî pirtir bin, ji ber ku materyal û malzemeyên nivîsandinê pirtir in. Ji ber vê, ez jî carinan teknîka fîlman û carinan jî ya şanoyan di çîrokên xwe de bikar tînim. Mîna (Sol û serî) çîroka di kirasê şanogeriyeke de. Di warê gera li formên nû de, hetanî bi matematîkê dikare bibe alîkar. Di çîroka (Sêqorziyek bi çar qorziyan) de, min ev hewldan kir. Hetanî çî radeyê ev hewldan serkeftî ne, ez nizanim, lê ev şeweyên ku te di pîrsa xwe de qala wan kiriye, yek ji şeweyên gera li formekî nû ye. Raman dibe ku dubare bibin, lê şeweyê û form têne guhertin. Ev xal bi xwe motorê pêvajoya dîroka wêje û edebiyatê ye.

D.Z: Derbasbûna ji rewşekê li rewşeke dî, ji bûyereke li bûyereke dî pir bi lez û ji nişka ve pêk tê. Gelo ev yek ji şeweya vegotinê ye an jî parçeyek ji honakê ye?

H.Y: Dibe ku her du bi hev re bin. Çîrok, an deqê wêjeyî bi giştî, bi gelek tayan bi hev ve tê girêdan ku wekî tevî mirov dikare bi nav bike. Di avakirina tevî de gereke ku hûrbînî û zanebûn hebe, da ku tayên şaş tevî deqê wêjeyî xerab neke. Di honandinê de, nivîskar neçar dimîne, carinan, ku ji bûyereke derbasî yeke din bibe. Ez xwe di vê guhertin û derbasbûnê de serbest dihêlim, bi şertê ku ew guhertin, ew derbasbûn têkeve xizmeta avakirina tevî çîrokê ya wêjeyî. Divê atmosfera giştî ya çîrokê xera nebe û tayekî din li tayên tevî wê zêde bibe û honandin jî ber bi temamkirinê de biçe. Ev şeweyê bêhtir di çîroka pîrbûyer, a nûjen de tê bikaranîn. Ji ber ku piraniya çîrokên kevn ji yek bûyer û yek ramanê pêk dihatin. Jixwe pîrvana nûjeniyê ne ev e, lê ev yek ji rûdanên wê ye.

D.Z: Tu di çîrokên xwe de, di cihê ku xwendevan hêvî jê nake û di rewşên trajîk û

xembar de, gotinên mîzahî û qerf û pêkeniyê bi kar tîni. Wekî: Di çîroka "Mêrê Pîrdest" de; apê lêwîk piştî qehirîna xwe ya ji ber ku lêwîk wêne çêkiriye, ji bo wî dibêje "Va ye bijîşkê mîzê hat" Gelo ev yek ji ber tevî û honaka hundirîn a çîrokê ye, an jî ji bo pêhisandina rewş û jiyana kurdan a nelihev e?

H.Y: Ez bawer dikim ev yek girêdayî taybetmendiyên civaka kurdan e. Ji ber ku, eger tu bala xwe baş bidî vê meseleyê, ev gotinên mîzahî û qerf hemû li ser zimanê kesên çîrokê têne gotin, ne ku çîrokbêj wan laqirdiyan dike. Ji bo nivîsandina çîrokeke kurdî jî mirov neçar e ku li wan taybetmendiyan xwedî derkeve. Îcar pîrsa girîg a ku her nivîskar ji xwe dike ew e; gelo heta çî radeyê min ev taybetmendî di cihê wan de û bi şeweyê ku tê xwestin bi kar anîne. Çîrok tişteke wiha ye ku mîna zarokekê tê jiyanê. Zarok hemû bi hev re tê, reng û deng û çav û bêvil û lêv û... ango hîmên hundirîn ên çîrokê wekî avahî ligel hîmên dî yên girêdayî mijar û naverokê, bi şeweyin veşartî, bi hev re diguncin û di hest û hişê mirov de, bi hev re, amade dibin. Piştî ew çîrok tê jiyanê. Ji ber wîlo, hinekî zehmet e ku nivîskarê çîrokê mebesta xwe ji bikaranîna her tayekî ji tayên tevîna çîrokê, bi rengê cihê, şîrove bike.

D.Z: Û dîsa di çîroka "Mêrê Pîrdest" de, lawîkê biçûçik dikeve beroşa şorbenîskê û bêcan û nefes dimîne, bavê wî û yên derûdorê dibêjin "Spas ji Xwedê re, ku mirîna zarokekî ye û ne tişteke din e" û dî re jî wexta pîrekek li cem Sofî siwar dibe, sofî destê xwe dibe ber bi "Fîtezê" ve û destê xwe datîne ser ranê pîrekê, pîrekê jî bi awayekî îronîk û qerfpêkirinê dibêje: "Tu şevê çend caran ji, diya zarokan re dibêji Spas ji Xwedê re" Gelo tu dixwazî bi van her du rewşên ji hev dûr û cuda -ku di gotina "Spas ji Xwedê re" de digihîjin hev-, durûtî û rûşûştîtiya mirovên kurd a di bîrûbaweriya xwe de bînî zimên?

H.Y: Ev çîrok bixwe li ser vê hevokê ava bûye (Spas ji Xwedê re, an elhemdulillah) Li

ser mirovekî ye ku him sofî ye û him jî çî bi serê wî bê, dîsa jî razî ye û her dem û her gav amade ye ku spasiya Xwedê bike. Kesayetiyên wiha bi hezaran di civaka me de peyda dibin. Kesê sofî ew e yê girêdayî (şêxê) xwe ye, şêx difikire, ew jî fikrên şêx pêk tîne. Rûmeta wî jê bête stendin, an jî mal û milkên wî, yan jî hetanî bi zarokên wî jî bêsebeb wînda bibin- wekî ku di vê çîrokê de dibe - dîsa jî meseleyê dispêre qederê, razî dimîne û spasiya Xwedê dike. Bi vî awayî jî ne şoreş çêdibin, ne jî hewldanên ji bo guhertinê bi ser dikevin. Ji ber ku destpêka her guhertinê, nerazîbûn e û hewldana têkbirina rewşa serdest e. Gelek kurd hene ku bê Welat in, bêmal û milk in, bêziman û heysiyet in, bêrûmet jî mane, lê dîsa jî razî ne û ji Xwedê dixwazin ku wan ji tiştên mezintir biparêze. Ji hêla din de, tê naskirin ku mirovên wiha heyranên kesên xwe ne û ji tiştên, li gor ola wan, qedexê pir hez dikin. Ji ber vê jî kesekî din tê û mîna qerf wê pirsê ji sofî dike. Ev xal hinekî durûtiya jiyana van kesan tîne bîra mirov. Ez ne bi wê yekê re me ku nivîsandina li ser nimûneyekî ji civaka kurd bibe mînakê her kurdekî di wê civakê de. Ango sofî Hemdilah, an sofî spas, wekî ku hatiye binavkirin, nûnertiya xwe û kesên wekî xwe di nav kurdan de dike û nabe nimûneyê kesayetiyê kurd.

D.Z: Gelo ziman ji bo nivîsandin û nivîskariya Helîm Yûsiv navgîn e, an jî armanc e?

H.Y: Rojekê ji rojan ziman ji bo min nebûye armanc. Ez ji wê wêjeya ku ziman bi xwe ji xwe re dike bingeş hez nakim. Pîrê caran, ji ber valayîya tûrikê nivîskar berê xwe dide zimên, da ku bi hewara wî ve bê û deqê wî, wekî wêje, ragire. Min tu carî xwe di wî halî de nedîtiye ku tiştek li cem min tune ye ku ez bêjim. Dema ez dikevim wî halî, ez nanivîsînim. Derdên me pir in heta radeya ku carinan di yek çîrokê de bi sedên ramanan xwe di ber hev radikin û rê nadin hev. Bi giştî nerîneke min ji bo bikaranîna zimên heye. Sewiye û asta zimên li gor naverokê tê guhertin. Ziman, divê him giyanê hevokê

biparêze, dûrî rih û rîtma zimanê xelkên me nekeve, him jî nebe zimanê kolanê û rê û rêbazên rastnivîsînê paşguh neke. Divê ziman nebe asteng di navbera deq û xwendevanan de. Çavkaniyên zimên jî, ji bo nivîskarekî, ji gotinên mirî yên di ferhengan de bêhtir divê gotin û peyvên jiyana civakê bin. Peyvên li jiyanê dikarin bêhtir nivîsareke jîndar biafirînin.

D.Z: Çi bû sedem ku te piştî nivîsandina du pirtûkên bi erebî "Mêrê Avis û Jinên Qatên Bilind" vegehiyayî ser nivîsandina bi kurdî?"

H.Y: Rastiya meseleyê ew e ku ez li nivîsandina kurdî venegeriyame, ji ber ku ji roja ku min dest bi nivîsandinê kiriye min bi kurdî jî dinivîsand, lê pirtûkên min ên bi zimanê erebî berî pirtûkên bi zimanê kurdî hatin weşandin. Ew jî girêdayî du sedeman e; yek jê tunebûna derfeta çapkirinê -çapên xerab û bi dizî ne tê de-, eger ne ji çêbûna Avesta yê ba, dibe ku piştî 1996an pirtûka min a kurdî ya yekem (Mirî Ranazin) derketiba. Bi weşandina pirtûkên min re yên ku bi erebî derdiketin, min car caran çîrokên bi kurdî di kovaran de belav dikirin. Sedema din jî ew e ku ez, hetanî demeke dirêj, ji kurdiya xwe ya nivîskî ne razî bûm. Ji ber rewşa zimanê me, dibe ku heta vê kêlîkê hinek ji wê nerazîbûnê mabe, lê gava ku ez gihîştîm wê baweriyê ku êdî dem hatiye, min her du berhemên xwe yên bi erebî jî hatibûn nivîsandin, careke din ew vegehandin zimanê wan ê resen, ê orîjînal. Gelek kes hene, ji bilî hevalên nêzikî min, ku vê rastiyê nizanin. Mesele wiha hate fêmkirin ku min bi erebî nivîsandiye û min nivîsandina bi erebî terk kiriye û ez vegehiyame nivîsandina bi kurdî. Na, hetanî roja îro ez bi du zimanan dinivîsînim. Min dev ji nivîsandina bi erebî jî bernedaye û ez xwe mecbûr nabînim ku ez zorê li xwe bikim û dev jê berdim. Berevajî wê, hewcedariya me bi nivîsandina bi hemû zimanan heye, lê berî hemûyan zimanê dayikê. Van salan nivîsandina min a bi erebî kêmtir bûye, bêhtir maye bi kurdî, lê planê min ew e ku ez nivîsandina bi her du zimanan berdewam bikim.

D.Z: Gelo H.Yûsiv di nivîsandina xwe de radeya ast û sewiye û zanîna xwendevanan difikire?

H.Y: Na, ez qet di vê yekê de nafikirim. Ji ber ku xwendevan bi xwe ne di yek astê de ne. Ez di ast û sewiyeya deqê ku ez pê mijûl im de difikirim. Lê sewiyeya xwendevan û asta têgihîştin û zanîna wî, pirî caran, wî deqî bi xwe re bilind dike, yan jî dadixîne jêr. Bilindtirîn deqê wêjeya cihanê bide destê xwendevanekî/ê bêsewiye, wê bi çend gotinan wî deqî pûç û vala derxîne. Heman deq di destê xwendevanekî din de dibe xwedî nirxandineke cuda. Baweriya min jî ew e ku sewiyeya nivîsara min çawa be jî, wê li hember nerazîbûna hinek xwendevanan rast bê, ev jî tiştêkî sirûştî ye. Ango nivîskarek tu carî nikare hemû xwendevanan razî bike. Îcar, baştir e ku nivîskar karê xwe baş bike. Guh bide avakirina deqê xwe yê wêjeyî ku di asteke bilind de be, bi vê yekê rûmetê him dide nivîsarên xwe, him jî dide xwendevanan. Pêşkêşkirina deqekî ketî rêzgirtinê nade hişmendî û asta têgihîştina xwendevanan jî. Afirînerê/a wêjeya di asta bilind de, rêzgirtin û hurmetê dide hemû xwendevanan, ji lew re, berî her tiştî em hewcedarî wêjeyeke bedew û bi sewiye ne.

D.Z: Her serdema ku dibe qonaxa şoreş û veguherînan rewşenbîrên xwe jî diafirîne. Gelo têkiliya şoreş û wêjeya kurdî bi çi rengî ye (an jî têkiliyek çêbûye) û şoreşê çi qasî bandor (çi erênî çi neyînî) li wêjeya kurdî kiriye?

H.Y: Têkiliya wêjê û şoreşê ne têkiliyeke yekser û dîrekt e. Hemû hewldanên ku dixwazin têkiliyeke yekser peyda bikin, wê bi ser nekevin. Him wê zirarê bidin wêjeyê ku li gora pîvanên siyaseta wêjeyê bipîvin, pê re jî wêjeyeke seqet û bêgiyan derdikeve holê û him jî zirarê didin şoreşê ku rûmeta wê bi propagandaya pûç erzan dikan. Yek ji seqetiyên sereke di şoreşên kurdan de, di baweriya min de, ew e ku birêveberên şoreşê xwedî projeyeke siyasî û leşkerî tenê ne, bêyî ku xwedî projeyeke çandî, rewşenbîrî û civakî bin. Ango ji sedî deh ji îmkânên ku dikevin

xizmeta pirojeyên siyasî û eskerî, ji bo zimanê kurdî veqetînin, wê rewşa zimanê me bi awayekî din bibe. Daxwaza pêşxistina zimên jî dimîne slogan û wekî hewldaneke siyasî lê tê nêrîn, ji ber vê jî bi ser nakeve, hetanî ku projeyê siyasî bi ser nekeve. Ev şaştîyeke bingeîn e ku şoreş ne bi zimanê xelkên xwe bi rêve biçe. Nabe ku em li benda tirkên bin hetanî ku zimanê me serbest bikin. Divê em ji xwe dest pê bikin. Dema ez bi zarokên xwe re bi tirkî biaxivim, ez berê şoreşê ji armancên wê yên sereke diguherim û gora şoreşa xwe bi destê xwe dikolim. Ev minakek e. Ez wê dîtina ku dibêje divê rewşenbîr, nivîskar û hunermend xizmeta şoreşê bikin dîtineke nîvcomayî dibînim. Divê şoreş jî xizmeta ziman, wêjê, huner û edebiyatê bike. Şoreşa kurdan jî, bi taybetî li bakur, gelek qehremanî û qurbanîyên mezin di ber şiyarbûna neteweyî de da. Rakirina qedexeya li ser kurdî jî li Turkiyeyê û Kurdistanê yek ji encamên vê şoreşê bû, wiha jî ji qonaxa tirkên çiyê kurd anîne qonaxêke neteweyî, wiha jî weşana bi kurdî. Zincîra jîmartinê dirêj e, lê serdestiya tirkî di birêvebirina siyaseta kurdî de, dimîne cihê rexnekirinê û ew bahaneyên ku ji bo vê yekê tene gotin pûç û bêbingeh in. Navê rojnameya kurdan, ne li Turkiyeyê, li Ewropayê (Özgür Politika) ye û ne (Siyaseta azad) e! Siya vê şoreşê, bi her awayî, di piraniya berhemên kurmanî de, eger em nebêjin di hemûyan de, tê dîtin. Berhemên wêjeya kurdî ya nûjen girêdayî pirsgerêk û êşên kurdan ên dema niha û yên dîrokê ne jî.

D.Z: Tê gotin ku H.Yûsiv di çîrokên xwe de qala pirsgerêkên serok û rêxistinên kurdan û nîqaşa di navbera wan de dike: "Dema ku roj hilnayê, gundî bi otobosekê ji gund derdikevin û ne rê diqede ne jî dibe sibe...." gelo ev otobus partî, şofêr serok û rêwî jî gel e?

H.Y: Deqê wêjeyî carinan dibe kaniya sembol û wateyên cuda. Dema ez yek wateyê bidim deqekî pîrwate, wekî nivîskarê deq, ez zirarê didim wî deqî. Ev nayê wê wateyê ku ez vê şîroveya ku te qal kiriye

napejirînim. Ev şîrove rast e, lê dema mirov bibêje ku şofêr serokdewlet e û otobus jî welat e û siwarên wê jî gel e, xelkên welêt in. Ew ên li hember şofêr serî hildidin jî kesên demokratîxwaz û muxalifên şofêr in. Ev şîrove jî nabe gelo?..Em hinekî çarçoveyê firehtir bikin û bêjin, şofêr qeder e- zeman e, otobos jî dinya ye û rêwiyên siwar jî mirov in. Ev sembol jî bi vê çîrokê re diguncin. Yê li hember neheqiya qederê jî rabe guhê wî jê dibe. Mebesta min ew e ku deqê wêjeyî dikare di heman demê de, rahêje gelek şîrove û wateyan. Pirsgirêkên serok û rêxistinên kurdan jî, sedemên sereke ne di têkçûna zimanê kurdî de, her wiha di têkçûna azadî û serxwebûna kurdan de. Dibe ku di dîrokê de kurd mînaka herî awarte bin di vî warî de, ku her dem bûne qurbana siyasetên şaş ên serok û rêberên xwe. Gelek Welat hene ku îro serbixwe û azad in û ji sedî pênc wekî kurdan qurban nedane. Bêguman, ev pirsgirêkên wiha ji bo nivîsandinê jî gelekî girîng in û divê bibin mijara nivîsarên wêjeyî û rexneyî.

D.Z: Ev çend sal in ku tu li Elmanyayê dijî. Dûrbûna ji kan û çavkaniya warê ku nivîsandina te lê dest pê kiriye çi ji nivîskariya te bir û çi tev lê kir?

H.Y: Kêlîka ku mirov piştî xwe dide warê dê, warê zarotî û ciwaniya xwe, qirpîniyek ji hundirê mirov tê, tiştin dişikîn, nexasim ku çûneke bêveger be. Ev tiştên ku dişikîn çi ne, roj bi roj, sal bi sal, têne naskirin û tiştin jî qet nayêne naskirin, tenê wekî ku mirov tişteke wînda kiribe. Wekî nivîskar, hîna windakirin kûrtir û girantir e. Civaka mirov tê de mezin dibe, dikare bibe çavkaniya mijarên nivîsandinê.

Her bûyerek diqewime, bi sedan bûyerên wekî xwe di hişmedî û paşxaneyê de şiyar dike. Têgihîştin, danûstendin, têkilî heye. Berevajî civaka ku mirov li cem mêvan e, îcar mêvanekî ku ne bi biryareke azad bûbe mêvan û ne jî hatina wî bi dilê xwediyê malê be, wê rewşa wî mêvanî çawa be, rewşa me jî li Elmanyayê wilo ye. Ji bo biyaniyan peyva (Auslander) di elmanî de bi

kar tê. "Aus: derve ye, Land: welat e, ango kesên derveyî welêt." Li Sûriyê jî yan em bênasname ne, yan jî li ser nasnameya me (erebê Sûriyê) dinivîsin. Warê berê, ji derveyî neteweya xwe û warê niha yê derveyî welêt, em têne binavkirin. Me xerîbiyek bi xerîbiyekê guhertiye. Ez nikarim rewşa welatekî Ewrûpayî bidim ber rewşa welatê ku em jê tên. Bi sedan cudahiyên bingeîn hene, lê ez înkâr nakim ku rewşa nivîskariyê li Ewrûpayê ne li gor xeyalên min derket. Careke din jî min gotibû, berî ez bêm Ewrûpayê ev hevoka ku min carek xwendibû tim di bala min de bû: (Li Ewrûpayê kûçik û nivîskar cihê rêzê ne û bi rûmet dijîn) Li Ewrûpayê min nas kir ku nivê vê hevokê yê pêşî tenê rast e. Rola cihê ku ez lê dijî ji bo nivîsandina min ne roleke sereke ye, tev ku bi bandor e. Nivîsandin ji bo min girêdayî giyan e, girêdayî şewatê ye. Şewata min jî her dem û her gav û li her derê di bin çengê min de ye. Welatê min jî mîna birînekê li ser eniya min e, bi ku de herim, wê ev birîn bi min re bê wê deverê. Serpêhatiya derbideriyê geh dibe kujera afirandinê, geh jî dibe çavkaniyeke dîtir. Ez bi hêvî me ku jiyana li Elmanyayê ji min re çavkanî û jêdera berhemên nû be.

D.Z: A niha çi heye li ser maseya xebata (an jî di ekrana computera) H. Yûsiv de?

H.Y: Ev demek e ku ez bi romaneke nû ve mijûl im. Di van mehên pêşiya me de dê nivîsandina wê biqede. Ez hêdî hêdî û bi tirs wê dajom ber bi dawiyê de. Roman bi xwe jî li ser tirsê ye, li ser tirs û serhildanê ye.

ÇÎROKNIVÎSÊ KU JI MIRINÊ JIYANÊ VEDIJÎNE: HELÎM YÛSIV

Nezir Melle



Çîrokên Helîm, ji mirinê jiyane vedijîne û mirov li hember mirin û trajediyê dikenîne; di heman demê de, li hember xweşiyê kevirekî giran di serê civakê de diteqîne û ji nû ve ew civaka paşketî li ser lingê wê dihedilîne û dibêje, aha va ye cîhana mirovatiyê, de rabe kurdo bimeş!

Di cîhana nivîsên Helîm Yûsiv de, mirovên kurd xwe şilfîtazi dibîne. Bi hêrs û bêdudilî Helîm destê xwe diavêje perdeya civakê, wê tîştîşî dike û tiliyê datîne ser birînê; eyb û nexweşiyên civakê bi tekûzî di hundirê hunerê de dihone. Ev wêrebûna wî bû bela serê wî ku dijmînê wî ne tenê desthilatdarên kurdan bin, lê belê bi hetanî endamê civaka paşketî û paşverû lê har û dîn bûn û ev bû sedema ku îroj ew bi xwe êşa koşberiyê dikişîne û welatê xwe terk kir..

Çîrokên Helîm, ji mirinê jiyane vedijîne û mirov li hember mirin û trajediyê dikenîne; di heman demê de, li hember xweşiyê kevirekî giran di serê civakê de diteqîne û ji nû ve ew civaka paşketî li ser lingê wê dihedilîne û dibêje;

"aha va ye cîhana mirovatiyê, de rabe kurdo bimeş!"

Helîm, bi teknîkeke nûjen û bi peyvin rojane û bi şeweyekî seyr çîroka kurdî dinivîsîne, bi wî rengê xwe yî taybet navê xwe li jora piramîda wêjeya kurdî ya nûjen danî.

Helîm Yûsiv lawê civakek ku ji hemû hêlên jiyane ve xwedî pîrsgirêk e, nakokiyên dijwar ji berbanga dîrokê ve rehên xwe di civakê de û di derûniya mirovên kurd de kûr birine xwarê. Helîm çavên xwe vekir ku welatê wî bindest e, mîna hemû zarokên kurdan. Helîm jî di dibistanê de ji sinifa yekê de êşa vê bindestiyê kişand. Dema dît ku li dibistanê zimanê dayikê qedexeyê ye, di mêjiyê wî de gelek pîrsên bêbersîv dikirin zimînî. Ev jê re bûbû gencîneya lêgerîna jiyane ku karibe rojekê bersîva wê qiriktaliyê bide. Li kêleka vê sosreta kesnedîtî ku ji bo Helîm bûbû bingeha nivîsandinê û bi taybetî bi zimanê kurdî wî çavên xwe li ser nakokiyên giran ên civakê û tekoşînê vekirin; tevlihevbûn û metodên jiyana malbata kurdî û têkiliyên hişk û ziwa û ecêb her rojê pîrsin nû li ber Helîm vedikirin. Helîm di nav vê civakê de mezin bû ku li kêleka Xwedê û pêxemberan Marx û Darwîn hene. Civaka şêx û sofîyan û civaka komunîstan di heman odeyê de dijîn û di hundirê wan de xiyaneke ideolojî û xapandinên mezin û berevajiyên aşkere hene. Xaleke din ku Helîm her roj pê re dijiya, tekoşîna gelê kurd e; serkeftin û şîkenandinên wê, êşeke siyasî bêderman li Helîm dihat peydekirin.

Di bin van mercan de Helîm dest bi nivîsandinê dike û ew bi xwe bi awayekî tûj van tiştan di çîrokên xwe de tîne ziman..

Ji berhema yekemîn a Helîm, (Mêrê Avis) hate fêmkirin ku Helîm civakê şayîk nake û xwe mirovekî şelaf diyar nake, lê belê civakê xweşik dike; ji endamên civaka kurdî re nabêje; **'bijî ji te re û aferîn', lê dibêje; 'tu dimirî, tu li paş van rûçikan sed rengê mirinê vedşêr.'** Û bi rêbazeke tûj civakê rexne dike, heta ku hinek şewat di laşê wê de çêbibe.

Dema ku berhema wî (Mêrê Avis) kete destê min, ez li ber navê wê matmayî mam, gelo çima Mêrê Avis? Piştî ku min xwend, ez tê gihîştim ku Helîm dixwaze bêje ku li vê erdê her tişt bi sosret e; ji mirovan hetanî bi dar û lawiran ji derveyî perensîbên jiyane dijîn. Mîna ku dixwaze bêje li vê civakê mêr jî dikare avis bibe û ne tişteki ecêb e. Bi rastî jî desthilatdarên Kurdistanê û xerabên civaka kurdî dikarin mêran jî avis bikin.

Belê, di naveroka çirokên Helîm de, civak rot û liba dibe û Helîm bi serê pênûsa xwe zûxirên bi gincir lê dibarîne, ew çermê qalind û derewîn bi wan zûxiran didûrîne...

Helîm bi berhema Mêrê Avis, rêbazeke nû û modern anî nava çiroka kurdî ya zaravayê kurmançî. Çawa bi xortî serê xwe xist nav nakokiyên civakê û bi tundî ew rexne kir, wisan jî rexneya çiroka kurdî kir; rê jî nivîskarê çiroka kurdî re vekir ku ji şeweyê nivîsandina folklorî rizgar bibin. Hinek nivîskarên sexte ji vê pêşketina çirokê aciz bûn, di bin bahaneyên din de êrîşî Helîm kirin, -halê wî ji destê sofî û serseriyan, dewletê û komunîstan ne bes bû îcar rewşenbîran jî ajot ser-...

Li pey wê berhema hêja Helîm, du berhemên din xelatî xwendevanan kir, (Jinên Qatên Bilind) û (Mirî Ranazin). Di vê pirtûka dawî de alavên bidestxistina şeweyê taybet ceriband. Û Helîm riya xwe bi firehî di cîhana çirokê de ronî kir. Di berhema (Mirî Ranazin) de, pirsên ku di pirtûka (Mêrê Avis) hatibûn, bersîvand.

Çima Mêrê Avis dibin? - ji ber welatê wî bindest e û bi sînoran parçe bûye, (û çiroka Gula Omeriyan Têlo) Ji ber desthilatdariya kevneperst li Kurdistanê hukm dike û çiroka (Cîhan ji avdestxaneyê tengtir e)... ji ber komarên dîn û çiroka (Komara dînan)...

Ji nivîsên Helîm diyar e, ku ew mîna nivîskarekî hez ji cih û mirovan dike; xwe mîna hêzeke bi aktîv ji bo guhertinê dibîne.. Pêşî karibe xwendevanê xwe peyda bike û li pey wê, pê re danûstandinê bike. Ev têkiliya wêjeyî ji bo kurdan pir zor e. Ji ber kêmxwendina bi zimanê kurdî. Ji lew re rola nivîskarê kurd ku xwendevanên xwe bibînin pir giran e, lê Helîm bi hîlbijartina wî ji çiroka nûjen û rexneyî re dikaribû xwendevanên jîr ji bo xwe peyda bike; ev jê re mîna hêzeke manewî mezin e ji bo ku di warê nivîsandinê de berdewam bike; û berdewam kir û romana wî bi navê (Sobarto) hate weşandin.. Zaroktiya xwezayî, jiyana rojane û pirsgerêkên wê, şîrovekirina hezkirinê, têkoşin û siyaset, civak û mirov, nexweşî û xiyamet... zordestî û şewat... hat. Bi zimanekî şîrin tê ravekirin û roman dimîne cihê pirsê û rawestandîne, gelo Helîm li çi çareseriyê digere? Bi rastî çareserkirin ne ji jor ve tê barîn û ne bi pêşbînî û awiran derdikeve bazaran, bi şîrovekirin û têgihîştina zemîn û realîstê dest pê dike. Pirsgerêkên me ne ku çareserî tune ye, lê têgihîştina pirsgerêkê peyde nabe. Dema naskirina rewşa me û girêdana wê bi dîrokê ve ne diyar be, wê çareserkirina pirsgerêkên me mijgirtî bin. Tehlîl (şîrovekirin) û naskirina rewşa mîletê me û lêgerîna rehên dîrokî û vekirina civakê hewcedarî mêjiyê mezin in... Mêjiyê mezin peyde bibin, civakeke ronî peyda dibe.

HELÎM YÛSIV: DI STÊRÊN ESMANÊ BILIND DE

Qado Şêrîn



Tu kîjan
çîroka Helîm
Yûsiv
dixwînî,
keçeke şewitî,
evîneke
têkçûyî,
pûtekî
sernixûz tê de
dibînî ku
Amûdê bi
xwe ye, kul,
derd, şahî û
têkçûnên
Amûdê ye.

Helîm Yûsiv ê şikestinan, kul, derd, şahî û têkçûnên Amûdê ye. Amûdê ji welatekî biçûk e, nimûneya herî rasteqîne ye ji bo Kurdistanê. Helîm zimanê Amûdê ye, na belê pênuşa ku Amûdê li ser rûpelan nîgar dike. Helîm Yûsiv bixwînî hûn ê Amûdê nas bikin, hûn ê civak û rewşa Kurdistanê nas bikin, hûn ê bibînî bi çi şeweyî evîndarî têk diçe û hûn ê xwe wek niştecihekî ji Amûdê bibînî. Kî dizane ku Helîm ne ji Amûdê bûya dibû ku Mêrê Avis û Sobarto nenivîsandiba. Heta astekê mirov dikare bêje ku Helîm ne ji Amûdê bûya nedibû nivîskar. Tu kîjan çîroka wî dixwînî tu keçeke şewitî, evîneke têkçûyî, pûtekî sernixûz tê de dibînî ku Amûdê bi xwe ye, heta bi romana Sobarto ku tecrûbeya nivîskar a kesane ye, her wisan kesên Helîm di hemû çîrokan de diyar in, jixwe nivîsandin û afrandin tecrûbeya kesayetî ya nivîskêr e. Helîm di hevpeyivîneke xwe de dibêje: "Çîrok ji bo min tişteki zati ye, encama şewata ruh e. Şewata dil e, şewata hestan e. Çîrok gelekî girêdayî dil û hinavê mirov e. Her wiha girêdahiye tecrûbeya wî/ê ya şexsî ye. Çîrok ji bo min berhema şewateke ferdî ye... (tirej.net/hevpeyvîn.htm)"

Dema tu wek zarokekî di civakeke şikestî û ji her tiştî bêpar mezin bibî û tu nikaribî tişteki bikî, tu nikaribî guhertinan bikî, tu nikaribî kenekî biçûk li ser lêvên zarokekî biçînî, tu nikaribî şekirekî bi dest bixînî û heta ku tu şî nebî tu cografîyaya laşê jinê nebînî, tu yê bibî çi, tu yê bi çi şeweyî vê civaka çewt biguherînî ku tu ne nivîskar bî. Helîm dibêje: "Nivîsandin hewildanek e ji hewildanên tolhildanê." Dêmek nivîsandin hewildanek e ji bo tolhildan û guhertina civakê. Û ev yek di pirtûka Mêrê Avis û romana Sobarto de diyar e. Bandora hin nivîskarên cîhanî wek G.G.Marquez li Helîm bûye wek ku wî di hevpeyivîneke xwe de diyar kiriye. G.G.Marquez nivîsandinê wek geş û xweşkirina dil û can li dijî rewş û civaka wêran dibîne. Dema Mêrê Avis belav bû rihê Helîm rihet bû, wek çûkekî azad ji kêfan re firiya, ji ber gelek xirecir û axaftin li ser bû, ew tolhildanek ji tolhildanan bû. Her wisan Sobarto jî. Tolhildan jî berdewam in. Nivîskar dema ku berhemekê dinivîse tê de hewildana guhertinan dike û nerazîbûna xwe ji rewşa heyî diyar dike. Tifinga nivîskar pênuşa wî ye, meydana şer ji rûpel in, encam û kuştî ji xwendevan in; ew ên ku nivîskar bandora xwe li wan dike.

Dema min pirtûka Jinên Qatên Bilind û bi taybetî çîroka "Çîroka ku nivîskarê xwe kuşt", xwend, min li şûna E. Xanî, Helîm Yûsiv danî. Dema ku min dixwend yekser tecrûbeya kesane hate bîra min. Helîm, E. Xanî wek nimûne aniye, lê wî ew çîrok li ser


xwe û tecrûbeya xwe ya kesane nivîsandiye. Dema Mêrê Avis derket hinan gotin, divê Helîm bê kuştin wek çilo di vê çîrokê de hin kes hewl didin ku E. Xanî bikujin û çîroknivîsîn ev bi xwe ye, dema Mêrê Avis hate bîra min. Dema tu berhemekê binivîsînî û ew nivîs bandora xwe li xwendevanan neke, wan nekenîne, wan negirîne, ew berhem têkçûyî û beravêtî ye, bêwate ye û Helîm di her pirtûka xwe de wisan kiriye; axaftin, xirecir û bahoze rakiriye; ev yek jî bi şêwe û naveroka berhemana ve girêdayî ye, nexwe Helîm dizane çi dike.

Gelo ku Helîm ne kurd bûya, mebesta min Emerîkî, Elman, an Frensewî bûya, wê cih û navekî wî di wêjeya cihanî de hebûya, an na?

Di Jinên Qatên Bilind de Helîm Yûsiv tişteki aşkere û vekirî naxîne destên, xwendevanên xwe; wî dikişkişîne heta dawiya çîrokê û wî di nav guman û raman û sawêran de digevizîne.

Xwendevan hevok li pey hevokê dixwîne, da ku bigihîje encamê û naveroka çîrokê fam bike, dawî xwendevan her tiştî tazî dibîne ku ji sembolên Helîm fam bike. Helîm di vê pirtûkê de şêweyê sembolî pêk tîne. Jixwe dema min dixwend Cervantes di **DON KHÎJOT (Don Kîjot)** de hate bîra min. Di çîroka Hezkirina Qafkurmî de; kurm, qaf, hezkirin û jinê wek sembol bi kar tîne. Çîrok li ser welatekî ku ji du hezar û şeş sed salî de miriye, hatiye nivîsandin. **"Hezkirin jinek e, bi serê xeynî xwe difikire"** bi wateyeke din tu dikarî bêtî jiyan welatek e li gor berjewendiya welatin din bi rê ve diçe. Jixwe ji ber berjewendiyên welatên mezin, ji du hezar û şeş sed salî de ev laş miriye. **"Diya min jî ji bo ku ez lê vegerim şekir li zarokên**

cîranan belav dikir. Dayê... ez ê çawa vegerim? Û ji bilî komê hestiyên li erdê avêtî tişteki di min de nemaye. Wê rojê çar mîrên biyanî rahiştin hestiyên min, pevçûneke germ di nav wan de peyda bû. Encam... serkeftina hemûyan bû û di nav piyên wan de hestiyên min tar û mar bûn. Ji bo serkeftinê, hemûyan bi hev re şahiyek li dar xistin.



Di nehê sibehê de diya min bi melkeseke biçûkî bermayiyên min rêj kirin. (R15)" Di kîteya dawî de nivîskar her tiştî aşkere û tazî dike, lê dîsa bi şêweyekî sembolîkî. Jixwe bi vê yekê ew xwendevanê xwe gotin bi gotin û hevok bi hevok heta bi dawiya çîrokê dikişkişîne. Xwendina çîrokê ji ba xwendevan ve balkêş dibe û dev ji xwendina çîrokê bernade heta dawî û ev serkeftin e ji bo nivîskar û çîrokê. Çîroka ku te bi xwe ve girê nede, wek zaroka bêrih ji diya xwe re bibe.

Nivîskar çîrokê heta bi dawî bi şêweyekî sembolîkî bi dawî tîne. **"Laşê min î ku ji berî du hezar û şeş sed salî de li welatê min û mala min avêtiye û tu kes nabîne hat bîra min. (Rûp: 16)"** Mal û welat wekî cografîya pêk aniye. Dêmek laş wekî rih û mîlet pêk aniye. Jixwe vê yekê ji dema împaratoriya Medya de tîne zimên ku du hezar û şeş sed sal di ser re derbas bûye û ev rih, ev can, ev mîlet û ev laş miriye, ji ber ku bêtak e, bêwelat e, nivîskar dixwaze bêtê; ku tu bêwelat bî, kes te nabîne. Nivîskar bi şêweyê xwe dixwaze bêtê ku zilm û zordariya li vî laşî dibe kes nabîne û li gor berjewendiyên welatan çav li ser tene girtin, **"Hezkirin jinek e bi serê xeynî xwe difikire. (Rûp, 14)"** Jiyana welatan li gor berjewendiya welatên mezin dimeşe. Jin û hezkirin wek sembol bi kar tîne. Dibe ku

her xwendevanek li gor xwe van sembolan şirove bike, lê her û her encam yek e dema ku çîrok tê afirandin.

Di eynî pirtûkê de û di çîroka duyemîn **Bidarvekirina pozekî** de, poz bi wateya şeref û namûsê pêk tîne, di vê çîrokê de lehengê çîrokê bi çandina dar û şînahiyê tê tawanbarkirin **"Tawanbariya Kerîmê Mîdî ew bû ku dara yekemîn di dîroka cîhana me ya zer de biçanda.(Rûp:28)"** Ev yek ola Zerdest tîne bîra mirov û jê hatiye girtin. Jixwe mebesta nivîskêr jî ev e, kurdên ku di dema Medyayê de bawerî bi ola Zerdest anîbûn û ola wan ji ya yê ku ew bi çandina daran tawanbar kiribûn, cuda bû. Kerîmê Mîdî yê ku neviyê Medya ye. Nivîskar wî bi wateya mîletê kurd bi kar tîne û her tiştên qalind di dîrokê de tîne zimên; **"Hevalên min tune ne. Kêfa min ji min re nayê.(Rûp:29)"** Nivîskar vekirî li vir diyar dike ku heval, dost û piştgirên me kurdan nîn in; ku hebûna em ê ne di vê rewşê de bûna. Her wisan diyar dike ku em kurd jî ji hev hez nakin û ev yek rast e; gelek rojhilatnasan jî ev yek aniye zimên. Li deverêke din nivîskar xwe li şûna Kerîmê Mîdî datîne û xwe wek cih û cografîya bi kar tîne:

Ez kuxikek bi tenê û bê xwedî me

Dîwar herifiye

Ji lingan hatiye xwarin

Çewt e

Qeşmer e

Tijî me. Ji mêşûmar û laşê kuştîyan.

(Rûp:29)

Welat bûye kavi û ji bingehe xwe de wêran e. Jixwe ev xak ji cendekê kuştî û şehîdan tije bûye. Her tişt ji bo me qedexe ye, heta bi ketina nav ramanan. Wek ku nivîskêr nivîsandiye. Lê nivîskar yekser tiştêkî nade xwendevanan, da ku wî bike nav ramanan. Di dawiyê de xwendevanên nivîskêr dê bi ser bikevin ji ber ku sînor ji ramanan re nîn in û wî jî meydana ramanan fireh hiştiye. **"Zanîn hêz e û hêz zanîn e.(Rûp:33)"**

Zanîn jî ji ramanan tê.

Çîrokên **Jinên Qatên Bilind** bi yek

şêweyî hatine nivîsandin û ji ber vê yekê nivîskêr ew di yek pirtûkê de kom kirine. Mebesta min ew şêweyê ku min li jor bi nav kir, ji çîroka pêşî heta bi ya dawî, bi eynî şêweyî hatine nivîsandin:

-kalikê min, jina wî pê re xayîn ket. Wî jî ew ajot û strî lê çandin.

-Jina xwe cot kir.

-Erê... Erd jina wî bû.

-Tu hinekan bi min dikî?

-Na... û bavê min bi nexweşiya pûsula ketibû, li aliyekî ne disekinî, tim berê xwe dida bakur. Dujminên wî bi nexweşiya wî hisiyan û piştî birîn vekirin, a ku jê re di xew de çêbû, hemû aliyan pê re dest bi xiniyê kirin.(Rûp:91)"

Hevoka **-Erd jina wî bû-** ne gerek bû bê nivîsandin, ji ber şirovekirin qelsiyê dike çîrokê, gotina Erê bes bû, çimkî erd tê ajotin û strî lê tîn çandin û nivîskêr ev yek di hevoka berî wê de aniye zimên, wêne bê wê hevokê jî dibe digel ku gelek ciwan û xweşik e. Mirovê kurd ji dema ku welatê wî perçe bûye bi nexweşiya aliyan ketiye û şoreş li pey şoreşê diçîne, da ku ji wê nexweşiyê rihet bibe.

Ji bo ku mirov bikaribe li ser tecrûbeyê Helîm Yûsiv binivîse û mafê wî wek nivîskar wînda neke, gereke mirovekî rexnegir û lêkolîner hemû pirtûkên wî bixwîne lêkolîn bike û ligel wî jî baş biaxive, da ku mirov bikaribe tecrûbeyê wî ji xwendevanan re şirove û diyar bike. Helîm Yûsiv dibêje: **"Tiştê ku ez li ser xwe, ango li ser çîroknivîsiya xwe vebêjim, ji min bêhtir karê kesên din e. Bersiva pîrsa 'Helîm Yûsiv xwe li ku dera çîroknivîsiyê dibîne? heger hebin!karê xwendevan û rexnegiran e. (.tirej.net/.helim.htm)"**

Li dawiyê, ez dikarim bibêjim ku H.Yûsiv di esmanê çîroka kurdî de hêdî hêdî ber bi stêrkên bilind ve diçe. Û tecrûbeyê wî nimûneyeke bilind e ji bo nîfşên nû, ew ên ku çîrokê dinivîsin. H.Yûsiv çîroka kurdî gihandiye asteke bilind ku em kurd pê serbilind in.

20/06/2005-Holenda

HELÎM YÛSIV Û DERDÊN KOÇBERIYÊ

Ji demên dûr û dirêj de, hemû milletên cîhanê, ji ber gelek sedeman, ketine ber lepên koçberiyê. Gelek ûştên aborî, polîtîkî, civakî û zanistî bûne hêmanên berdana welatên dayik û digel hêviyên bi destxistina jiyana xweş û azad, berên xortan ber bi welatên biyanî de dane. Di van 10-15 salên dawî de, agahdariyên, ku nîrxê demokratî, azadî, wekhevî û mafên mirovan bilind dîkin, ku ji Ewrûpayê dertên, bala gelek xortên kurd, di nav wan de nivîsevan û rewşenbîr jî, kişandiyê û berên wan ber bi van welatan de daye, ku derfetên bayê azadiya raman û nivîsînê li wir bi dest kevin. Nemaze jî ew li welatê xwe ne tenê ji van mafan bê par hatine hiştin. Belê bi ser de jî xwendin, nivîsandin û kelepûra wan hatine qedexekirin û ew her roj û her şev bendewarên girtin û zindankirinê, an jî pirsên hêzên ewlekariya desthilatê ne. Ji lew re jî, dinya tev ciwaniya wê, li pêş wan derûnên tenik; xwediyên hestên nazik reş û tarî dibe û zemîn, tev firehiya wê, li wan teng dibe, pê re jî ew agahdariyên me li jor nîşan kirine wan ji zemîna welêt hildikin û ber bi Ewrûpayê de dikşînin. Lê piştî ku qirêkên balafiran, zikên geştiyan, an tariya çolistan û daristanan wan bi ser sînor û kolanên biyanî de velû dîkin, eniyên wan yekser li tehtê rastiye diqelibe û xewnên ciwan ber diavêjin; û pê re jî aloziyên mezin û dijwar destana havîbûn û penaberiye, dihonin.

Helîm Yûsiv, piştî ku bi xwe jî di vê bîra bêbinî werdibe, du çîrokan "Hezkirineke teknolojik" û "Berlîn bêçav e" dinivîsîne û di berhevoka xwe ya bi navê "Memê bê Zîn" de diweşîne. Naveroka her duyan ji hev ve nêzik in.

Bi rastî, çîrokek an du çîrok nikarin barê wênekirina trajediya havîbûn û penaberiye hilgirin. Ji lew re jî Helîm, di her du çîrokan de, tenê goşeyekî ji vê trajediyê vedibijêre, ew jî sînorkirina ger û livîna kesên penaber in. Zagonên van welatan, di her du çîrokan de, liv û tevgera penaberan sînor dîkin, wan dixin hundirê kampên genî û odayên biçûk, ku têra du sê mirovan nakin, lê bi dehan tê de mîna tûrikên gemarê didin ser hev û bi ser de jî van welatên fit û fireh li pêş wan teng dîkin û liv û tevgera wan di hundirê 30 kîlometrên çarkoşeyî de sînor dîkin û wan neçareyî hin karên ku dikarin rûmeta mirovan bin pê bikin, dîkin.

Lê gava hêviyên firehkirina wê çarçoveya 30 kîlometrî

Heyder Omer

heyderomer@web.de



**Di toreya kurdî
de goşeya
mişextiyê,
koçberiyê û
havîbûne nû
vedibe. Dem
hatiye, ku
afirînerên kurd
vî derî li ser
piştê vekin û
xem, qisawet,
derdên
penaberiye,
bêriya welêt û
dê û bavan û
cîhê bîranînên
zaroktiyê wêne
bikin**

derûnên penaberan bixurîne, divê îzna vê yekê ji polîsan bixwazin, eger kesek bêyî îzna polîsan ji wê pînika (hêlîn) teng bi der bikeve, hîngê bi ber destên polîsan dikeve û dibe mijara pirsan, hemû qul û qurçikên wî têne kontrolkirin, kelebçe destên wî diguvêşin û li 30 kîlometrên wî te vegerandin.

Ev yek çavdêriya hêzên ewlekariya welêt tîne bîra lehengê çîrokê û pê re jî pê hay dibe, ku çu cudabûna berbiçav di navbera rewşên welêt û van welatan de tune ye û digihîjin wê baweriyê, ku eger rûmeta mirov li welatê wî talankirî be, wê li çu welat û deverên mayî nikaribe wê rûmetê di dest bixîne. Ev cure hest di derûniya wî de hêzdar dibe, nemaze jî gava dibîne tevî ku polîs dizanin ew nivîsevan e, xwediyê gelek berheman e, lê dîsan jî rûmeta wî nagirin. Belê, gava wî li derveyî sînorên 30 kîlometerî digirin, kelepçeyê li destên wî ba didin, dibin cihê polîsan, şîlf û tazî dikin, hemû cil, kax-izên ku pê re bûn, deverên gewdeyê tazî kontrol dikin û wî vedigerînin kampa genî û odeya teng.

Nivîsevan her du çîrokên xwe bi awayê kevn (teqlîd) ava dike; bûyer di her sê qonaxan (destpêk, navend û dawî) re, li pey hev, derbas dibe û tenê li derdora kesayetiyekê digere. Ew kesayetî jî, ji destpêkê de bi temamî hatiye avakirin û li pêş xwîner diyar dibe, çu guhertin heta dawîya çîrokê te de û pê re peyda nabin. Ev yek jî dikare girêka çîroke hinekî sist û

jar bike û nikare hewesa xwendina çîrokê di hundir derûniya xwîneran de germ bike, ji ber ku xwîner ji destpêkê de bi dawîya çîrokê hay dibe, nemaze jî gava li destpêkê dibîne, ku polîs dibêjin:

"Ev zagonên me ne û te tev de bin pê kirine. Em ê îro te vegerînin cihê ku tu jê hatî."(Hezkirineke teknolojîk)


Xuya ye nivîskar bi xwe jî haydarê vê yekê bûye. Ji lew re bala xwîneran bi ser quncikekî din, ê wê kesayetiyê de dikişîne

û dide xuyakirin ku çawa talankirin û şermdîtina evînê li welatê wî, ew birçiyê vê têkiliya mirovane hiştiye. Heta radeya ku gava pêrgî keçikeye rûken dibe, hema texmîn dike ku bi wî re dikene.

Ji lew re jî, xwe ji bo hevgotinkê amade dike û xewnerojên wî mezin dibin. Lê gava keçik, bêyî ku gotinekê pê re bike, wî dihêle û ber bi cihê sozên dostê xwe de dibeze, hîngê pê hay dibe ku di rewrewkên xewnerojan de, ne di çemên evînê de, melevanî dikir. (Çîroka Hezkirineke

teknolojîk)

Nivîsevan, di çîroka din de jî vê serdorê li bûyerê wê digerîne û li ber xwe dide ku jiyana nivîsevanê kurd, çi li welêt û çi li vê bihuşta penaberiye bide ber hev. Li wir her dem bendewarê zîndan, lêdan û gefûgurên polîsan (hêzên ewlekariyê) bû, li vir jî tim di bin çavdêriya polîsan de ye. Li wir nîrxê nivîsarên wî bînpê dibû û kesî guh nedida wan çîrokan, bi ser de jî laqirdiyên xwe pê dikirin, heta ku nema cihê xwe di nav zindiyan de didît, ji lew



re dostaniya goristan û miriyan pê şêrîn bûbû, li vir jî wiha nîrxê nivîsarên wî wînda ye, nikarin rûmeta wînda ji wî re vegerînin. Gava polîs pê hay dibin ku ew nivîsevan e, naveroka berhemên wî, cureyê derbirina wî û celebê nivîsîna wî bala wan nakîşînin, tenê dibêjine wî; **"Baş e, tu nivîskar î, nexwe tu dîzanî bixwînî."** (Berlîn bêçav e) û kaxizekê didin pêş wî, tê de diyar e ku wî zagonên vî welatî bînpê kirine

û ji çarçoveya sinorkirî bi der ketiye. Tevî ku her du xalên çîroka yekem; (bînpêkirina zagonên welatê penaberiyê, û guhnedana keçika bedew) ligel hev ne têkildar in, lê

her du jî li ber deriyê mebestekê pêrgî hev dibin û pev re têne bestandin. Ew mebest jî ew e, ku rûmeta li welêt wînda bûye; welatên mayî wê rûmetê ji me re venagerînin û naparêzin. Dîsan çîroka duyem li ber vî derî, ligel a yekem, têkildar dibe. Kesayetiyên her du çîrokan ne pir in. Kesayetiya sereke, ku belkî nivîsevan bi xwe be, ew jî wek me berê gotiye, yeke ji destpêkê de tewaw e, heta dawîya çîrokê çu guhertin tê de û pê re çênabin, bi yek dirûv û awayî di her sê qonaxên bûyer re derbas dibe. Kesayetiyên wiha nikarin li ba çêjan nû cihê balkêşiyê bin, ji ber ku hêmanê jînişkaveyîyan di wan de qels û jar e. Lê tiştê balkêş ew e, ku nivîsevan zora xwe nade ser vê kesayetiyê, wê ji der ve de

wêne dike, hest û ramanên wê şîrove dike, bêhtengiya wê dide xuyakirin. **"Li vê bihuşta mezin jî bihostek erda hişk têra lingên wî tunebû... Wê ji hevalê xwe re bibêje çawa ew avêtin wê odeya biçûk, tarî, teng û genî, ku têra sê mirovan nedikir, sih mirov tê de dihepişandin."** (Hezkirineke teknolojîk) Û hin carên din rê dide wê, da ku xwe bi xwe pêşkêş bike; ji lew re nivîsevan pirê caran xwe bi ser

axaftina ezîtî (monolog) de pal dide û axaftinê dide dest wê, da ku hest û nestên xwe bide der. **"Nîvê temenê min bi kûçkanî (biçûkanî) derbas bû û a niha dem hatiye ez xwe li van sînorên qedexê xînim**



Helim Yûsiv li Brukselê

û berê xwe bidim warê aramî û xweşiyê. Eger ez sax gîham wê derê, ez salên mayî ji temenê xwe qezenc dikim. Jixwe ez mirim, ne tiştek li tevgera xelkê li vê dinyaya fireh zêde dibe, ne jî kêmtir dibe." (Hezkirineke teknolojîk) Her wiha monolog di her du çîrokan de rola xwe ya hunerî bi zelaliyeke bêhempa dilîze; û bergeha ku di navbera xwîner û wê kesayetiyê de heye, kin dike, pê re jî xwîner bi hêsanî derbasî hundirê wê dibe, hestên derûniya wê nas dike. **"Zimanê min î îngilîzî ne xerab e, çend gotinên min hene ez ê lê xerc bikim, wê têra naskirinê û soza hevdîtineke dî bikin. Jixwe evîn mîna muzîkê zimanekî navneteweyî ye."** (Hezkirineke teknolojîk) **"Li wir muxaberat, li vir muxaberat. Li wir**

tazîkirin, li vir tazîkirin. Xelasî li ku ye?!" (Berlîn bêçav e)

Tevî ku nivîsevan, pirê caran, xwe bi ser monologê de pal dide, lê hemû awayên xeberdanê (çîrokbêjî, serd) dixebitîne û her yekê di cihên layiq de, bêyî ku tixûb di navbera wan de peyda bibin û nivîsevan neçareyî qevaztinan

bibe. Çîrokbêjî hin caran li awayê yekser siwar dibe û nivîsevan bernavê ne diyar (wî, wê, wan) bi kar tîne û bûyer û kesayetiyên ji der ve de wêne dike û salix dide. **"Hevalê wî, ji bo wergerandinê, pê re derbas bû cem jineke spehî, xwînsêrîn, milên wê yên rût av bi ser devê wî xistin, ji ber çavên wê yên xweşik şerm kir hingî kûr li wan nihêrî."** (Berlîn bêçav e) û hin carên din bernavê ezîtî (ez) bi kar tîne, heta tê xuyakirin ku ew bi xwe lehengê çîrokê ye. **"Wan bi çavên mirovekî beredayî ku daye dû çîrok mîrokan li min dinêrîn, ku qet nikarî tiştekî ji min û ramanên min û berhemên min fêhm kiribana. Yan tê nedigihîştin, an jî tê digihîştin ku min li ser kîjan kesî û malbatê nivîsandîye, diçûn ji wan re digotin û em diketin qirika hev."** (Berlîn bêçav e) Hin carên din jî çîrokbêjî bi awayê salixdanê diyar dibe, dezî û xêzên bûyer berpêşî xwîneran dike. **"Wê rojê, berî ku bi dîtina çavên Berlîn ên spehî şa bibe, xemginiyeke kor sînga wî diguvaşt. Dîwarên xaniyên wê zimanê xwe jê re derdixistin. Kolanên wê jî lingên wî xeyidî bûn, ezmanê wê eniya xwe lê qermiçandibû....."** (Berlîn bêçav e)

Çîrokbêjî, wek hêmanekî ristina tevna çîrokê, bûyeran ji awayê heyînî (rêal), an nîgaşî (xeyalî) diguhere awayê zimanewanî û bi alîkariya bikaranîna hêmanên derûnî gelekî zindî dibe. Ev nimûneyên ku li jor derbas bûne, dibin nîşana serkeftina nivîsevan di xebitandina her sê awayên çîrokbêjiyê; pê re jî zimanê çîrokbêjiya nivîsevan zindî û gelekî sade xuya ye, dikare xwîneran ligel çîrokê,

digel hewesdariya bêhempa bibestîne, nemaze jî gava xwendevanê çîrokê bala xwe bide zimanê hevpeyvîn û monologê; û cihên ku tê de têne gerandin, hîngê bi hostehiya nivîsevan di vî warî de hay dibe. Ji ber ku zimanê ristina tevna çîrokê her di awa û astekî de namîne, belê li gor kesan û helwestan tê guhertin û rengînkirin. Lê mixabin hin caran pênûsê nivîsevan riya xwe li ber deriyê honandina hevokê winda dike û nizane hevokê rast birêse. Wek nimûne: **"Devê wî ma jî hev... Çavên wî mabûn bi wê jinê ve."** (Berlîn bêçav e) A rast ew e, ku bigota: (Devê wî jî hev ma... Çavên wî bi wê jinê ve mabûn.) Ji ber ku lêker, di hevoka kurdî de, her li dawîya wê tê.

Eger ev şaşiyên hanê di hevpeyvîn û monologê de, li ser zimanên kesayetiyên çîrokê bînin, wê ne şermeke zimanî be, ji ber ku astên zanebûn û têngihîştina hemû kesayetiyên ne mîna hev in. Bi ser de jî wê bibin nîşanên zindîya zimanê hevpeyvînê û dilsoziya nivîsevan, ku gotin û zimanên wan naguhere û çîrok jî pê re ber bi rastiya heyînî ve diçe. Lê gava ev şaşiyên hanê di zimanê çîrokbêjiyê de cih bigirin, hîngê dibine şermeke zimanî û xaleke neyînî datînin ser zimanê nivîsevan. Hêja ye, ku nivîsevan xwe bi xwendina zimên re biwestîne, da ku xwe ji şermên hanê rizgar bike.

Dawî; goşeyê ku ev her du çîrok tê de bi cih dibin, toreya mişextiyê, koçberiyê û havîbûnê ye. Ev goşe jî, di toreya kurdî de nû vedibe, berhemên wê îro li ser tiliyên destekî têne jimartin. Lê xuya ye dem hatiye, ku afirînerên kurd vî derî li ser piştê vekin û xem, qisawet, derdên penaberiyê, bêriya welêt û dê û bavan û cihê bîranînên zaroktiyê wêne bikin, çimkî guhnedana bûyer û aloziyên nêzik û rojane, dilsoziya nivîsevanan û rastiya hunerî û wêjeyî jî dixê bi pirsê de.

ZAROKÊN BÊ ZAROKTÎ

Husên Duzen

HusenDuezen@aol.com

-Wergera almanî ya pirtûka Helim Yûsiv
"Mêrê Avis" (Der schwangere Mann)-

Pirtûka "Mêrê Avis" ne ji bo almanên, ku berî biçin seyranê bi lez wê ji pirtûkfroşê taxa xwe bikirin, bixin çenteyê xwe, ji bo ku ew wê di du hefteyên tatîlê de, li girava Mallorcayê bixwinin. Ji bo xwendina "Mêrê Avis" divê telefon girtî, ode bêdeng be, an jî xwendevan biçe devereke xalî, li bin siya darekê rûnê û bixwîne.

Nivîskêr, wek wî bi xwe jî di pêşgotina çapa almanî de diyar kiriye, bi destê me digire û carinan rasterast, carinan bi riya sembolan û gelek caran jî bi agahdariyên di nav rêzan de veşartî, me dibe "cihên ku ne tenê ji aliyê dewletê, lê belê ji aliyê yezdên jî hatine jibîrkirin" digêrîne, panoramayeke civaka derdora Amûdê derdixe ber çavên me.

Pirtûk ji pênc beşan pêk tê. Li her beşekî ji wan navê elementekî hatiye kirin. Çar ji wan elementên bingehîn ên felsefeya Empedokles in: ax, av, agir û ba. Li gor vê felsefeya yewnanî ya xwezayê, evîn û nefret, nêzîkbûn û jihevdûrketin, hêzên bingehîn ên gera çerxa cîhanê ne. Nivîskar wek elementê 5emîn 'xwîn' jî lê zêde kiriye. Di vî beşê bi navê 'xwîn' de tenê çiroka "Mem ji Mirinê Şiyar Dibe" heye, ku dîrok, çarenûs û zilma li ser Kurdan ji xwe re kiriye babet. Memê ku piştî sedsalan ji mirinê radibe, dibîne ku hîn rewşa Kurdan a bixwîn dom dike. Ne bêsedem e, ku di çend antolojiyên kurteçîrokan ên ku vê dema dawî derçûn de ev kurteçîrok ji aliyê berhevkerên kurd ve hatiye hilbijartin, ligel ku ji aliyê teknîka çîrokê û herikîna zimên ve ne çiroka herî biserketî ye jî. Di vê kurteçîrokê de agahdariyên dîrokî û rewşa Kurdan a niha li Cizîra Botan hatine vegotin, lê diyalog lawaz in, figûr ne xurt in, jiyana wan a hundurîn -tevî lehengê çîrokê Mem jî- ne diyar e. Berevajîya kurteçîrokên din vebêjer, derbirîna xwe bêhtir li ser bûyerên li derve ava dike.

Protagonistên gelek çîrokan sofî ne, ku di heman demê de derewîn û dizên civakê ne jî. Helim Yûsiv, figurên xwe di têkilîyên dûrî aqilan de derdixe pêş xwendevanan, lê ew wek



Helim Yûsiv, ji bo ku rewşa figurên xwe ya niha vebêje li rewşa xerab a zarokan vedigere. Ew dizane ku zarokên di bin sixêf û lêdanê de dijîn, kîn û kerba xwe di hundirê xwe de hiltînin hetanî ku wek mezinan derfet bikeve destê wan, an jî kerba xwe di serê rawirên ji xwe lawaztir re derdixin.

pîra vebêjerê çiroka "Peymanek bi Ezraîl re" mirovên civaka kurd in. Pîra Fatê, ya ku li dijî daxwaza kurê xwe derdikeve û naxwaze ji gund biçe li Qamişlo bi cih bibe, dapîra Yaşar Kemal a ku gava malbata wan ji Wanê ji gundê Ernisê ber bi Çukurovayê ve koçber dibe, gelek caran bi rê de xwe ji wan didize û bi paş de direve, tîne bîra mirov. Her wiha pîra Xezalê ya romana Sileman Demir 'Koç' ê jî zaf di ber xwe dide ji bo ku nehêlê malbata wê di encama şerê van salên dawî de ji gund koçber bibe. Pîrika Helim Yûsiy, serhişk e, her dixwaze bi ya xwe bike. Sê caran ji mirinê radibe, ew 'pisîkek heftcanî ye.' Li vir jî, di nav rêzan de, gelek rastiyên civaka kurd tîne derbirin. Wek mînak; pîra Fatê, di temenê xwe yî pêşketî de bêhemdî navê mîrekî bilêv dike ku ne yê mîrê wê ye. Gava vebêjer jê dipirse bê ew kî ye, diyar dibe ku ew berî bi pêncî salî evîndara wî zilamî bû, lê piştî neçar mabû ku bi pismamê xwe re, bi kalikê vebêjer re bizewice. "Ev rewş hetanî îro heye ku pismam bi darê zorê dotmamê ji xwe re dike jin." (M.A 23)

Di gelek kurteçîrokên vê pirtûkê de, em pêrgî mirovên ku hev dixapînin dibin. Di çiroka "Tekerê Sofî Teker" de, Sofî Teker, hespê Şerîfo didize. Mele Ehmedê ku 'devê xwe bi zendika xwe paqij' dike, dikeve nav wan. Piştî ku Sofî Teker, sê caran destê xwe li qalikê şîn ê radyoya xwe dixê, wek ku li Quranê xistibe, Şerîfo hespê xwe jê re

dihêle û diçe. Piştî rewşa wan a diravî wan dike şîrîkên hev ên diziya zebeş û talikan. Di dema diziya li nav bîstanan de, Şerîfo li ser stûyê Sofî Teker siwar dibe û bêtî ku lingê wî bigihîje erdê zebeş û talikan kom dike, Sofî Teker jî bi vî awayî destê xwe nade zebeş û talikên diziye. Gava a dinî rojê, xwediyê zebeş û talikan tê, her du jî sond dixwin; Şerîfo sond

dixwe ku lingên wî bi erdê bîstanê xwediyê zebeşan nebûye, Sofî Teker jî sond dixwe ku destê wî bi zebeş û talikên wî nebûne; sondeke derew-rast dixwin.

Nivîskar di van çirokan de bêtir li ser civaka kurdan rawestiyaye; fen, derew û tadeyên ku însanên Kurd bi xwe li hev dikin diyar kirine.

Di gelek kurteçîrokên de derdor tije leşker û zilamên îstixbaratê ne; carinan rasterast û

carinan jî bi sembolan ev

rewş tê diyarkirin. Di kurteçîroka "Mêrê Avis", ku pirtûkê navê xwe jê wergirtiye de tadeyî û neheqiyên ku bi destê dewletê li kurdên binxetê hatine kirin, tîne vegotin, bêtî ku vebêjer dev ji awayê vegotina xwe ya bi henekî berde û awirên xwe ji ser civaka kurdî bide alî. Lehengê çîrokê Benîştî, li 'biyaniyan' difikire û ji xwe re dibêje: "Duh erd birin, îro bender birin, sibê, ji sedî sed wê malê jî bibin." Ma ne gotineke gelêrî ye ku mirov di rewşên wisa de ji kerb û jana hundirê xwe avis dibe, çi jin be, çi mîr be.



Li ba Helîm Yûsiv rewşa zarokan cihêkî taybet digire. Di kurteçîroka "Tahtîla Oksijenê" de nivîskar bi protagonistê xwe van peyvên dide gotin: "Gelo min zaroktî dî? Ez bawer nakim. Xortanî, ez bawer nakim. Kalbûnê, temenê min tev de ji xwe re bir." (Mêrê Avis:130)

Ez bawer im ev hevok mifteya gelek tevgerên fîgurên Helîm Yûsiv e, ku gelekên ji wan zarokên Selîm Berekat tînin bîra mirov, ku bi qabqabikan pêl jîjoyan dikirin ji bo ku serê wan ji qalik derketa, da ku wan karibûya ew ser jê bikirina; û piştê jî bi hêsanî bigurana. Wek mînak; gava vebêjerê kurteçîroka "Tîskên Kerê Spî" qala kurê cîranê xwe Paloyê ku dev ji dibîstanê berdabû dike, wisa dibêje: "Ji lingana ker û pisîk girê didan û dest bi jêkirina terî û kîr û guhê wan dikir." (M.A.12)

Ma Selîm Berakat ji bo zarokên Qamişlo (û Amûdê?) di "Sîsirkê Hesînî" de negotibû; "Em zarokine bêzaroktî bûn. Û mezinên me jî xwe bi hovîtiya me paye dikirin."

Helîm Yûsiv, civaka derdora xwe baş nas dike. Ji bo ku rewşa fîgurên xwe ya niha vebêje li rewşa xerab a zarokan vedigere. Ew dizane ku zarokên di bin sixêf û lêdanê de dijîn, kî nê kerba xwe di hundirê xwe de hiltînin hetanî ku wek mezinan derfet bikeve destê wan, an jî kerba xwe di serê rawirên ji xwe lawaztir re derdixin.

Ma ne ezmûneke mirovantiyê ye: Heta ku mirovê tadelêbûyî karibe neheqiyê li kesên din bike xwe bihêz dibîne. Ma gelo sedema ku siyaseta medarên Kurda gelek caran bêtolernas in, naxwazin kesek ji wan pê ve hebe, rexneyekê li siyaseta wan bike jî ne ev e? Ji bo têgihiştina sosyal-psîkolojiya civata kurd gelek agahdarî di van kurteçîrokên Helîm Yûsiv de hene.

Pirsiyarek heye ku gelek caran tê dubarekirin, ka bê gelo wergera berhemekê, dikare ji berhemê çêtir be? Li gor min vê

pirtûka ku ji aliyê Heidi Karge bi alîkariya nivîskêr hatiye wergerandin ji bo elmanî bi gelek aliyên xwe bersîveke erênî dide vê pirsîyarê.

Di hin cihan de hewa henekî ya zimanê orijînal di wergerê de lawaz maye, lê diyar e ku wergêrê bi berpirsîyarî karê xwe kiriye; ku ji bo herika derbirînê pêwîst dîtiye, di devernana de hevok lê zêde kirine. Wek mînak; di destpêka kurteçîroka yekemîn "Tîskên Kerê Spî" de, ji bo destpêkeke xweştir ev hevoka ku di kurdî de tune ye, kiriye destpêka çîrokê:

"Zilamê kal Usivê Dêhno, li malê birîndar di nav nivîna xwe de xwe dirêj kiriye. Hişê wî yekcar tevlihev e û ji mêvanên xwe re qal dike bê çi hatiye serê wî." (S.M.11)

Di deverên ku di orijînal de likumandin hene jî, bi alîkariya nivîskêr mînakên zehf xweş ên wergerê hatine pê. Wek mînak: "Vegeriya odeya xwe. Kenê wî bi dirav hat. Kursî ew bi girî vekir û gava ku ew maç hat bîra wî (ji girî û ken) bû-digirîya û dikeniya- û bi tiliyên lerizî deftera têbîrên xwe pel bi pel çirandin." (M.A.121)

Wergera ji wergera bi Almanî: "Ew vegeriya odeya xwe: Gava wî dirav dîtibû keniyabû. Gava wî kursî dîtibû giriyabû. Gava ku jinê ew maç kiribû hem keniyabû, hem jî giriyabû. Ligel ken û giriyê di heman kêliyê de hingê wî bi tiliyên lerizî rûpelên deftera bîranînên xwe yek bi yek çirandin. (S.M.104/105)

Wer xuya ye ku wergêrê hevokên wek "Yê ku di bizina min e, ez ê di çêleka wî nim!", pir tazî dîtine û di wergerê de piçekî guherîne. Wergera vê hevoka jor: "Ku kesek tiştêkî bi bizina min bike, ez ê tiştêkî bi çêleka wî bikim." Diyar e ku Heydi Karge ne ji Amûdê ye.

Bi tevayî wergêrê karê xwe zehf paqij kiriye, bi gelek têbiniyan, xwendevan agahdar kirine. Lê mixabin ne her tim: Gava ku bijîşk ("Bûyerên Sala, 2014Z") xîtabî nexweşê xwe dike û dibêje: "birazî..."

wergerê ew kiriye: "Nexweşê delal...", xwezî di rewşên wisa de bi têbiniyekê bihata diyarkirin ku Kurd ji kesên biyanî re jî di rewşên wisa de, wek xitab "birazê" an "pismam" dibêjin. Bi vî tehrî dê xwendevan bêhtir li ser çand û zimanê ku ji bo wî nenas e, serwext bibûya.

Di gelek beşên kurteçirokên Helim Yûsiv de, jiyanekê absurd, jiyanekê dûrî aqilan pêrgî mirov tê. Nivîskar, jiyana rojane û çanda gelêrî tevî hev dike, di nav hev de distirê û jê jiyanekê absurd tîne pê. Fîgurên di van çîrokan de serberdayî derdikevin pêş me, surrealîzma Andre Breton tîne bîra mirov. Çu instanzên kontrolê tune ne. Ne tiştê ku divê bibe, an yê ku tê xwestin, lê belê tiştên ku dikare bibe, tê vegotin. Normên exlaqî, daxwazên civaka derdorê ne babetên Helim Yûsiv in. Ew di van kurteçirokên xwe de bêhtir tiştên ku wî li derdora xwe dîtine not kirinê, xwestiye, ku xwe bi jiyanekê rasteqîn, ramanên gelêrî yên civaka ku ew tê de dijî, bisînor nehêle. Di gelek cihan de hişê mirov wek qada kontrolê û nîzamatê winda dibe. Xeyal, daxwazên ku ji hundirê mirov tên derdikevin pêş. Di rabûn û runiştina gelek fîgurên "Mêrê Avis" de jiyana rojane û xewn û xeyal tev li hev dibin. Mîna teoriya S.Freud hişmendî û bûyerên li derveyî hişê mirov dibin yek. Dibe ku surrealîzma Fransa ya navbera her du şerên cihanê, bandor li hin nivîskarên ereban kiribe û -di ser Selim Berekat re- xwe gihandibe kurteçirokên Helim Yûsiv.

Li gor rexnegirê ereb Şewqî Bexdadî, Helim Yûsiv di van çîrokan de "dihêle ku carinan mirov bi kesên çirokê bikene, carinan jî dihêle mirov bi xwe bikene." Li gor rexnegira Alman Judith Wolf, mirov "di gera di nav kurteçirokên Helim Yûsiv re piştî ku mirov kêliyêkê bi tinaziyêkê ji kena dipeqe, di kêliya bi dû re dîsa hêsirên mirov tên jî."

Dibe ku xwendevanê kurd bi halê fîgurên van çîrokan bigirîn û careke din bigirîn.

Hamburg, 16.07.2005

1) Helîm Yûsiv, Der schwangere Mann(S.M), Kurteçîrok, wergera ji Kurdî bo Almanî: Heidi Karge, Weşanxaneya Unrast, Münster(Almanya) 2004,161 r.

2) Helîm Yûsiv, Mêrê Avis (M.A), Kurteçîrok, Weşanxaneya Avesta, Stenbol 1997,184 r.

Nûçeya li ser wergera Mêrê Avis a Elmanî

Çîrokên Helîm Yûsiv bi Elmanî

Ji weşanên Unrast verlag li Elmanyayê, pirtûka nivîskarê kurd Helîm Yûsiv (der schwangere Mann) -Mêrê Avis- bi zimanê Elmanî derket. Ev pirtûk ji hêla Heidi Karge ve hatiye wergerandin. Tê zanîn ku ev pirtûk cara yekem di sala 1991ê de li Şamê, bi zimanê erebî hatiye weşandin û di sala 1997an de, ji hêla weşanxaneya Avestayê ve, bi zimanê kurdî, li Stenbolê hatiye weşandin. Pirtûk ji pazdeh çîrokan pêk tê û li ser pênc beşan tê parvekirin:

1-Ax-Tîskên kerê spî-Peymanek bi Ezraîl re-Mêrê avis.

2-Av-Tekerên Sofî Teker, Riya firayî, Bizina mijokî.

3-Xwîn-Memo ji mirinê şiyar dibe.

4-Agir-Skeletê evîndar-Sêqorziyek bi çar qorziyan-Bûyerên sala 2014an.

5-Ba-Tehtîla oksejînê, Jînenîgariya solekê, Hezkirina bêling, Cîhan ji avdestxaneyê tengtir e.

Pirtûk, di çapa xwe ya Elmanî de ji sed û şeş rûpelên ji qetên orte pêk tê.

Ji bo agahiyên berfirehtir li ser pirtûkê û nivîskarê wê, bi zimanê Elmanî, hûn dikarin li vê adresê bigerin:

Unrast-verlag- Neuerscheinungen
frühjahr 2004.

DESTÊN SPASDAR

Mêrekî tînim ber çavên xwe; mêrekî ku ji her derê laşê wî destên bêkêr şîn dibin...

Û bi şînbûna her destekî bêkêr, pîrsekî dîtir di serê min de çêdibe û birînên di nav û dilê min de har û teşenekî dibin.

Gelo mirov rastî û rasteqîniya xwe û civaka ku tê de dijî, bi çend rê û awayan dikare bîne zimên..? Wêje û hunera vegotinê (vegötina kurdî ku kirasê nûjeniyê li xwe kiriye û ketiye nav hewla têgihîstandinê...) çi qasî rê dide vê yekê..? Gelo zimanê kurdî ya heyî, ya axaftina rojane, (ku li bakur hew di çend navçe û gundan de maye) têrî vê yekê dike..? Heke na, nexwe mirov dikare bi çi rengî, bi kîjan zimanî, bêtî ku civakê pê biêşîne, vê yekê pêk bîne..? Helbet bersiva van pîrsan bi qasî rê û awayan e jî. Lê belê;

Min jî bersivek heye; Bi zimanekî îronîk; an jî bi gewdekirina îroniya ku di nav zimanê argo yê wê civakê de veşartî ye...

Camêrek heye, vê yekê di kurteçîrokên xwe de heta tu bêtî xurt û zîrekane pêk tîne: Helîm Yûsiv.

Belê ev çend sal in ku kurteçîrokên Helîm Yûsiv wekî stûneke xurt û zexm a vî zimanî, wekî deq û tekstên xetmê li ber serê min disekin. Her gava ku ez li wan vedigerim, careke din jî rastiyeke civaka (min) Kurd, (ku jiyîn û vehewîna tê de êdî bûye qehremaniya ku êş û jan lê bûne kana çepik û pesindayînan...) wekî keleheke vê stûnê derdikeve pêşberî min.

Ziman û şeweya ku Helîm Yûsiv ji bo vegotin û kurteçîrokên xwe bijartine, ji bo têgihîstandinê diwartirîn rê ye (belkî jî xwestirîn...); vegötina îronîk û hûrtinazî ya bi şeweya ku bêhna surrealîzmê jê tê; ku di şert û mercên îroyîn de bes zimanê argo yê zimanê kurdî, rê û derfeteke fireh dide vê yekê.

Helîm Yûsiv baş jê haydar e ku divê mirov (bi taybetî nivîskar) çawan û bi çi rengî têkilî bi rastî û rasteqîniyê re deyne. Ew bi tewr û awayekî modernîst hem rabirdûyê, nîrxên wê yên pûç û genîbûyî, bi dîtî û awîrekî hişk û tundraw rexne dike û hem jî dilsozî û girêdaniya xwe ya ji veguherîn û nîrx û hêjahiyên dahatûyê re, tîne zimên. Rexneyên ku Helîm Yûsiv di kurteçîrokên xwe de li nîrxên pûç û paşmayî yên civakê dike, bes ne ji bo lidijderketinê ye. Yanê hema wisan li dijî adet û toreyên heyî dernakeve. Ew kurteçîrokên xwe de, bi hişmendiyeke xurt û gihîştî, bi her peyva xwe, bi her hevoka xwe, tiştên heyî ku Xwedê dizane(!) bê ji kîngê ve hene, dide ber cercereya zanîne û dikeve nav hewl û keftûlefa avakirina dahatûyê.

Dilawer Zeraq



Helîm Yûsiv, bi tewr û awayekî modernîst hem rabirdûyê, nîrxên wê yên pûç û genîbûyî, bi dîtî û awîrekî hişk û tundraw rexne dike û hem jî dilsozî û girêdaniya xwe ya ji veguherîn û nîrx û hêjahiyên dahatûyê re, tîne zimên.

Her wekî gelek kurteçîrokên wî, kurteçîroka Mêrê Pirstê heta serî li me gêj dibe, me di nav xweşî, dijberî, bêhişî, bîrûbawerî, êş û xem û çêr û henek û hûrtinaziyan de digêrîne. Dilê min heye ku ez bi vê nivîsarê destê xwe bidim Mêrê Pirstê û -her çi qasî ji tewr, awa û teknîka nivîsandina kurteçîroka Mêrê Pirstê cudatir be jî- bi terh û awirekî dîtir lê bixebitim ku baş jê fêhm bikim...

Çîroka Mêrê Pirstê berî her tiştî çîrokeke wisan e ku bi guhên yek ji rastiyên civaka Kurd digire û bi îronî û kenekî reş, wê li bin guhê erdê dixê. Ev çîrok, çîrokeke dilkevir e û li ser serhişkiya kurdan hatiye avakirin; (Tevî vê yekê jî dixwaze serê wê nerm bike...) Serhişkiya ku bi çavekorî bawerî bi dîn û olê aniye -ku ev bîrûbawerî, bawermendiya bi vî rengî red dike- û bi awayekî qederperestî jî hew pê ve maye û wexta dimire jî spaskirina li Xwedê, ji bîra nake...

Nivîskar bi hevoka "**Nebêjin zêdeyî du destên wî hene...**" dest pê dike, xwînerê/î vedixwîne temaşaya jiyana trajîkomik a civakê; pêş de diçe, bi hevoka "**na, ev baweriya min e.**" hemû gunehên ku dê bi vegotinê pêk bîn, li ser milê xwe bar dike; û pê re jî bi gotina sofî, "**Çawa mîrekî bi du destan tenê wê tirî bifiroşe û....**" dide xuyan ku kana şaştiyan Mêrê Pirstê bi xwe ye. Bi vê hevokê em hay jê dibin ku kesê kurd (bi taybetî mîrê kurd) bi xwe destan li xwe zêde dike; di heman demê de destên xwe dirêjî çend karan dike û bi destên bêkêr ji rûniştinê diweste, aciz dibe.

Nivîskar bi pêhisandina vê yekê şaş dimîne; (ji me, ji xwîneran dixwaze ku em jî pê şaş bimînin; Lewra heke mirov bi tiştêkî şaş û behetî nemîne tê wê wateyê ku mirov di nav banekî û hînbûyînen xwe de fetisiye...) Me jî dike hevparên xwe yên dilsoz û li sedema tiştê ku ew şaş û metel hiştiye, digere, kifş dike û vedibîne; bîrûbaweriya ku bi çavekorî dil û mêjiyê sofî pê ve ye û her li ser xîmê "**spasiyê û spaskirinê**" (hemdlêkirin) ava bûye.

Lawê mîrik (Sofî: ku sembola mêjiyê

kurkisî yê mîrê Kurd e) pûç ji diya xwe dikeve: Yanê pûçîti jî zikmakî ye û ji dayikbûnê dest pê dike. Lê sofî bédeng e û li ser spasî û bîrûbaweriya xwe ye. (Li vir bi awayekî zîrekane "Ji dayikbûn, çêbûn û ji diya xwe bûn" nehatiye bikaranîn. "**Ji diya xwe ketin**" ji bo ajal û heywanan e; û bûyîna pûç, bi zimanekî argoyî û îronîk tê rexnekirin*)

Hema pê re lawik di xortaniya xwe de dimire; Li vê derê nivîskar nezanî, naştî û nestewîna civaka kurd a di bîrûbaweriya xwe ya kevneoldariyê de radixîne darî çavan. Lewra ji xeynî mirinê, tu rê û çare ji ramana xav, naştî, hişk û negihîştî re tune ye. Gotina "**.... mirina lawekî lingpûç e....**" bi sofî dide gotin û vê baweriyê wek baweriyêke lingpûç ku bi temamî erdê nagire, mehkûm û rexne dike.

"**Ez bi terektozê cot nakim, hetanî ku kerê min î şamî sax be li ser rûwê erdê.**"

Terektoz: sembola nûjeniyê; û pêşketina civaka ku bi hiş û bîra xwe ve gundî maye. **Ker:** sembola bêhişiyê; û serhişkiya ku bi tenê bi zext û çokirinê gavan bi pêş de diavêje. Nezanî û bêhişiya ku hay ji şûndemayîna xwe nîn e; her ji vê hayjênebûnê kêfxweş e û vê yekê wekî pesindarî, merîfet û serbilindiyekê dide der.

Wênayê ku bi (ne)dîtina sofî divê neyê temamkirin, baş me pê dide hisandin ku di baweriya olê de şiyana afirandinê bi tenê li Xwedê hatiye bexişandin. Bi ser de jî gotin û navlêkirina sofî ya (qaşo) tinazpêkirinê, "**Bijîşka mîzê**" jî bêqîmetiya huner û afirandinê ya di civaka Kurd de, radixîne darî çavan. Bi vê re jî bi gotina "**Xelk çûne ser heyvê û hîn tu berradû van wêneyan didî?**" û bi îroniyêke xurt, em careke din jî bi rewşa trajîk a sofî ku hay ji hişyarî û zîrekîya xelkê heye, lê ji nezanî û bêhişiya xwe tune ye, pê dihisin.

Haya sofî pir baş ji xasî û têrbaşiyê jî heye. Qala reng û demên gihîştina tiriyan dike û bi ziman û dîtineke sofîyane başî û çêjdariya Tiriye Mezrone tîne zimên û balê dikişîne hêjahiya yektatiyê. Û vê başiyê bi gotina

"Mêr divê wisa be yan jî bila tunebe." tîne ser mêrbûna xwe û xwe lê dike xwedî. Deqê mêran e...; qala desthilatdariya xwe ya kevnêşopî ku hêza xwe ji bêhêziya jinan digire, dike. Mêr e, dixwaze bi dest û lingên xwe neh karan bi hev re bike, lê çi seyr û ecêb e, dîsa jî ji rûniştinê diweste...

Nivîskar bi hevoka ku bi sofî dide gotin: " divê mirov bi kêrî xwe bê (wî hay ji bêtêriya xwe tune ye), şeytanê kor gotiye (Şeytan kor e, lê şiyana wî ya dîtîne nîn e): Ê ku bi kêrî xwe neyê ez ê li diya wî siwar bibim. (Şeytên vexwendî li siwarbûna diya xwe dike..)" hem celeba kurmê ku ketiye nava can û laşê sofî û her wî dixwe, hem jî rewşê aşkeretir dike.

Hevoka ku sofî piştî pesindayîna jina xwe, dibêje; **"Kî piştî xwe bi Xwedê ve girê bide...."** hevoka stûnî ya vê kurteçîrokê ye ku bi piştgirêdana li Xwedê (a ku bi bawermendiyeke pûç û beredayî jê hatiye bawerkirin...) mesaja xîmî û esasî tê dayîn û girêka civak û kurteçîrokê tê veçirandin. Û hema pê re jî agir bi mala sofî dikeve; bes riyek tenê heye ji bo xwestina alîkariyê; telefon. Lê çi mixabin xerabe ye. Û ka bêje ji ber çi ye, Xwedayê sofî ku tim spasiya xwe lê dike, bahozeke xurt derdixîne û li şûna destê xwe deyne ser piştî sofî, alîkarî li şewatê dike. Û gotina wî ya **"Spas ji Xwedê re ku çûyîna mal û jinekê ye û ne tiştêkî din e"** dike ku mirov ji behecan pirça xwe ji xwe bike.

Tevî van hemûyan, nivîskar berî ku çîrokê biqedîne, bi hêviyeke dawîn dixwaze ku bila ev yek tev de xewn bin; xewnerêşk bin, da ku qet nebe heq û hêjahiya bîrûbaweriya ji dîlpakî û hişmendiyanê bidîyê. Lê piştî ku rewşa heyî careke din jî li ber çavan şênber dibe, îcar nivîskar bi dilkevirane destên ku di destpêka kurteçîrokê de qala wan kiribû, ji nav laşê sofî şîn tîne û ji bo xatirê aqûbeta civak û kurteçîrokê, sofî bi ceza dike. Her wiha riyek tenê dimîne: Mirin.

Nivîskar sofî dikujîne. Lê dîsa jî gumanek di dilê wî de maye; ji ber ku nivîskar ligel modernîstiya xwe piçekî reşbîn e, di guherîn

û veguherîna dîtî û ferasetên kesên wekî Sofî de, zêde jî ne hêvîdar e (ji ber vê yekê mirina wan jê re wekî çareya dawîn tê xuyan...); û bi dengê nav û dilê xwe dibêje, **"Ji sedî sed apê min di zikratê de digot spas ji Xwedê re ku ez ê bimirim û ne tiştêkî din e."** Û navê apê wî yî ku heta dawîya (wî) û kurteçîrokê, Mêrê Pirdest e, bi mirina wî re hîn îronîktir dibe: Sofî Spas

Hema li vir, dixwazim hêmaneke din (ku pir bi zanîn û hostetî hatiye bikaranîn...) rave bikim: Çawan tê zanîn di civaka Kurdistan de, feqî, sofî, seyda û mele, ên ku di medreseyên gundan de digihîjin, tu car di hemdlêkirina Xwedê de nabêjin, **"Spas ji Xwedê re."** Belê ew dibêjin: **"Mala Xwedê ava, an jî 'Sed hemdûsena ji Xwedayê mezin re' û hwd.** Ji ber ku peyva Spas di rîya zanîn û xwendina berhemên kurdî ya van salên dawî re ketiye nav zimanê kurdî. Nivîskar bi rîya 'Spas' ê, nezanîn û lihevneguncîna Sofî û zanistê, dide ber îronî û hûrtinaziyan.

Belê dibe ku zimanê Helîm Yûsiv, wekî teknik, metod û şeweya ku ew bi kar tîne û pê dinivîse, ji bo roja îroyîn, ji bo xwînerên kurdî, bibe sedema jêfêmkirinê...

Lê heke em rengê pirsên xwe yên di destpêka nivîsarê de biguherînin û bêjin; civakeke girtî û xweşûndehîştî(!), çawan dikare xwe veke û askere bike? Em dikarin bêjin; bi hêz û efsûna peyvê; bi wêje û vegotinên wêjeyî, ku ji nav jiyan û şert û mercên rastiya wê civakê pijiqîne; û bi çi **'îzm'** a huner û wêjeyê, bi çi şewê, rê û rêbazê dibe bila bibe, pênûsa xwe (wekî derziyê Fostan) di birîna civakê re kiriye û hubrê nîqut bi nuqit dadirijîne navê... û her wiha em dikarin bêjin wê ev hubr bibe dermanê serhişkî û bêhişiyên hezar salan û êdî hew destên zêde û bêtêr di laşê mêrên kurd de şîn bibin û Sofî nema destên bêtêr vekin û bibêjin: spas!

***Divê ez bala we bikişînim ser bikaranîna peyvyan a herêmî: Ji ber ku li herêma me, tenê ji bo ker, hesp, hêstir û deveyan "Ji diya xwe ket." tê gotin. Nirxandin û ravekirina min li ser vê yekê ye.**

XWENDINEK DI KURTEÇÎROKA KURDÎ DE

Îsmâîl Badî

Berahî



Xwendin û li dûçûna toreya Kurdî girîng e û pêdivî ye ji bo her nivîserekî, her wisan ji bilî xwendina verêj û berhemên wê parçeya ew nivîser û rewşenbîr lê dijî, pêdivî ye li ser wê verêje parçeyên dî yên Kurdistanê bixwîne û agahî li ser çawaniya berhemên wan hebe.

Li dû vê şopê, verêj û berhemên nivîserên kurd li parçeya Kurdistanê rojava ji hemû parçeyên dî û derve pitir (bêhtir) digihîne me li vê parçeya jêrê û berdewam dixwînin, lewra nivîsên me jî pitir (bêhtir) li dor wan berhem û nivîsevanan e.

Deqê kurteçîrokê:

-Ya ku ji hemû çîrokan dirêjtir e -

PERE

Di jiyana me
ya niha de, yê
(pare-pere)
hebe, hemû
kesan ew
mirov divê û
serederiyeke
baş digel wî/ê
dikin, berovajî
wê, yê nebe
tenê dibêjin:
Xwedê alîkarê
wî/ê be!!

Ji bo çî ev çîrok e:

Çîroka gelek kurt, an kurtîle çîrok, an pîroze wek hindek nivîskar dibêjinê, yan her navekî dîtir, demek dirêj e hatiye nav panava çîroka kurdî û gelek çîroknivîsan xwe li vê panavê aşkere kiriye û çîrokên xwe lê berçav kirine, belê niha çîrokên gelek gelek kurtir têne nivîsîn û belavkirin, divê peyvên wê ji hejmara tiliyên destan neborin.

Ev rengê çîrokê her ji salên heftêyan ve li devera me peyda bûye û serkarwanê wê jî çîroknivîs û hunermend (Îbrahîm Selman)(1) û çîroknivîs û hozanvan (Feysel Mistefa) ne. (2) Çîroka ji hemûyan kurtir van her du nivîseran nivîsiye, ya (Îbrahîm Selman) e ku bi çend peyveka nivîsiye û heke ez şaş nebim her wek min guh lê bûyî, bi vî rengî bû: **(Li pişt berokê rûnişt û tebela xwe danî ser celebê..)** (3)

Di van heşt peyvên de, mirov dişê (dikare) gelek raveyan bide naveroka çîrokê, çî wek arîşeke xwêndariyê şîrove bike, an xwedanê tîfîngê nêçîrvan e û stêrka xwe li nêçîrê girtiye, an jî yên di çeperên berevaniyê de û ber sînga dijminan digire û xwe gorî axa pîroz a welêt dike. Her wisan hozanvan û çîroknivîs Selman Kovlî û Paîzê Emerî di salên heştêyî de deqekî nêzikî kurtîle çîrokan dinivîse û jê re digot (Pîroze) û niha jî

hejmareke zor ji nivîseran peyda bûne û afirandin û dahênanek berçav di vê biyavê toreya de heye.

Kurtirîn Çîrok:

Ji xwendin û serederiya me digel çîroka kurdî, çî li nav Kurdistanê jêrê û çî li parçeyên dîtir, heta niha çîrokên ku min dîtine û xwendine, kurtirîn çîrok û bi peyvekê bi tenê hatiye nivîsîn û belavkirin, ev a li ber dest e û em dê niha li ser bipeyivin.

Ev çîroka gelek kurt 'pere' ango 'pare' ya çîroknivîsê Kurd (Helîm Yûsiv) e. (4) Di panava kurteçîroka gelek kurt a kurdî de, çîroknivîs jî yê navdar e û cihekî taybet li parçeya rojavayê Kurdistanê heye û çendîn berhemên wî li çendîn cihan hatine çapkirin. (5) Ev çîrok a dûmahiyê ye ji koma çîrokên çîroknivîsê ya li jêr navê (Mirî Ranazin) û li berahiyê nivîsiye (Ya ku ji hemû çîrokan dirêjtir e -rûpel 101) Paşê çîroknivîs berperê dayê û bi tenê li nîva berperê nivîsiye: (Pere -rûpel 103)

Ji bo çî ev nav e?

Ji bo çî ev peyv e?

Tiştê aşkere ye serederî digel jiyanê li vî çaxê em tê de dijîn, daveka hevbendiyê di navbera mirovî û civakê de heye, bi dîtina me jî ew dav jî (pare-pere) ye û ew hevbendî pê tete girêdan, ev e ji bilî berxwedaneke antropolojîk ji bo mirovî û rol û hevbendiyê wî digel civakê bi xwe de. Her wisan her livînek û kiriyarek hebe û bi pareyê nebe, nayê encamdan, ango di vê

delîva jiyanê de (pare) ango hemû tişt -ji bilî tore û rewîst û dab û nêrîten civaka me ya kurdewarî -lewra çîroknivîsê ev nav e û ev peyv e hilbijartî ye û koma çîrokên xwe pê bi dûmahî aniye.

Naveroka çîrokê, bi dîtineke kurdewarî

Di hilbijartina navê çîrokê û naveroka wê de, çîroknivîs (Helîm Yûsiv) gelekî

serkeftî bûye ku her bi tenê peyva (pare-pere) hilbijartiye û wek Kurd dibêjin ya tije pîstê, xwe raman e. Di jiyana me ya niha de, yê (pare) hebe, hemû kesan ew mirov divê û serederiyeke baş digel wî/ê dîkin, berovajî wê, yê nebe tenê dibêjin: Xwedê alîkarê wî bibel!! Çimkî ji hemû lave dê derd û kovan ji bo peydabûn û rojane dê çendîn giriftarî hene di rêyekê de, çî li nav xêzaneke biçûk û çî li nav xêzana mezin ku bi dîtineke antropolojîk (civak e). Piştî hizirkirineke kûr, bi dîtina me çîroknivîs daxbar e bi ketwarê kurdewarî û serederiya wî digel perê, her di

kevn de berê xwe daye perê ku hemû tişt e. Her wek berî niha me da xuyakirin, belê bi çend rengên jêk (ji hev) cuda daye nasîn û her carekê bihayek dayê, çî baş û çî xerab. Bi dîtineke kurdewarî û boçûneke felsefî, di nav gotinên mezinan de, cihekî berfireh daye babetê pere, çend gotin li ser aniye, bav û bapîrên me bi şarezayane hizir tê de kiriye û sexlet û encamên jê peyda dibin deyne berçav û rojane ji layê xelkê me ve, ev çendî tete çespendin û bicihanîn. Li dor (pare-pere), bav û bapîrên me gotine (Qirêja destan e, heke şûst çî jê namîne) (6) Yan jî (Nanê ji kevê ye.) (7), di van her du gotinan de gelek bi sevkî û bê bihayî berê



xwe dayê, belê hindek carên di gelek biha dayê û xuya dike ku rê û rêbaza mirovan diguhere, wek (Pare(pere) bike cerk û misînan, dê milên xwe bihejinin) (8), an (Pare (pere) çavan li xudanî (xwediyê wî) tarî dikin) (9), an jî (Pare dîn ber e û dîn der e) (10) û (Pare îmandiz e) (11)

Belê bi vê çendê jî ranewestiyane û bi çavekî dîtir berê xwe dayê, ku dîsan yê pare hebe li çî tiştan namîne hinêrbend û her tiştê bivê dê ji bo wî dê berhev bibe wek dibêjin (Pere hebin helaw mişe ye) (12) û (Perê te hebin kes napirse tu kurê kê yî) (13), an jî (Heyî be kurê kerî be). Ji bilî van hemûyan, bav û bapîrên me gotine (Perê xwe biavê ber hetavê û here rûne ber sîberê (sîtavê) (14). Zêdebarî van gotin û pendan, bi kurt û kurmancî û hemû kes dizanin ku di felsefeya kurdewarî de (Perê spî ji bo roja reş e.) (15)

Her wisan divê ji bîr nekin hinek caran mirov neçar dibe eger pere nebin, dest biavêje suxte û fêlbazî û derewan, ev e jî her di kevn de li nav mîletê me hebûye û ev gotin e vê çendê dupat dike li demê digotin (Barek dirav, an barek derew) (16).

Ev reng naverok e û ev reng kurteçîrok e, an kurtîleçîrok e, an jî eger nûtir ji bo bête danîn, bi hizra me cara yekê têtê belavkirin û pêdivî ye li ser vê babetê bête nivîsîn û çîroknivîsên me bizavên mezintir bikin ji bo nivîsîna van rengeçîrokan.

Jêder û feroz:

Helîm Yûsiv: Mirî Ranazin (kurteçîrok) Stenbol, 1996, rûpel 101-103.

1-Sala 1952yan li nehiya Zawîte ji dayik bûye, demeke dirêj li îzgeyê kurdî li Bexdayê kar kiriye, niha li Holandayê dijî, şanogerî û çîrok û senaryo ji bo sînemayê nivîsiye û di vî warî da çendîn berhem û pirtûkên çapkirî hene.

2-Sala 1946an li Dihokê bûye, mamosteyê zimanê kurdî bûye, sala 1978an dîwanek li jêr navê (Evîn) çap kiriye, di warê wergêranê û zimanî de şareza ye û niha li

Hewlêrê ye li wezareta perwerdehiyê karê xwe dike.

3-Hêvîdar im her nivîserê pitir (bêhtir) pêzanîn li ser vê babetê û vê çîrokê hebin, ji bo me û xwendevanan bide xuyakirin.

4-Li bajarokê Amûdê li Sûriyê sala 1967an hatiye ser dinyayê, niha li bajarokê Amûdê li Sûriyeyê dijî.

5-Ji berhemên wî:

-Mêrê Avis - Çîrok, Şam, 1991ê bi zimanê erebî.

-Jinên qatên bilind, Çîrok, Beyrût, 1995an, bi zimanê erebî.

-Mirî ranazin, Çîrok, Stenbol, 1996an, bi zimanê kurdî.

6-Hecî Cafer: Gotinên mezinan li devera Behdînan, Bexda, 1986, rûpel 27.

7-Pêzanê Alîxan: Dumrarî ji gencîna folklorê kurdî, Hewlêr 1985, rûpel 70.

8-Jêderê çûyî, rûpel 71.

9-Ehmed Qerenî: Kanî -komele tekstên folklorîne, Bexda 1984, rûpel 28.

10-Umer Şêxella Deşteki: Pendê kurdî - Bergê yekem, Hewlêr 1972, rûpel 29.

11-Hecî Cafer: Gotinên mezinan...-jêderê berê- rûpel 27.

12-Mele Mehmûdê Dêrşewî: Miştaxa çiya ji gotinên pêşiya, Bexda 1980, rûpel 138.

13-Deşteki: Pendê kurdî ... -jêderê berê- rûpel 29.

14-Hecî Cafer: Gotinên mezinan ... -jêderê berê- rûpel 28.

15-Jêderê çûyî, rûpel 28.

16-Dêrşewî: Miştaxa çiya ... -jêderê berê- rûpel 138.

Têbînî: Ev gotar di PEYMAN, hejmara 34an de, (11-8-1999) bi tîpên erebî hatiye weşandin. Ji hêla Aramê Darî ve, digel guhertinên biçûk di hinek peyvan de, ji bo tîpên latînî hatiye veguheztin. Îsmail Badî, nivîskar û lêkolînerekî kurd e û ji başûrê Kurdistanê ye.

HELÎM YÛSIV: DESTPÊŞXERÎ Û HÊVÎXWAZÎ

Dîsan ez dê li ser binemayên nivîskariyê birawestim, lê vê care dixwazim dubatê, ne tenê li ser hebûn, an nebûna binemayan bikim, belê li ser awayê pêkanîn û bikaranîna wan binemayan.

Ji bo nivîskarekî sakar û seretayî hindek binema pêwîst in, da ku bikare karê xwe yê wêjeyî encam bide, mîna: behre, xwendin, lêkolîn, aşînbûn û pêdeçûn û htd(hwd)...

Belê ji bo nivîskarê pîşesaz, her wekî nivîskarê romannivîs, bêhtir binema pêwîst in. Çimkî afirandina (çêkirin û avakirin) berhemeke wêjeyî a mezin, wek romanê, projeyek e û alav û amrazên xurt û taybet pêdivî dike, mîna: fantazî, teknîk, aşînbûn û berî hemûyan ziman; zimanekî saz û rewan ku bikaribe wergêranê (wergêrana wateyê) bike, eger pêwîst be. Belê, ya herî giring ew e ku bikaribe derbirîne bike.

Romana kurdî heye û ev rastiyeke çespondî ye, gerek e ku nivîskar û xwandevanê kurd vê yekê bi asanî werbigirin. Belê, mafê wan heye ku pirsîyar bikin ka romana kurdî di kîjan qonax û astê de ye?

Ev dikare bibe pirsar rojgarê û bibe cihê têbînî û rexneyan, her çendî zimanê rexnegiriyê hêj nesax e di civakê wêjeya kurdî de û sedemên cuda cuda hene.

Roman kar û hunereke pir rehend e û her tim bizavê li nav û derveyê cih û zemanan de dike û bi lêgerîn û hewldan berdewam dike û di berdewamiyê de dikare bigihe asta bîndariyê. Ji her karekî din bêhtir pêwîst e, bi taybetî ji bo neteweyeke çewisandî wek neteweya Kurd. Çimkî roman bi xwe bilind û vekirî ye, dûrî rastiye reha û daxistî. Ango, dê bikaribe neteweyê ligel xwe bilind bike, vebike û pêrgî pirs û pirsîyarên nepenî bihîne.

Hindek sosyologên civaka ewrûpî, mîna C. Logaş û Goldmanî dibêjin:

"Forma romanê bi binyada civakê ve girêdayî ye."

Eger em vê boçûnê li ser civaka kurdî bi awayekî kirdar analîz bikin, dê xuya bibe ku civaka Kurd (takekesê wek binge), hêj nesax û herifî ye.

Ew takekes, gereke bê avakirin û avakirin berî afirandinê ye. Her wisa, zatê takekesî bi xwe jî hêj nesax e, lewra mafê her kesî heye ku pirsîyar bike: takekesê/a nesax dê çawa bikaribe derbirîne ji civaka xwe bike?

Derbirîn dê ne hêsan be, çimkî civak bi xwe wan takekesan diçewisîne, kêr dibîne. Belê di heman demê de takekes gunehkar e; çimkî ew jî civakê ji xwe kêr dibîne û bi hoyê nebûn, an

Sebrî Silêvanî



**Romana kurdî
heye û ev
rastiyeke
çespondî ye,
gerek e ku
nivîskar û
xwandevanê
kurd vê yekê
bi asanî
werbigirin.**

**Belê, mafê wan
heye ku
pirsîyar bikin
ka romana
kurdî di kîjan
qonax û astê
de ye?**

lawaziya derbirînê, bandorên nerênî digihin prosesa afirandin û bîndariyê û wiha werara takekes û civakan pêkve girêdayî dimîne, her wiha werara romanê jî.

Gelek mijarên sereke di piraniya romanên kurdî de hene. Belê ez dê tenê li ser du mijaran birawestim, ji ber ku hêj lawaz in û pêwîstî bi pêdeçûn û lêkolîn û xwendinan hene mîna:

Ziman: (teknîk, alav, huner)

Derbirîn: (derbirîna pêkhateyên civaka kurdî, hişmendiya ku heye û ya ku gereke hebe)

Der barê zimên de, heta niha nikariye saziya xwe di karên wêjeya kurdî ya nûjen de wek bûnewerekî sereke û berdar biselmîne, ji ber gelek sedeman. Belê, sersedem nebûna zimanekî lihevhatî ye ku nivîskarê kurd bikaribe bi kar bine û her wisa xwandevanê kurd bikare werbigire. Lê, ev nayê wê watereyê ku nivîskar, bi taybetî romannivîs, wê yekê ji bo xwe bike behane û di akam de karek seqet û nesaz pêşkêşî xwandevanê kurd bike. Çimkî -wek ku min li jor amaje kirî- ziman binemayê sereke ye û berî ku nivîskar dest pê bike, gerek e ew binema -ne tenê hebe- belê saz û mukum û avaker be. Ew jî eger nivîskar bizanibe û bawer bike ku zimanî yasa û zagonên xwe hene û destpelînê dike, bêtir ku desthilatiya nivîskaran li ser xwe bipejirîne.

Ez dikarim bibêjim ku têgih û pêkhateya berfireh ji bo zimanî, di romana Sobartoyê ya Helîm Yûsivî de, heta radeyekê lawaz e. Belê di heman demê de wek derbirîn û endîşe heta eynî radeyê bihêz e. Ji aliyekî, zimanê romana Sobarto û gelek romanên din jî, wek awênayê nesaziya şeweyê avakirina civakê, çand û wêjeya kurdî dide xuyakirin. Belê ji aliyekî din ve, saziya hewldan û destpêxerî (însiyatîv) û asta hêvîxwaziya takekesane, ya nivîskarên Kurd (Helîm Yûsivî wek mînak) dide xuyakirin.

Ango, serbarê lawazî û kêmasiyên zimanê Sobartoyê, ji aliyê rêziman û teknîkê ve, Helîm Yûsivî kariye di Sobartoyê wê mijarê bizoxîne û wek pirseke sereke

-bêhemd- biavêje ser berkê, her çendî pirseke kevnar e jî. Belê, ji ber ku dema tengaviyan e, lewra girîngiya dubarekirina pirs û pirsîyan pêwîst e û buhayê wan kêmtir nake.

Der barê xala din de, derbirîna civaka kurdî (Hişmendiya ku heye û ya ku gereke hebe), Helîm Yûsivî hewl daye ku derbibire, bêtir ku biwergêre û ev jî bi serê xwe hewldanek kêmtir e. Belê heta kîjan radeyê kariye encam bide?

Bersiv dê zehmet be, çimkî hişmendiya ku heye her kes nas dike. Belê hişmendiya ku gereke hebe kîjan e?

Awayên pêkhatina wê?

Sîmayên wê?

Zemîneyê ku li ser ava bibe?

Li gorî kîjan felsefe û perwerdeyê?

Li gorî kîjan binemayên dîrokî, sincî û kulturî?

Ew hişmendiya ku gereke hebe, aya hatiye guftûgokirin?

Heta kîjan radeyê karîn heye ku bê pejirandin, an redkirin?


Lê, tu bibêjî ku romannivîsê kurd serqalê vê pirsê ye? An tenê penayê ji bo romanê, wek berhemeke pêwîst ji bo neteweya kurd, dibe?

Eger bersiv erênî be, nexwe çima heta niha bergehên wê hişmendiye ne xuya ne? Jixwe eger bersiv nerênî be, ma mirov dikare bibêje ku romana kurdî gihaye asteke bilind ku êdî xwandevanan pêrgî pirs û mijarên çarenivîsî bike û pirsê hişmendiye yek e ji wan?

Bi nêrîna min Helîm Yûsivî, di romana Sobartoyê de hindêkê-di navbera hişmendiya ku heye û ya ku gereke hebe de- hewl daye ku bi ser hil bibe, car nêzik dibe û car jî dûr dibe û ev jî li ser amraz û binemayên nivîskariyê yê xweyî dimîne, ango di wê mewdayê de lêgerîn pêdivî ye û ew jî mîna gelek romannivîsên din hewl dide. Belê hêj negihaye, ji ber ku ew mewda dûr û dirêj e. Dibe ku zehmet be ku kesek ji nîfşê me bikaribe bigihe dawiya wê mewdayê. Belê hêsan e ku bikaribe hindêk gavan biavêje.

DENGÊ BÊDENGİYA BİNXETIYAN

Ayhan Meretowar



Ji surrealîzma
vegotina Helîm,
dar û ber
direhilin; kevir û
kuçikên palan
tên xwarê.

Tewerê car caran
wekî

xwendevan, dilê
min ji şayesên
wî yên 'dîn'iyane
û 'cin'-iyane li
hev dikeve.

Û mirov dibêje
qey ev vegotin,
ne vegotina
nivîskarekî li ser
hemd û hişê
xwe ye.

Di nav nivîskarên me yên navdar ên mîna Hesenê Metê, Fawaz Husn, Firat Cewerî, Dilawer Zeraq, Fewzî Bîlge, Yaqob Tilermenî, Mîran Janbar û yên din de, nivîskarê me yê têr berhemdar ku xwendevanên kurd wî bi kurteçîrokan dinasin, Helîm Yûsiv e.

Digel ku em wî bi nivîsandina kurteçîrokan nas dikin, wî romana bi navê Sobarto jî heye. A rast mirov dikare li ser bingeha kurteçîrokê bala xwe bide şexsiyeta wî ya edebî.

Li gor baweriya min, wî ciyê xwe di dilê xwendevanan de, bi berhemên xwe yên ser vî çeşnî çêkiriye.

Tiştê pêşî ku vî nivîskarî di hişê min de bi cih kiriye, rastiya bêhisûpis a rewşa bindestî û bin-xetîya gelê me ye. Çawan ku Hozan Şivan Perwer rewşa gelê me, bi raveka "xewa mirinê" bi nav dike, Helîm Yûsiv jî bi navê 'dînîti, xwekuştin û mirinê' bi nav dike. Peyvên mîna 'xwekuştin, mirin, hêlîn, cendek, laş, xeniqandin, dîn, tabût, heyf, tol, tevkuji, zindî, kuştî', wisa di berhemên wî de cî digirin ku û êdî ji meriv witrê ku ew, ji nav orta van tiştên seyr hatiye. Bi gotineke rasttir, ev helwesta wî xweş diyar dike ku vî camêrî, ev rastiye malikxerab, di dil û hinavên xwe de, heta dawiyê hildaye; pê jiyaye. Na heke ne wisan bûya, bêguman dê nekariya ew çend di hevok û paragrafên xwe de van qiriktaliyên kambax wiha bi awayekî pisporene bihonanda.

Digel ku li hember bûyerên ser gel û welatê xwe bêhelwest nemaye, mirov rastî dîtineke zelal a polîtîk nayê. Derdora wî gişt polîtîze bûye; ew li ser gel û welatê xwe bengî ye. Di asta herî bilind de, hest-î-yariya xwe ya ser rewşa gelê xwe vedibêje.

Bûyerên ku di berhemên Helîm Yûsiv de cih digirin, bi awayekî zelal, rewşa vî gelî diyar dikin. Nivîskar, li ser kes, kom û bûyerên welêt, wisan neketiye dudiliyan û çî kesî, ji tu çînê, bi taybetî nebijartiye; hema bala xwe daye ser wan kes û komên ku ji welatê wî ne. Ev yek jî rê dide xwendevanan da her kes bikaribe bi hêsayî rewşa xwe tê de bibîne. Xwendevanekî/e unîversîteyê, dayikeke gundî, an jî

welatiyekî/e xeyrê me, jê re bûye leheng û daye serê rê; çûye gihîştîye merama xwe.

Ev wêjekarê ciwan, bi çavekî wisan li jîyan, rewş û kesayetiya civaka kurd dinihêre ku mirov dibêje qey ji dil jî ew, wan êş û keserên xedar bi xwe dijî. Di nav ew çend tenêtî û bêpiştiya nelayene de gelê me, digel rewîştî wî ya şerpeze û li hember serkutiyan çokqurfî, mîna dareke çinarê ku li ber devê çemekî gur û şîpî ye, dor lê hatiye girtin û li ber hişkbûnê ye, nîşanî çavên nebîna dide. Ew rewîştî me ya ku ji xewn û mirinê pêk tê, bûye gêreya benderê ji Helîm Yûsiv re. Neheqîya ku li kesayetiya me dibe û dibe sedem ku dinyaya hişê me xera bibe, hema hema têra xwe pêjna xwe ya ku pêdivî pê heye, li ser tiliyên wî yên kedkar bûye cisim. Digel ku xwendevanan bi xewnan keregêj; bi vegotineke helbestî sermest dike, dîsa destê wan jê nabe ku derê pirtûkê bigirin û bibêjin "Lo heyran, wele êdî ez nizamim ev çi vedibêje..."

Mirov, li ber rewaniya zimanê wî bêhemdî xwe dimîne hijmetkar. Hevokên rengo rengo, peyvikên kevîr û biwêjên ji serçaviya kaniya zelal û zîvîn, tehmeke ecêb didin vegotinê. Paya lêvan jî, ji nedîtî ve nayê. Tiştê ku heye di hin lêkerên ku bi kesê duyem ê yekjimar de tên kişandin, dest ji devoka xwe bernedaye.

"Eger em her tim hevdu bibînin, tê ji ber xwe ve her tiştî li ser min zanibe."

"Ooooh... min berî niha tu li wir dîtiye ne?" (J. Q. Bilind), Rûpel: 60

Di tewangê de jî, wî hin kêmahî hene:

"Ji nîşka ve xişte xişt hat, min go qey ez di nav heriyê de diçim xwar."

"Te min nas kir?"
(J. Q. Bilind: r: 15)

Edebiyata ereban, derfeteke baş daye Helîm Yûsiv. Wî gelek sûd jê girtiye. Dibe ku ev xweseriya nivîskêr, ji ber vê agahdariya wî ya ser edebiyata ereban tê. Di nav antolojiya çiroka kurdî de, xweseriya wî, bi awayekî pir zelal xuya dike.

Di nav çîroknûsan de tehera Fawaz Husên û Helîm Yûsiv gelek

serî didin ser hev. Tiştê ku heye

Helîm, di nav hest û ramanên xwe yên şexsî de qadîr e ku xwe tût û fena bike; îcar Fawaz Husên kevîr û kûçikan digel hîm û girgaran hêla dike bi ser derdorên ku mijara wî ne. Helîm dike ku dilê kafiran bi gelê wî bişewite; dihêle ku heta dawîya şayesê mirov pê derxe ka ew derd, keder, keser, kul û janên ku bûne agirê misêwatê û bi bedena vî gelî ketiye dihelîne, heta qîjîn e dişewitîne, çi ne, bi hemû dijiwariya xwe nîşanî çavan bide. Wer dike ku êdî tehemûla dil û wicdanan nikare xwe rabigire.



Ji surrealîzma vegotina Helîm, dar û ber direhilin; kevir û kuçikên palan tîn xwarê. Tewerê car caran wekî xwendevan, dilê min ji şayesên wî yên 'dîn'iyane û 'cin'-iyane li hev dikeve. Car caran mirov dibêje qey ev vegotin, ne vegotina nivîskarekî li ser hemd û hişê xwe ye. Gotin, an mîna ne gotinên dînen hur, an jî mîna ne gotinên wan mirîdên ku ji heqîqetê dûr bûne; ketine "cizbê" û hildîpetikin hewayê û pê re jî qiseyên pir xerîb dikin. Bi ser vê dînîtiyê de hin ramanên felsefî yên filozofên dinyayê jî ku bûne ruh û cesedê berhemên wî, tew êdî hal di meriv de nahêle ku bi peyamên wî serwest bibe.

2.

Çîroka wî ya "Hezkirina Qafkurmî" û "Gewdeyê Bi Xwe Re Di Şer De" du mînakên berbiçav in ku em dikarin li ser wan bigihîjin hin darêzan.

Jixwe ev çîroka bi navê "Hezkirina Qafkurmî" wisan bobelat e, ku tew mirov riya xwe lê nabîne ku ji hev derxe. Pîrî ku gotinên mîna 'mirin, reşikê şevê, laş, serê xwe da ber gezan, mirî dixeniqin, çavê mirinê...' hene, mirov çavtirsî dibe. Cîrantiya me ya bi gelê ermen re kiriye ew tîr behsa H.Z. Îsa pêxember û gelê ermen bike. Jixwe ev çîrok bûye neynika dîroka Rojhilat û Rojavayî.

Çîroka bi navê "Gewdeyê Bi Xwe Re Di Şer De" jî, li ser piştê hevokekê ji piya maye. Ev gotin ji devê keçîka Ermen derdikeve:

"Ji roja roj de hûn destikên ber destê xelkê ne."

Tiştê ku lehengê bûyerê, ji şerman di ber rûyê xwe de tîne:

"Erê Marîna, ez ji te û ji gelê ermenî û gelên cîranên we û gelên necîranê we jî hez dikim." e.

Gava mirov lê vedibe û dixwîne, ha ku mirov dibîne ku nivîskar ket şayesên derûniyên xerîb û seyr. Mirov di wan şayesan de gêj dike û ji nişkan ve ha ku te dît îcar hevokeke bi tenê, ku hevokeke li ser hemd û hişan e, derxist ber çavê te. Hîna ber meriv venabe, dîsan tavi lê vegotin bi cizbê dikeve. Di alema manewî de rewşa ketî ya welatê Kurdistanê, bi gilî û gazinan derdibire.

Ev çîrok jî bi peyvikên mirin (9 caran dubare bûye), kuştin (3 caran), xwekuştin, tevkuji, qiyamet, gorên belavbûyî, dîn (2 caran), cendek, laş, xeniqandin, tabût, şewat û hilweşandinê mişt dagirtî ye.

Her kurebav, wisan bi hêsayî nikare xwe berde bin wê behrê. Bêhneke kizûrê ku ji şewitîna cergê wî tê, digel ku em civakeke xwedî wî pozî ne ku tu carî naşewite. Min wer bawerî pê heye, her çi kesê/a ku hema bi ber rûpelên Helîm Yûsiv bikeve, teqez dê pozê wî/wê bişewite û dibe ku ew jî bi cizbê bikeve.

ŞÛRÊ SURREALÎZMÊ DIKARE ÇI BIBIRE?

Rêzan Tovjîn



**Piştî ku min
pirtûka Mirî
Ranazin xwend,
min bêhemdî xwe li
ser berga wê
romanê wiha nivîsî:
"Ji bo min di
edebiyata kurdî de
dema berî Helîm
Yûsiv û dema piştî
Helîm Yûsiv heye
êdî. Ez bi xwendina
vê pirtûkê ketim
demeke nû**

Tu mirovekî rast î, ne xeyalî yî û di destê te de şûrekî rastî, ne yekî xeyalî heye. Tu dikarî pê çî bikî? Ya rast ew e, tu li çî bixî dê hinekî ji wî tiştî, hinekî jî ji xwe bixwe. Lê tu mirovekî xeyalî bî û şûrekî xeyalî di destê te de be, tu dikarî pê çî bikî? Û ji dêleva dêrikiyan ve "em êdî ji hev re rast bêjin": Realîzm tê wateya "rastî"yê û SurRealîzm jî tê wateya "Tiştê di ser rastiye re, di ser xwezayê re", bi gotina gundîkî "tiştê ne rast" û heta "derew."

Gotina "derew" li zora surrealîstan neçe û tew wekî bersîv jî dibêjin; "Ma edebiyat û rastî?" Dema ew wisa dibêjin şûrê bi rastî yê di destê mirov de jî dikeve û mirov û ew dibin wekî hev. Tekane amûr, tekane çek û tekane berik gotin in êdî.

Piştî ku di destê rastgo û nerastgoyan de amûra gotinê bi tenê ma, serkeftin jî dimîne li ser tişteki bi tenê: Kî xweşik bi kar bîne.

Ev jî sed salî zêdetir e ku şerê di navbera realîzm û surealîzmê de didome û heta niha kes bi vî rengî nêzikî wê nebûye. Kesên di vî şerî de jî tu carî ji hev re negotine "ma ev çî şer e em dîkin, em her du jî bi heman çekê şer dîkin û heman çekê bilind dîkin. Tewer şerê me jî ji bo me ye, an jî bo vê çekê ye, ne belî ye."

Sedema ku em jî îro li ser vê yekê disekinin, ew e ku yek ji me jî ketiye nav vî şerî. Helîm Yûsiv... Bi baweriya min di bin her hunerê de razek heye, kesayetiyekek heye, nerînek û bandoreke civakî heye. Heke em van xalên dora Helîm Yûsiv nas bikin, em ê çêtir bikaribin bêjin ku gotinên wî tînin çî wateyê, an jî hunera wî tê çî wateyê.

Berî her tiştî bi erebî dinivîsand. Zimanê erebî jî Quranê û vir zimanekî sînorkirî ye. Kesî newêribû bi

erebî helbest binivîsiya, an jî nivîseke xweş û edebî binivîsiya.

Lewra zimanê herî xweş, ê herî helbestî, edebî û hêja zimanê Quranê bû. Nivîsandina helbestê bi deh salan maye di nav nîqaşan de. Vê bandorê heta sedsala 20î domandiyê. Ku yekî rabûya Mirî Ranazin binivîsanda, dê teqez ji Galileo xerabtir bihata serê wî.

Di dawiya sedsala 20î de Helîm Yûsiv bi vî cureyê edebî di nav erebî de çî dinimîne, ez niha nizamim. Bêguman edebiyata erebî ji nav wan sînôrên olî derketiye û bergeh li ber xwe fireh kiriye, Mirî Ranazin ji bo edebiyata erebî ya îro çî îfade dike em nizanin. Li pey vê yekê, xaleke din a hêjayî nirxandinê ew e ku Mirî Ranazin di sala 1996an de bi kurdî çap dibe. Bayê Azadiyê yê ku li bakur diherikî jî, ji aliyê ku wî serê xwe datanî ser balgiyê ve dihat. Gelo Helîm Yûsiv bi wî bayî re rabû ser xwe, an di nav edebiyata erebî de bi guftûgo û helwestên edebî? Vegera wî ya edebiyata kurdî hîn piştî van pirsan dibe xwedî nirx.

Di pirtûka Mirî Ranazin de, di çîroka Guhê Jêkirî de Remo heye. Remo bi guhê xwe yê jêkirî dikeve hundir. Jêkirin û jêbûna guh pirsgirêk e. Pirsgirêka wî pirsgirêka mala wî ye jî. Mal, cihê jiyanê ye. Ji bo hinekan mal xweş e, ji bo hinekan gund, ji bo hinekan bajar û ji bo hinekan jî welat xweştir e, yên din teng in.


Remo divê here ser bijîşk. Bijîşk ne çare ye, lê çareyê dizane. Nexwe bijîşk zana ye, zanyar e, xwenede ye. Remo li hêviya sibehê dimîne, lê nabe sibeh. Roj hilnayê. Gelek caran mirovên me di nav pirsgirêkan de dibêjin "hema roj li me hilata..."

Ev biwêj tê wateya riya çareseriyê.

Remo li mekîneyekê siwar tê ku here

bajêr. Lê ne rê diqede, ne jî roj hiltê. Mekîne amûr e. Mirov bi riya amûran hin tiştan pêk tîne. Dibe ku ev amûr partî be, dibe ku rêxistinek be, dibe ku tiştêkî din be. Rê naqede... Yanê riya çareseriyê dirêj e. Rêwî bi hev dikevin. Nîqaş li ser serê ajovên e. Heke mekîne partiya çareseriyê be, ajovan jî dibe serokê wê partiyê. Rêwiyên ku dibînin ne roj hiltê ne jî rê diqede, dê berê xwe bidin ajovên û doza guhertina ajovên bikin. Li gor Remo ajovan xewar e, bi vî awayî nikare wan bigihîne

armancê. Ew dixwaze derbasî şûna ajovên bibe. Di nav her partî, an jî rêxistinê de tiştên wiha dibin. Gelek kes li dijî vê daxwaza Remo derdikevin. Leşker jî. Leşker pergalê temsîlê dikin û li gor ku ajovan jî ajovanê wan e, rêxistin jî ne di destê gel de ye, ajovan jî ne ji gel e. Gel bi çavekî "hema roj li me hilê" li pirsgirêkê dinihêre û ji qerepelê hez nake. Dixwaze rakeve. Heta ku mirin hebe jî bila di xew de were.



Rê dirêj e, ajovan xewarî ye, roj hilnayê, ajovan naguhê, kesê ku dixwaze biguhê xwe li ser dike, alîkarê ajovên ava tijî dermanê xewê belav dike, rêwî radikevin, nîqaşa ji bo çareseriyê dişikê. Partiyên ku bi pergalê ve girêdayî ne û gel bi armanca ronahiyê lê tîr ser hev û pê dixapin li her welatî hene.

Di vê çîrokê de mijar bi vî rengî dihere. Her sembola ku hatiye bikaranîn bi zimanekî eşkere dikare bi vî rengî li ser pîrsgirêkên me werin şîrovekirin. Rasterê zimanê şîfrekirî ye.

Bi bawerîya min surrealîzm jî zimanekî şîfrekirî ye. We çî bihîstibe deynin aliyekî û bi tenê li şîroveya wê binihêrin. Hûn ê derkevin rastê.

Di vir de ya girîng ne ew e ku em Guhê Jêkirî çawan şîrove dikin. Lewra bi dehan kes dikarin bi gelek cureyên din jî şîrove bikin. Dibe ku hemû şîrove jî li ser bingeheke rast bin. Dibe ku piraniya wan rast bin. Nexwe gelo Surrealîzm piştî xwe dide realîzmê? Belê li gor gelek kesan bersiva vê pîrsa "na" be, lê ne rast e. Di dinyayê de tu kes nikare bi tevahî surrealîst be. Lewra ew çî sembol û tiştan bi kar bîne bila bîne, ew tişt di rastiyê de jixwe hene û ancax ew dikare bi wan tiştan bilîze û bi wî rengî pêşkêş bike. Dema ku Helîm Yûsiv dibêje "dûxanê di guhê wî re davêt derve" hem dûxanê, hem jî guh wekî du tiştên real digire dest. Heta gelekî ji me dîtiye ku hinek cixarê dikişînin û dûxanê di guhê xwe re derdixin. Çi ma? Tiştî ku ma ew e, honandina wê surrealîst e, an jî gotin tîr şîfrekirin û bi wî rengî tîr pêşkêşkirin.

Pîrs ev e: Vî zimanê şîfrekirî di erebî de çî îfade dikir? Ku hem erebî be, hem jî ji bo ereban hatibe nivîsîn, divê bi kurdî re heman tiştî îfade neke. Hingê wateya wê ya surrealîst derdikeve pêş û jixwe cesareta ku van tiştan bide weşan jî ji vê yekê tê.

Lê gelo çima piştî Mirî Ranazîn û Mêrê Avis pirtûkên din jî heman bandor ava nekirin? Dîsa bandora vê yekê jî hinekî ji rewşa civakî tê. Her çî qas bandora berhemê bi xwe bingeheke be jî, rewşa civakî jî wisan girîng e. Wekî ku Mem û Zîn piştî xwe bi 300 salî hatibe famkirin. Li ser vê pîrsê mirov dikare qala bandoreke din jî bike. Ew jî ev e:

Realîzm girîngiya xwe ji dest bernade û surrealîzm divê wê bi kar bîne.

Di sala 1997an de ku li Trabzonê, li ser ranzaya girtîgehê min pirtûka Mirî Ranazîn xwend, min romana "Tola Çiyayan" dinivîsî. Min bêhemdî xwe li ser berga wê romanê wiha nivîsî: "Ji bo min di edebiyata kurdî de dema berî Helîm Yûsiv û dema piştî Helîm Yûsiv heye êdî. Ez bi xwendina wê pirtûkê ketim demeke nû." Lê piştî wê romanê ku min romana "Hêza Hêviyê" nivîsî, min ji ya berê gelekî bêhtir lingê xwe danî ser realîzmê. Ji ber ku mirov ji kê re binivîse, mirov hinekî jî bi bandora wan, derdorê, kesayetiyê, bawerî û hwd. dinivîse. Cureyên edebiyatê hinekî bi vî rengî derdikevin holê. Ew bandoreke li gor xwe li ser mirov dikin û mirov dewlemendtir mezin dikin.

Di encamê de divê bêjim ku gel û xwendevanên kurd zû ji wî hez kir û hîn jî jê hez dike.

Peyvê



Serkan Birûsk

Tenê û ji xwe dûr
 bi peyva xwe de diteqim,
 çima tu ew qas giran î,
 çima tu ew qas rast î,
 binêre hê bêhna pîşê ji dilê min tê,
 çavên min nema bi xewê bawer in,
 peyvê,
 te ez
 tenê û xewleyê jiyanê hiştim,
 erê,
 hilma min e,
 helbest,
 derkirina kaniya êşa rastiya min e,
 erêêêê, peyva rast,
 mîna kalan gotiye; nebixêr
 min tu
 hê ji destpêka gera zimên de
 mîna xencerekê
 di ser dil xwe de dît,
 Cênîkên ji rengvada te peyvê,
 bûn kefen
 li salên ciwantiyê



Dost Çiyayî

Baz

tu ê jî mezin bibî helbet rojekê
piştî rojekê li dawîya rojan mayende
qencî/xerabî, aderî/binketî
du nasnameyên bî/mayî ji laşekî
dijberî hev û tevlihev/sar ango germ
dê bibine diraxe

li hêviya bijartineke neserbixwe
û riyên tî û dirêj du reh wê bikişin
ji serê pozên pêlavên te.

rastî, ji du robaran bi hev re
yek tal û yek şor wê biherike
şêraniya şetê dilê te yî xas,
û baran
tenê ji bo tawanbariyê wê bibarin
ji pelên pêdiviyên bédawî!

Bazê min!
li êvara neheqîn û qet ji bîr neke:
êvar neheq in, şevê carekê
wê ji te veşêrin ronahiya rojê,
xefik û dahfik derbasok in
dema tu jîr bî
û eger li kelem û kemînên şevê nelikumî
berbang ne dûr e
stêrkên çavên te bi xwe ne!

Nîşe: Me ev helbest bi helkefta salvegera koça dawîn a helbestkarê gorbihuşt
ji dîwana wî ya yekem (Qetran: Weşanên Avesta, 2005, Stenbol) wergirt û me
dest neda redaksiyona helbestê. (Kovara W)

Zarokên Dilkoçber

Dilşad Serkanî

Ji bo Zînê

Asê man di bêkesiya min de hîsên min
Û stranên dengbêjtiya min a lal..

Gava dikevim ser rê
Bêmak dimîne zaroktiya di hundirê min de..

Di seyra mirovan de me;
Bi çavên xwe yên tijî, di valahiyên mezin dinêrin.
Mejiyên wan jî asê maye..

Ji roniyên çiya, ji bajarên bêronî dibihurim.
Û ji bo zaroktiya me ya winda dilorim..!

Belê evînê,
Bi germahiya nêrînên te yên şehla
Dikevim vî bajarê ku bîrkor û dengsar.
Dîsa di rawestgehek a bêwariya xwe me.
Min konê 'Dilê xwe yî koçber' danî dîsa..

Min bi qasî xwe tu bi xwe re anî,
Bi qasî te min xwe hêla ba te;
Ne bi tenê me
Û ne tenê yî..



Evdile Koçer

**Nifşa nû, ji
wêjeyê
bigire heta
mûzikê, ji
siyasetê
bigire heta
mamosteti
yê ji xwe
re
çirûskekê,
riyekê,
şewqekê bi
kurtasî
modelekê
digere ji bo
ku berê
xwe bidiyê
û ji civaka
xwe re
bibe
'şivan'ekî
baş.**

Şûrê Ronesansa Kurdan: Model!

Belê, model! Û hezar carî jî model...

Lê gelo modelek çawa?

Nifşa nû di nav êş û trajediyên civaka xwe de hêdî hêdî serê xwe hildide û bi ser xwe ve tê. Bi her awayî, bi pirsên heftserî ve li rastiya xwe digere û ber bi wir ve gavên xwe davêje.

Ji wêjeyê bigire heta mûzikê, ji siyasetê bigire heta mamostetiyê ji xwe re çirûskekê, riyekê, şewqekê bi kurtasî modelekê digere ji bo ku berê xwe bidiyê û ji civaka xwe re bibe 'şivan'ekî baş.

Lê divê ez rastiyeke sor deynim li serê vê nivîsarê: Nifşa nû, bi dilekî şikestî, bi halekî têkçûyî ve serê hêviyên xwe datîne nav goristana hêviyên din.

Helbet ji nav vê nifşê çar pênc kesên îstîsna û xwedîbîr, dê di nav labîrantên êş û kulê de riyek li gorî dilê xwe ji xwe re bibînin. Ji bo ku quleka civaka xwe dagirin, wê bigihîjin meqseda dilê xwe.

Lê gelo bi hezarên din dê bi ku ve biçin? Dê çi bikin?

Hewlooo hawwwwar...!?

Bersiva vê pirs û hawarê di nav neynika sosyolojiya me de veşartîye. Jixwe ev bersiv wekî şûrekî kopîkirî her dem tê li me bikeve, fermo: Ji ber ku li ber wan modeleke baş tune ye, helbet bivê nevê wê berê xwe bidin kaniya modelên civakên cîranan!

Na na, ez başî û nebaşîya modelên cîranan nanirxînim; ev meseleyeke din e! Ez dizanim ku gelek modelên wan baş in jî! Lê modela her civakê li gorî sosyolojiya wê şikil digire û bêhtir li wê tê.

Jixwe her kes, her civak di nav rengîniya xwîn û xwêdana xwe de xwe ava dike; di nav bêhna toz û heriya xwe de, navekî li hebûna xwe dike. Piştî, di nav vê ked û avakirinê de ji xwe re modelên herî qenc diafirîne û datîne ber nifşên nû!

Lê gelo civaka ku bi her awayî modelên xwe neafirîne û nekeve pey, dê xweliya modelên kîjan cîranan bi serê xwe de bîne?

Kesên ku nikaribin fêkiyên zimanê xwe bitamijin, dê çawa hûşiyên zimanên din tam bikin. Kesên ku bi berçavkên zirbavên xwe nûjentiyê ji jor de dixwînin û ji şal û şapik û eşîrtiya xwe aciz in, gelo ji me re behsa kîjan modelên nû dikin. Kesên ku tovê kurdî nereşînin ser gundê xwe yî şewitî, gelo dixwazin ji me re qala kîjan ronesansê bikin.

Civaka ku bi destê zarokên xwe neyê avdan û avakirin, dê her roj serê zarokên xwe bide. Civaka ku bi ken û giriyên xwe ve, bi tilîlî û firîziyên xwe ve, bi şal û şapikên xwe ve orgazm nebe, dê serê xwe heta mirinê bide ber xwe. Civaka ku bi hemû heyîn û tunehiyên xwe ve, bi destê Egîr û Bermalên xwe ve, ji xwe re modelên belek neafirîne, dê bi halekî şîzofrenîk her bikule û bilikume.

Heger nivîskar, mamoste, siyasetmedar, mûzîkjen û hwd. ên civaka me bi ruhekî kurdî ve bimeşin, bi dîlnizmî û hurmetdarî tevbigerin, bi xwedîzanîneke dinyayî ve biçin ser meseleyê û di hêla xwe de xepareke spehî bikin, bi wext re dê bi ser kevin û ji bo nîfşên nû dê bibin modelên baş!

Em ji bîr nekin ku bi du sê gulan ve bihar nayê! Şerê mezin şerê modelîteyê ye. Kîngê ku jiyan û 'pêvajo' bi kurdî biriqtî, kîngê ku Newala Qesaban bû "Newala Hunerê", kîngê ku Birca Belek bû ziyaretgeha keç û xortên me yên ku vêga di zanîngehan de kovarên bi tirkî(!) derdixînin, a hingê dê modelên kurdî ji bikevin ser riya xwe.

Ji ber ku model 'tevn'ên civakan e! Helbet navê vê tevna me jî: KURDÎ û KURDAYETÎ ye...

Heger em tevnek xwe, an jî modelek xwe biafirînin, vêca em çî bivên tê de birêsin, dê tê de 'kurdî' derkeve. Lê ji bo modeleke çak û pak divê em di nav xwe de bi awayeke meşrû atmosferekê/dinyayekê ava bikin.

Divê em modelên kurdî di nav rêça civata xwe de derxînin û bi metodên baş bixin nava rihê civaka xwe... Lê berî her tiştî divê em perwerdehiya hezkirinê bidin xwe û civaka xwe. Divê em hez ji xwe bikin, hez ji civaka xwe bikin, hez ji hebûna xwe bikin, hez ji her tiştê xwe bikin...

Divê em bikaribin mesela; hez ji koxika xwe ya hilweşiyayî bikin. Jixwe her tişt dê hingê dest pê bike: Heke di destê te de koxikeke beredayî jî hebe, ku tu bikaribî wê koxika xwe paqij bikî, qul mulên wê dagirî, sewax û boyax bikî, li gorî îmkanên xwe bixemilîni û birengîni, dê xwediyên malên derdor, di dora koxika te re biçin û bîn û bi çavên zîq dê bixwazin guhên xwe bidin vê hostatiya te!

Lê heger tu di nav vê koxika xwe ya tije kêç de biqîrî û gilî û gazincan ji halê xwe bikî, cîran; an wê ji ber te birevin, an jî dê tişteki nexêr binin bi serê te.

An jî dema ku te çiyayek bi heft kotek û bela vegirt, heke tu nikaribî ji çiyayên din re bixî modeleke qenc, dê ew çiya jî ji destê te biçê.

Divê em ji bîr nekin ku ronesansa Ewropayê jî bi metodên baş, bi entellektuelên ku bi tevgerên xwe ve ji civakê re bûbûn model, dest pê kiribû û paşê jî wekî pêlekê civakê dabû ber modela xwe.

Halê modelîteya civaka me jî kêma zêde wekî vê koxika me ye...

Heger em ji nav bendera kurdî çîrok û helbestên xwe nerêsin û nexin dilê nîfşên nû, dê nîfşên nû di nav halekî şîzofrenîk de her bilikume û dê her serî li sêdara modela cîranan bide.

Hevîr û havêna wê modelê heger bi ked û sebebîyeteke kurdewarî baş meyiyan; jixwe dê ji rihê nîfşên nû re jî bibe havêneke baş.



Hesên Îrandost
kardoxi@hotmail.com

Xelkê Filistîna kevn ji nijad û Bereka Samî bûn û digel Erebb û Asuriyan têkeliyek nêz hebûn. Di pirtûka pîroz de hatiye ku Îbrahîm pêşnivîs û ava kerê qewmê (êtnîk) Yehûd bi bîngê û Eslê xwe Keldanî bûye. Qewmê Benî Îsraîl, bi sebebê xelayî û hişksaliyê ji Filistînê koçberî Misrê dibin û salên dirêj li wê derê bi cih û war dibin. Di encamê de vedigerin Filistînê û dikevin jêrdesthilatdariya DEWERAN, ku hem serokatiya olî û hem jî ya leşkerî di bin desthilatdariya wan de bû.

Navbera îbraniyan û gelên din de gelek şerên biçûk derdikevin, heta di encamê de şah cihê dewranan digirin. Ji mezintirîn şahên vî gelî Davud (990î Berî Zayînê) û kurê vî Silêman bûn ku di serdema wan de Benî-Îsraîl dibe xwedî mezinayî û hêzeke xurt. Padişahiya Silêman, desthilatdariya hikûmetê tê parçekirin. Îsraîl li bakur û Yehûdiye li başûrê ava dibin û Orşelîm dibe paytexta Yehûdiyê.

Şer Digel Cîranan

Di sala 721ê (B.Z.) de, Îsraîl hemberî Asuriyan wînda dîkin û dikevin jêrhukimdariya wan. Piştî demekê herêma başûr jî dikevin jêrdesthilatdariya babiliyan. Di sala 538ê (B.Z.) de, bi fermana Korus Şahê Persiyan, ev gel jî hêsiyê rizgar dibin û vedigerin Filistînê. Bajar û warê xwe ava dîkin û serkeftinên ber bi çav bi dest dixin. Di dema ku Yûnanî û Rûmî li pey hev serdemdariya dinyayê dixistin destê xwe, Filistîn jî dikete jêrdesthilatdariya wan. Di encamê de împaratorê Romî Tîtos sala 70ê zayînê Orşelîm wêran kir û Hemû hêviyên Benî-Îsraîl jî bo gihîştina rizgarî û serxwetiyê siyasî dane ber bê.

Wêjeya Eberî

Bînêşeya Dîrokî

Nêrîneke kurt li ser wêjeya îbrî

Hemû wêjeya kevnare ya îbrî digel Olê tîkel bûye. Yehûdiyan di demên kevnare de bala xwe ya ber bi Olê aşkere derbirine. Du berhemên van yên wêjeyî, pirtûka pîroz û Tilmûd der barê çavahiya Xwedê û yasayên Xwedê û mijarên exlaqî diaxivin.

Gelê yehûdî di destpêkê de anîmîst û bawerî bi zêdehiya Xwedayan hebûn. Hêdî hêdî yek ji baştirîn wateyên Xwedanasînê ava kirin. Di serdemên destpêk û berê de bawer dikirin ku Yehwe (Xwedayê Benî-Îsraîl) tirşrû, kînexwaz, hevesbaz û xwînrej e. Lê di dirêjahiya çend sedsalan de, ev wateyeke mezin bû û dadxwaz, mîreban, pîroz, parêzer û giştî bi xwe ve girt. Wêjeya îbrî ya kevn her çend şiklek olî bi xwe ve girtibû dîsan jî, ji her cure nivîsan, wekî tarîx, sirûd (marş), efsaneyên gelerî, dastanên nûmayîşî, jiyanname, name û ji dastanên kurt û gelek mînakên din, pêk tê.

Pirtûka Pîroz (Bîbîl)

Pirtûka pîroz bêhtir ji her pirtûkekê di dinyayê de tê xwendin. Bêhtir ji her pirtûkekê bi zimên û diyalêktên cur be cur hatiye wergerandin. Di zimanê îngilîzî wergera navdar jî bo padişahê Cîmz (1611) digel şasiyên ku hene jî baştirîn wergera wêjeyî ya pirtûka pîroz hatiye nasîn. Ev pirtûk digel seferên qelp heştê pirtûk in û ji sê beşan pêk hatine. Serdema kevn, serdema nû û Apokirîf ku beşa dawiyê jî di wergera îngilîzî ya Cîmz de hatiye.

Serdema kevn yan jî serdema Etîq

Kevntirîn beşa pirtûkê ku ji şerîeta Musa û nivîsinên din yên Cihûyan pêk tên.

Serdema kevn jî 39 pirtûkan pêk tê ku li ser 6 beşan par ve dibe. Dîroka dewr û deman, pirtûkên peyambaran, helbestên stranên, dastanên nûmayîşan, wêjeya desturî û çîrokan. Parçeyeke din jî jê diyar e. Ji van

parçeyan, pirtûka pîroz bi yasa, tarîx, helbest, peyamberên xwedî pirtuk û peyamberên ne Olulezm (Ne xwedî pirtûk), lê bi şeweyekî dîrokî û herêmî nehatine dabeşkirin.

Dîroka Gerdûn yan jî Tarîx Eyyam

Ev pirtûk dîroka yehûdiyan ji afirandina dinyayê heta avakirina Orşelîm, paş vegeza ji sirgûnê bi destê Babîliyan şirove dike.

Şeş pirtûkên dîroka Gerdûn;

1-Rêwîngiya peydabûnê, Rêwîngiya derketinê,

2-Rêwîngiya Lawiyan,

3-Rêwîngiya Hejmaran,

4-Rêwîngiya duqolî (Tesniye) û

5-Rûpelên Yuşee ku şeş pirtûkên destpêkê yên Toratê pêk tînin. Ji van pênc pirtûkan;

6-Pirtûkên destpêkê (Torat, an jî şerîeta Musa) salên dirêj bi şaşî digotin yên Musa ne!

Rûpelên Peyamberan (Pêxemberan)

Peyamberên serdemên kevn rêberê çêkirina civak û olê dihatin jimartin. Gotinên Xwedê digihandin xelkê. Xelk ji kiryarên wan ên ne baş agahdar dikirin. Ên ku ji karên xwe yên ne qenc poşman nedibûn û nedihatîn ser rîya qencyê, bi mirin û nabûdiyê tehdîd dikirin.

Îlya û Elyuşee du peyamberên destpêkê tînin jimartin. Lê tu rûpel û nivis vê yekê şirove nake. Di xêz û nihêrînên cîgirên wan (Peyamnêran) cudayiyên gelek zêde xuya bûn.

Amos hişyarkirinên xwe bi awayekî bilind û hêrs dianî zimên.

Hoşee xelk bi lehnek hêdî û aram, gazî dikir rîya Xwedênasiyê.

Îrmiya xem, keserdar, pejare û bedbîn bû.

Peyamberê nenas Eşeya yê duyem tije hêvî bû û xwe disparte Xwedê.

Her bi vê yekê jî giyan gel gazî rastî û qencyê dikirin û hin caran xwediyê hizr û bîrên ew qas zelal û helbestên dirêj û nazik bûn ku hest ber bi xwe ve dikişandin.

Pirtûkên wan;

Sefeniyee, Nahom, Eobediya, Zekeriya, Yoël, Melakî, Amus, Hoşee, Eşiya, Hebeqoq, Ermiyai, Mirasî, Xirqiyan ku bêhtirîn ji helbestvan û nivîskarên navdar ketin jêr bandora vê. Sîmoël Danyêl, Dantê, Mîltin, Wilyim Bilîk û gelekên din.

Helbestên Awaz û Stran

Helbesta îbrî ya kevn, wê şeweyê bi kar digire ku helbesta elmanî de tê dîtin. wekî avahî û hizr, kêş, ne qafiye heye û ne kêşek sererast, lê xwediyê aheng û melodyek taybetî ye û di nava piraniya pirtûkên pexşanî, helbestên Awazan (stranan) diyar in. Wekî awazan dibore, di pirtûka Gerdûnan de û gelek pirtûkên peyamberan bi temamî şiklek helbestî heye. Lê beşek mezin ji helbestên awazan pirtûka Mezamîr e.

Pirtûka Mezamîr (marş û stran) ji 150 sirûdan ku di 150 berî zayînê de hatiye nivîsandin. Ji hin ristan diyar e Dawud vehonandine.

Hinek di serdema desthilatdariya şahan û hinek jî di serdema hêşir ketinê de hatine vehonandin. Ên din vedigerin serdema paş hêşiriyê. Hinek awayê kesayetî û hinek jî şiroveyên nimêjê ne û hinek jî rexneyên tûj in. Hinek dirêj û guhvecinîker (serencrakêş) in. Bêguman tu stran û sirûd wekî Mezamîran, germ, pir heyecan, samîmî û rast nîn in.

Nûmayîşname

Di Filistînê de Nûmayîşname yan jî Teatrek xuya nake. Lê du berhem niha diyar in.

1-Pirtûka Eyûb (350 berî zayînê). Ev pirtûk, nûmayîşnameyek felsefî û wekî helbestî ye, bi form û qalib, rengê trajediya yûnanî jê dikeve. Pirtûk jî bo nûmayîş û mesrehî nehatiye nivîsandin, belkî armanc derbirîna karesateke xirab bûye. Şeytan ji Xwedê dixwaze ku Eyûbê duristkar û serfiraz giriftarê nexweşî, zarokên wî bimirin û tûşî şikestê bike, heta wî biceribîne.

Sê hevalên Eyûb yanî Sofir, Îlîfaz û Bilad bi wê baweriyê bûn ku ev bela û xerabî xwestina Xwedê ye ku vîn û dildariya Eyûb biceribîne. Eyûb destê girîn, zarî û dadxwaziyê bilind dike ku rastbêj û duristkar e, evîndariya wî bêdawî û nemir e, lê gumana wî di sezakirinê de heye. Serê wî tê dernakeve ku çima, bêgunehan tawanbar û ceza dike.

Di encamê de bangê di nava Babelûskê jê vedigerîne ku çawahiya tawanbarkirinê, ji hizr û tîgihîştina mirovan zêdetir e û mirovên bi xwebawer û qure nikarin daxwaza Xwedê bizanin. Eyûb serê xwe ber Xwedê ditewîne û şikra Xwedê dike.

2-Nûmayîşnameya duduyan; Awaz û newayên Silêman, ji hinek helbestên evîndarî û perçenûmayîş pêk tê, ku ji bo armanca xwendina dawetan de hatibû ristin. Tê xanê ev helbestên bedew û pirhest û carinan pîrevîn ji zimanê zavayekî di rola (neqşê) şah Silêman û Bûkê, Şulmît hatiye gotin.

Niha wisa tê şîrovekirin ku ev pirtûk temsîla evîndariya Mesîh bi kilîseyê ye. Ev ê ku helbest vehonaye Silêman û evîna li ser tê xeberdan, Evînek manewî ye.

Wêjeya şîret û pendî

1.Pirtûka metelan (meselan) ku piraniya wan aliyek exlaqî heye.

2.Pirtûka civakî: ev pirtûk tije ji bêhêvîtî, zorî û ferq û cudahî, şik û guman hatiye nivîsandin. Pirtûk ji zimanê kalemêrekî bextereş, ku jiyanê pûç û bêwate dizane derdibire.

Çîrok

Gelek çîrok di serdemên kevn de bi cih mane ku her yek xwediyê peyameke taybetî ne.

Pirtûka Rot; Dastanek kurt e ku zewaca endamên malbatekê bi hev re pir jîr û nazik rexne dike. Rot jînek e ku dibe jina Bueez û di rola pêşnivîsê Dawud, mezintirîn hukimdarê Benî-Îsraîl aşkere dibe. Ev dastan e bi sebebê derbirîna evîna Rot, bi zirdayika xwe ya bi nav û deng. (Ji min bixwaze ku te li cih nehêlim)

Pirtûka Yûnis; (275 B.Z.), ev pirtûk e der barê Yûnis û çawahiya hîlbijartina wî ji aliyên Xwedê, ji bo peyamberiyê şîrove dike. Di vê pirtûkê de rehm û mîhrîbaniya Xwedê, mezinahiya tewbeyê, qebûlnekirina destûrên Xwedê ji aliyê Yûnis şîrove dike.

Pirtûka Danyal; Ev çîrok e li ser efsaneyê kevnare, der barê hêşîrkirina Danyêl hatiye darêjtin. Armanca handana yehûdiyan ji bo şer û ceng digel mikabîyan bû û pirtûk bi pêşgoyîyan bi dawî tê.

Pirtûka Stêrk; pirtûka dawiyê ya serdema kevn (150 B.Z) ku lawaztirîn pirtûk e.

Armanca çêkirina bingeheke dîrokî ji bo cejna Forîma ya Yehûdiyan e. Di dastanê de rengê xwînrijî û tolhildanê tê de heye, lê bi awayê pir hunermendane û hostatî hatiye nivîsîn. Stêr, Melikeya Şah Îxşoroş bi aşkerekirina

pîlanên ku Haman ê xerabkar ji bo qirkirina yehûdiyan danî bû, Mamê xwe Mordixay û Yehûdiyan rizgar dike.

Serdema nû

Serdema nû avabûna Mesîhiyetê û pêşketinên wan şîrove dike. Ev pirtûk, çar jiyanameyên Îsa, kiryarên peyamberan, 21 nivîsinên der barê nijadên (çînên) olî û dahê-nana Yûhenna ye, ku bi hev re ji 21 pirtûkan pêk tê.

Încîl

Çar Încîl, yanê Încîla Merqes, Încîla Meta, Încîla Luqas, Încîla Zûhenna jiyan, serhildanên Îsa Mesîh şîrove dikin. Ev çar Încîl bingeheke wan yek in, lê bi hindikayî cuda ne.

Încîla Merqes; ku li ber nusxeya Aramî û bi Yûnanî hatiye wergerandin. Ji 70yî heta 100î (B.Z.), kevntirîn û korttirîn û belkî rasttirîn Încîl be ku Yûhenna Merqes ji hevriyên pitris Hewarî di Romê de tê parastin be. Ev Încîl sê salên dawîya jiyanê Mesîh, perwerde, Mirin, serhildan û paş mirina wî şîrove dike.

Încîla Meta; Wergera Yûnanî ji 80yî zayînê û aramî 55ê zayînê. Meta Hewarî ku dibêjin ji ber Încîla Merqes hatiye nivîsandin û rûyê wî li Yehûda ne û du armancan bi xwe digire. Yek ku Îsa peyamberê dawiyê yê Xwedê ye û duyem nivîsîna perwerdeyên exlaqî yên Îsa û pirtûk bi koknameya Yûsif mêrê diya Îsa dest pê dike. Ev jî dastaneke dilgir û bi awayekî baştir hatiye nivîsandin.

Încîla Luqas; Luqas ev pirtûk ji bo yûnanan û romîyan nivîsiye. Luqas Dr. û Havriyê Pols di seferên propaganda û ragihandinê de bûye, şîroveya wî aliyê mirovahiya Îsa ye. Luqas evîndarê helbestê bûye. Loma jî ahenga wî aram û hêdî û dostane ye.

Încîla Yûhenna; Bandora felsefeya Yûnanî û îskandîlawî bi taybetî behsa peyv di pirtûkê de xuya ye û li ser mezinahiya Îsa disekine û dibêje Îsa nimûne -ya peyvî ye. Lê bawerî, îman, ronîkerê evîna Xwedê ji bo mirovan e. Ev hevdengbûnek bi maf e. Ev jî bi awayekî wêjeyî û xweş hatiye nivîsandin.

Xalê Kirîv



Behlûl Zelal
b.zelal@mynet.com

Ez dozdeh an jî sêzdeh salî bûm. Mala me li gundekî Midyadê bû. Ne av û ne jî ji bo çandiniyê zewiyên gundê me hebûn. Debara mirovên gundê me, piranî bi bazirganiya bi dizî, ya ku bi binxetê re dikirin çêdibû. Lê êdî vî karî têra jiyana me nedikir. Jixwe ev kar jî pir zehmet bûbû. Her serê çend rojan agahiya kuştinê dihate şênîyên gundê me. An mayinên sînor, an jî guleyên nobedarên xetê yeko yeko, dudu dudu gundiyan me dikuştin. Hejmara kesên ku ji gundê me, di xeta navbera dewletên Turkiyeyê û Suri de hatibûn kuştin, ji pêncî zêdetir bûn.

Ji tirsî mirinê bû, pir westiyabû, an hatina karê bazirganiya bi dizî kêmbûbû, rastiya wê çi bû ez nizanim, bavê min tobe kiribû û dev ji vî karê bi dizî (qaçaxî) berdabû. Rojekê nivînên me, çend firax û miraxên me, ligel dê, dapîr û xwişk û birayên min û hinek gundiyan din, li kamyonekê bar kirin. Kamyonê em anîn gundekî deştê ji yên Nisêbînê. Li vî gundî, hinek zewiyên me hebûn ku ji kalê min weke mîrate ji me re mabûn. Me yê ji îro û pê ve jiyana xwe li vî gundî, bi karê çandinî û xwedîkirina ajalan bi dest bixistana.

Beravajiyê gundê kevin; di gundê nû de, sê cure netew û sê cure ol hebûn. Suryan, Kurd, Ereb; bi hev re li vî gundî dijiyan. Hin Kurd ji ola êzîdîtiyê, hin jê jî misilman bûn. Suryan; ew ji xwe fileh bûn. Ji ber ku hin gundên cîranê gundê me yê Midyadê Suryan, an jî Êzîdî bûn; min Suryan û Êzîdî ji berê ve nas dikirin.

Suryan fileh bûn; ango gawir bûn û jixwe neyarê ola me bûn. Ji ber vê yekê, her tim ramana kuştina wan û talankirina malên wan di hişê me de zindî bû. Heçî kesê ku çend mirovên fileh bikuştana; dê xêra wî ew qasî mezin bûya û dê deriyê bihuştê ew qasî zû li ber vebûya. Tew dihate gotin ku kesê gawiran bikuje, ew ê bêhesab û bêpîrsîn, rasterast biçûya bihuştê.

Heke suryan carekê neyar bûn, Êzîdî çar caran neyar bûn. Qet nebe ol, pêxember, kitêb û xwedayê filehan hebû, ma yê êzîdiyan? Êzîdî ew kesên neyarê ol û îmana me bûn. Tu tişt bi qasî kuştina wan ne bixêr bû. Em bi van gotin û çîrokan mezin bûbûn. Di civatên havînî yên li ber siya dîwaran, di civatên zivistanê yên şevên dirêj, li ber sobeyên germ ku bi êzingên Êzîdiyan disincirîn de, di civatên birêkirina leşkeriyê de, di civatên tazî, şîranî (keçxwestin), dezgîran û dawetan de; wekî ferzê nimêjê fetwaya kuştina fileh û êzîdiyan, ji aliyê meleyekî, şêxekî ve dihat dayîn.

Ji ber vê yekê, çi cara ku Êzîdî bi mebesta firotina êzing û mirîşkan dihatine gundê me û ji xwe re tişt û mişt ji dikanên gundê me dikirîn; me bi keviran li wan dixist, me kerên wan ji cihê girêdayî berdida, an jî didizîn, me çêrî wan dikir, me mirîşkên ku dianîne firotinê, ji ser barên kerên wan

direvandin, me hêkên ku anîbûne firotinê dişikandin, tiştê nedîma ku me dianî serê wan. Dema me kerek, çêlekek, bizinek, an jî mihek (mêşinek) ji wan bikiriya; pêşî berî ku di firaxeke me de avê vexwara û êm bixwara, bi axa sor û ava zelal devê wan ajalan dihatê helalkirin.

De îcar li vî gundî, kesên ku fileh, an jî Êzîdî bûn, ne ji bo çend kêlî û saetan dihatine gundê me, ew li gundê me dijiyan, ew jî ne bes bû, dihatine mala me. Bixêrhatinê didan. Carinan alîkariya me dikirin, çay û qehwe li mala me vedixwarin.

Ez di nav hestên têkel û nakokî de bûm. Ez xemgîn dibûm, ez hêrs dibûm û ji ber ku min nedikarî tiştêkî jî bikim; min ew qehra xwe berî dilê xwe dikir. Çi cara ku tiştêk li mala me bixwarana, an jî vexwarana, piştî ku çûn, dê dapîra min, bi axa sor firaxên me helal bikirana. Karê min ê esasî axa sor a ji nav zeviyan bû. Min bi misînê av li destê dapîra xwe dikir, wê ji bi giranî, bi aram û ew qasî jî bi hostayî, ligel hevoka "Eşhedu ene le îlahe inle allah, we eşhedu ene Muhamedu ebduhu we resul Allah" ku zêdeyî bîst caran dubare dikir, firaxên me bi axa sor dişûştin.

Rojekê, mirovekî piştixûz, porspî, rûşîrîn hate mala me. Berî ku were hundir, dapîra min di guhê min de gotibû ku "Ev zîlamê ku tê, fileh e" û diviyabû ku tu carî ez destê wî û yê mîna wî maç nekim. Mirovê piştixûz û rûspî, ji diya min re gotibû:

- Rabîa, xwarzê tu çawa yî, tu bixêr hatî. Diya min jî bi diayan lê vegeandibû û digel ku ji vî zîlamî re gotibû "xalo" çûbû destê wî jî maç kiribû. Navê vî xaloyî jî "Îso", angî Îsa bû. Min ji diya xwe pirsîbû, min ji bavê xwe pirsîbû, min rê di kê de dîtîbû, min ji wê pirsîbû. Lê mixabin kesî bersîvek ku pirsên min bi dawî bîne nedabû min. Ev mirov, mirovekî fileh bû, angî gawir kurê gawiran bû, ji diya min re digot "xwarzê" û diya min jî ji wî re digot "xalo". Ew kesên ku di gundê me yê berê

de, neyarê ola me bûn, kafir bûn, li vî gundî dihatine mala me û bi ser de jî em xal û xwarziyê hev bûn.

Êzîdiyên vî gundî ku bi cil, axaftin, dirûv û hemû tevgerên xwe mîna wan Êzîdiyên ku me her roj li wan dixist, me çêrî wan dikir bûn; ew jî dihatin mala me, li ser doşekên me rûdiniştin, li mala me xwarin dixwarin, çay û qehwe vedixwarin. Navê Êzîdiyan neguherîbû; li wir jî kirîv bû, li vir jî kirîv bû. Lê navê filehan guherîbû. Li gundê me yê kevin, navê filehan jî kirîv bû, lê li vî gundî navê wan bûbû 'xalo'. Diviyabû ez bersîva vê pirsê peyda bikim, an na her kêlî pirsan di serê min de civat datanîn.

Roj, hefte, meh dibihurîn. Hin bi hin ez aşî gund û gundiyan dibûm. Kar û barê bicîhbûna malê êdî qediyabû. Pê re pê re ez navên zarokan, navên xortên hemsaliyên xwe, navên cîranan û navên gundiyan din fêr dibûm. Navên Êzîdiyan wekî; Gernas, Cîndo, Zîwer, Kato, Dogîş, Zêro, Erzane, Hazo, Xulfa û ên din. bi piranî kurmancî bûn. Navên suryaniyan jî bi piranî wekî; Marawgê, Gebro, Îsa, Efromê, Nurî, Nurê, Nicmê, Nisano, Şamun, Gorgîş û ên din. suryanî (suryoyo) bûn.

Dapîra min, her roj, gava ez diçûm nav gund şîretan li pey min rêz dikirin: "Binêre binêre ha...! Tu li malên Êzîdî û filehan (suryaniyan) tiştêkî nexwî û venexwî. Ne tenê devê te, dê devê me hemûyan haram bibe. Dema xwestin tiştêkî bidine te, rabe were malê." Bi vî awayî dapîra min çend caran devê min bi axa sor û ava misînê helal kiribû. Ligel hin diltîrsî û şikên di serê min de, ji aliyekî ve jî ez hînî gund û gundiyan, bi taybetî hînî hevalên xwe, yê di temenê min de dibûm. Lê ew pîrsa ku çîma diya min ji kirîvê/xalê Îso re gotibû "xalo" û ew jî ji diya min re gotibû "xwarzê" ji bîr û hişê min nedîçû.

Rojekê, min keysa xwe lê anî û min ji hevalê xwe Denho ku ew jî di dibistaneke leyî ya bajarê Mêrdînê de dixwend pirsî.

Navê bavê wî Marawgê bû û "Îsoyê" ku diya min jê re gotibû "xalo" apê wî bû. Denhoyê ku pişt re ji min re gotibû ku ji ber pirs û tadeyên di dibistana leylî de lê dikirin, navê xwe di hikumatê de guhartibû û kiribû "Ömer" ez birime cem apê xwe Îso.

Îsoyê ku hîna jî min nizanibû ez jê re bibêjim "kirîv" an "xalo" qutiya titûnê bi giranî vekir; cixareyeke stûr pêça, pêxist û piştî ku lameke kûr jê da, dest bi axavtinê kir:

- Ma te ji dê û bavê xwe nepirsî bê ka çima min ji diya te re got "xwarzê"?

- Belê min pirsî, lê di ber guhê xwe re avêtin.

- Binihêre xarziyê min, -peyvika 'xwarzê' ji dil gotibû- Em Suryanî ne, hûn Kurd in. Ola me mesîhî (fileh) ye, ya we misilmanî ye. Kes nizane bê çi qas e, lê bi salan e, em bi hev re li ser vê axê dijin. Em cîranê hev in, em kirîvê hev in, em gundiye hev in... Ji bilî ku em ji hev bizewicin, her cure têkiliya me bi hev re heye. Ji ber ku ola me ne yek e, em keç û jinan nadine hev.

Xalê/kirîvê Îso salmezin bû; por û riha wî mîna berfê spî bûbûn. Nola mamosteyekî hêdî hêdî, bi hest û bi zimanekî şîrîn vedigot. Ez û hevalê xwe Denho, me nola du şagirtên ku li hostayê xwe guhdarî dikirin, bi baldariyeke mezin lê guhdarî dikir:

- Di zemanê berê de şer hebûye; Di vî şerî de ji hemû aliyan jî mirov hatine kuştin. Hinek bi tîfingê, hinek di riyan de; ji serma û ji nêza (birçîna), hinek ji nexweşîne...

Her ku Xalê/Kirîvê Îso vedigot; mitaleya min zêde dibû. Çima em "xwarzê" bûn û çima ew "xalo" bûn. Û çi têkiliya kurdan, ermenan û suryaniyan û vê yekê bi hev re hebû? Her ku diçû serê min tevî hev dibû. Bêsebr ez li dawiyê dipam.

- De îcar, ez ji xwarziyê xwe re bibêjim; dema ev bûyer qewimîn, kurd û misilmanê me yê vê derê jî dest bi kuştina filehan

kirin. Gelek kes, ji Êzîdî û filehan bi darê zorê, ji tîrsa re misilman bûbûn. Ma ne navê gundên Midyadê Kindêrîb, Kefirhewar, Kefirhilab, Dêrizbina, Evşê, Mizîzex, Qartmîn e... Wê demê mala me li Gundê Êrdê bûye. Êrdê gundekî Kercewsê ye. Li gorî gotina diya min, ez wê salê sê an çar salî bûme. Hin malbat reviyane, çûne xwe avêtine bextê axayan. Çi qas mal, milk, zêr, dirav di destên wan de hebûye dane şêx û axayên eşîrên kurdan. Hin zar û zêçê xwe revandine çiyayan, demekê di şikeftan de mane. Hin malbat jî yekcar hatine qelandin. De îcar ez bême ser pîrsa te. Kalê diya te navê wî Heso bûye. Heso mêrekî bi nav û deng bûye. Li gel malbata xwe bi hêza şûr û tîfinga xwe desthilatdarê wê herêmê bûye. Beriya fermanê dostaniyek di navbera malbata me û malbata wan hebûye. Dema ferman rabû wekî malbatine din, malbata Heso jî malbata me parastiye. Qet nehiştine ku yek mirov ji me bê kuştin. Nehiştine ku tu kes dest biavêje tişteki me. Li gorî gotina kalê te, ango bavê diya te, kalê me keçeke xwe ku navê wê Nura bû daye Heso. Li gorî gotina kalê min jî, Heso bi zorê di hemberî parastina me de, Nura li xwe mehr kiriye. Ji wê rojê ve, xwîna me ketiye nav hev. Ango diya te xwarzêya me ye. Îcar tu tê gihîştî?

Xalê Îso vegotina xwe kuta kiribû. Ez jî xweş tê gihîştibûm. Diya kalê min, ango diya bavê diya min Suryan bû. Îso ne "kirîv" bû, "xalo" bû. Peyvika "kirîv" li gel ku wateya dostanî û biratiyê jî tê de heye; ji wê rojê ve bi min ne xweş e. Lewma piştî wê rojê, min ji tu kesekî Êzîdî, yan Suryanî re negot "kirîv". An ez dibêjim "apo", an dibêjim "xalo".

Cotek Sol

Ehmed Ronîar

roniar@mynet.com

Jan ber bi nîvrojê dikira ji mal derketa, diya wî di pencerê re bangî wî kir û ew sekinand. "Lawê min! Serhat jî bi xwe re bibe, di wî hundirê de pir aciz bûye." Jan bi uftekuft serê xwe hejand, her du bi hev re derketin, ji bo ku biçin çarşiyê. Serhad û birayê xwe ber bi çarşıya ku ji her dem şêntir bûbû ve diçûn.

Di riyên derbas dibûn de, avahiyên du sê gato hema hema êdî nemabûn her ku çûbûn bilindtir bûbûn. Pê re, rê hatibû guhertin, vîtrîn hatibû guhertin. Tiştê wek berê nedima; carinan tiştên mirov dixwest biguherine zû bi zû nedihat guhertin. Carinan jî, ji bo tiştê neye guhertin her tişt asê dibû, tiştên me dixwest biguherînin û nedihat guhertin, me di serê xwe de, di xulyanên xwe de ew diguherandin.

Di nava wan gerînekên xulyanan de, awirên Serhad hemû di maweyên rê de ji rûyên mirovan bêhtir, li solên wan dialiqî; solên wan ên ku gelek caran rengê wan dişibiyên hev. Ji sol û şekalên cuda, hema hema xweşikî yek ne mîna yên din dinêr.

Serhad xortekî qeşeng û ew qasî jî bêdeng û di nava xwe de bû; porê wî yên zerik û kurîşkî, çavên wî yên şîn î kal her tim wek morîkan diçirûsandin. Di vir de meqseda şayesa min a li ser xweşikbûna wî, de qene di dawîya vê çîrokê de hûn bêhtir li ber bikevin e. Serhad bela ku heya niha tu carî nebûbû xwedîyê solekî tu rengî, dilê wî dibijiya solên ku di vîtrînan de didît.

Serhad her ku di ber vîtrînekê re derbas dibû, dixwest bisekine, lê guh nedidayê. Ji bela qerebalixiya mirovan her du jî pir hêdî

diçûn. Serhad derfetên li vîtrînen solfiroşan bêhtir temaşe bike zeft dikir. Jan li ber vîtrînekê ku ji ber şewqa geş solên tê de diçirûsandin sekinî û got; "Li vir hinekî li benda min be, ez ê a niha vegerim." Jixwe cihê ku wî jî dixwest lê bisekine ev der bû. Jan ji bo cejnê ji xwe re solekî bistîne çû ket nava dikanê. Bela ku dikan bi mirovan zehf qerebalix bûbû, Serhad li derve qederekî rawestiya.

Serhad di nava xeyalan de, ji guregura bajêr dûr, di dilê xwe de digot; "Kîjan sol xweşik e gelo? A reş ku pozika wê hinekî tûj e, an... Ez dibêim qey a qehweyî hê xweşik e. Lê bi qasî min di piyên hinekan de dîtibû, hê bêhtir ji van ê reş dixistin piyê xwe. Lê ev a hanê, ya di qorzikê de jî xweşik e ha, wekî hinekî din kubar e. Lê dibêjim qey, a li pêş qet ne delal e, ez bîm tu carî wê naxim piyê xwe. Gelo min ê bixista? Na na ev a reş û ya qehweyî tu dibê qey delaltir in. Ez bûma belkî min her du jî bikirîya, min ê ew têxista piyê xwe û di kuçeyên vala de bigeriyama; wê teqteqa sola min hatiba min. Min ê her tim gavên xwe bi leztir avêtiba. Ji bo dengê sola min, bêhtir bihata min. Ez ê hingê bextewar bibûma." Serhad bi dengê Jan re li pişt xwe zivirî, li cihê xwe rûniştî pirsî.

"Te ji xwe re sol stend?"

"Erê."

Sola xwe danî ser kabokên Serhad û erebeya wî ber bi malê de daf da.

16/11/04

Marî

D eh salên li xurbetê ew kiribû nola dareke hişk. Wê wate dida her qewiminen li der û dora xwe. Dizanî xerîbî parsekî, nearamî, neasayî, neewleyî û gera li ber derya ne. Lê dîsa dixwest koça xwe ya di tarîtiyê de û bêserî li xerîbiyê bidomîne. Ew li ewlekarî û aramiyê digeriya. Derbaskirina pênc salên li Surî ya di nav karên nehênî de, ew pir westandibû. Jixwe ew a dawiyê bû ku ji endamên rêxistina wan a ku rejîmê ew bi giştî girtibûn, ketibû destê hêzên ewlekariyê. Bi bawerî û lehengî li hember îşkencekaran li ber xwe dabû. Ew mîna termekî ser piyan, laşê wê yê ter î nazik wekî kulavekî reş lêhatî derbasî nav malbata xwe bûbû. Bîr û hizra xwe wînda kiribû. Tenê navên îşkencekarên xwe dizanî...

"Jiyan ji min re li vî welatî nema, ez hew dikarim kabûsan bi roj û şev bibînim."

Bi van gotinan rêya tal û bêdawî ya xurbetê dest pê kiribû. Li şûna xwe birayê di girtîgehê de, bav û dê, cihên bîranînên zaroktiya xwe, xaka ku dixwest li ser wê jiyanek dadwer ji mirovên wê yên dilsojê ji rojek bêtirs re ava bike, hemû rojên tal û şîrîn hiştin. Piştî xwe da felekê û berê xwe da oxira qederê, lê ne diyar. Rêwîtiya derketina ji çermê xwe dest pê kir.

"Ger hûn hewa vî welatî dikişînin, divê hûn bertîla wê bidin."

Vê yekê dinya lê kiribû kuna derziyê. Êdî hew dikarî li wî cihê lê bicihbûyî bisekine. Dikarî bi xelkên wî welatî re rehet biaxe û derdên xwe ji wan re rave bike.

Lê, mehale ku ew xelk bi derd û kulên we bihisin.

Xwar ji hemû cure xwarinên wan

Noşî hemû cure meyên wan

Li semagehên wan nola dînan reqisî

Her pêlekî dostê hevbeşbûna canê xwe guhertin

Lê, jiyan bi wan tevan tije nedibû.

"Ez êdî ji çî bitirsim, divê ez sînoran derbas bikim."

Sê car xwest ji wî welatî derbasî welatekî din bibe. Lê mixabin, her car dihate girtin û ji paş ve dihate zivirandin, li wargeha nola girtîgehê ya ji girtiyên ser sînoran re hatî çêkirin û her carê sê mehan di wir de dima. Ji bo wê tu ferq û cudatî navbera wê girtîgehê û derveyî wê nebû. Ji aliyê aborî ve, ji wê re girtîgeh hîn baştir bû. Ji ber ku wê di girtîgehê de bertîla kişandina hewayê nedida.

"Ez kî me, ez kî bûm, ez bûme çî?"

Dema hin xortên ji welatê wê hatin dîtîn û bi wan re rewş û halê welêt bihîst û bîra wê ser hişê wê de qulipî, êşekê serê wê girt û nola tonek xwê bikeve ser sînga wê. Laşê wê giran bû, lêvên wê yên tenik û kelişî lerizîn û bi pîqêna girî re hêsirên çavên wê fena kaniyê teqiyan. Di wê kêlikê de kûrbûna biyanîbûna xwe ya ji xwe dît. Jixwe di ew qas salên li xerîbiyê mehê carekê ku ew ji nanê xwe kêmkir, karibû bi dayîka xwe re xeber bidaya. Ji wê



Nezîr Silo

zêdetir hemû hêz û hizra wê ew bû ku çawa nanê roja xwe peyda bike û wê rojê jî li kolanan nemîne birçî.

"Ez xwe bikujim ji vî halî baştir e."

Li ba wê êdî tişta herî hêsan mirin bû. Tenêti ji bo jinekê ne tişteki asayî ye. Ji ber kabûsan, bêaramî, bêewletiyê reviya, lê vê carê wê ew tişt tev li cihekî din bi cureyên din li pêşiya wê bûn. Ya ji van tevan xerabtir, ji xwe biyanîbûn û xwewindakirin bû. Revê dîsan her dem metirsiyên wê li wê hildigirtin. Ji bo wê xwekuştin ketibû serê wê û di beşa herî mezin a mejiyê wê de cih girtibû. Ji jehra mişkan û sisirkan jehreke kujar çêkiribû. Êdî hinekî vehesîbû. Ji ber ku her dem dikarî xwe ji wî halî xelas bike.

"Tênetî bes e, ez hevserbûnê jî biceribînim."

Wê vehesa wê demê hişt ku hestên wê hinekî bijenin. Temenê wê jî sih û pênc salan derbas dikir. Êdî li tişteki din digeriya. Nivîneke her dem germ û di paşilê zilamekî ku ji wî zarokekî çêbikê de raze. Her çendî ku ji her tiştî di rewşeke şik û gumanan de bû, xwest yarî, li hev şabûna laşên bi hev re



dilsoz tam bike; xewa di hembêza lawekî naşî de; soza girêdana bêdawî li xurbetê û di nav rewşa bêewletiyê de biceribîne. Ka wê ev yek wê ber bi ku ve bibe?

"Ez xwe avis bikim, an na?"

Vê pirsê demek dirêj di hişê wê de cih girt. Dizanî ku ew mafê penaberiyê li welatê ew lê bigire jî, ew nikare derfetên jiyanê ji bo wî/ê zarokî/ê çêbike, bibîne. Heta wê demê bi tenê bû, li çareya serê xwe dinêrî; dê vê carê bi zarokê re bibin malbatek sê kesên bêcih, bêkar, bêçare û bêpêşeroj li xerîbiya bêdilovan û xedar. Pir diponijî û di nava pêlên deryaya pirsên sotîner de dixeniqî. Dîsan xwekuştin hate bala wê, lê vê carê dilê wê yê bi hevserê wê diavêt ew ji van hizran dûr kir. Hemû çengelên pirsên di mejiyê xwe de avêtin, bendên avisbûnê sotandin, pişt da erdê û ling rakirin ji gana ji bo avisbûnê re. Xwe bi dînitî û hêza avjayan da gan.

"Ez avis bûm, wey Xwedê ez çi bikim?"

Ji bo wê kêşeyên jiyanê hew balkêş bûn. Di ku de zirav bibe bila di wir de biqete. Lê, dîsan gelek caran mat dibû. Pêlên pirsan û metirsiyan didan ser wê. Lê ji bo zayîna zarokî/ê biryara wê teqez bû. Di qunceke mejiyê xwe de hêvî dikir ku bûyîna zarokê ji bo wê şensekî baş be û gelek dergêhen nû li ber wê veke. Lê, jê zêdetir, wê heyîna zarokî/ê ji bo xwe, ji bo girêdana bi jiyanê re, wekî sedem û girêdana herî mezin didît. Ew nola werîsê herî qayîm ku xwe pê girê de jiyanê didît.


"Tişteki bi keçika min bibe, ez ê xwe bikujim."

Li nexweşxaneyê za. Zaroka wan keç bû. Heme navê wê danî Marî. Marî bi sosret ji mirinê filitî. Di mercên bêxwarinî, bêderman û bêpertî de Marî ya bêcih, bêpêşeroj û bêqoçan çavên xwe li xerîbiyê li dinyayê vekir. Ne tenê Marî nû çavên xwe li dinya yê vekirin, her wiha dayika wê ji nola zarekî ji nû ve hate dinyayê. Du zarok bi hev re ji dayik bûn.

Dengbêj: TEHSÎNÊ EVDIREHMAN

Amadekar: Hîlmî Akyol

Tehsînê Evdirehman: 58 salî ye. Li gundê Malêhafê ya li ser Pasûrê hatiye dinê. Ji Eşîra Hevêdaniyan e. 43 sal li gund jiyaye. Li gund heywan xwedî kiriye. Cotkarî kiriye. Rezvantiyê dike. 3 salan qaçaxçîtiyê dike. Dibistan nexwendiyê. Ji derve de ketiye îmtihanên û dîploma stendiye. Li mala kalê wî her şev civat û dengbêj hebûne. Ji civat û şevbêrk û dengbêjên kalê xwe (Evdilhelîm û Evdilwehab) hînî dengbêjiyê bûye. Her du dengbêj jî ji Malêhafê bûne. Li gund debara wî baş dibe. 15 sal e li Amedê ye. 8 zarokên wî hene. (6 kur û 2 keç)



Tehsînê Evdirehman

CANÊ

Wî le canê, canê hey canê canê hey canê
canê heyran im canê.

Wî le canê, mala bavê xirabê, dilê mi
cayîlê ji halê mi ra hîne hîne

Ez ê bala xwe didêmê, şube reysiyê me
rabiye, weyla te mal xirab e

Bitûna otizsekizliya bi hev digîne,

Wî le dîsa li Diyarbekra şewitî li
îstesiyona Elîparê ve digîne

Bilête van lawika dibire, dike qere trêna
reş, ser bêxwedî kopik û mesîla ra
diqelbîne,

Wî le qewlê van lawika li îstênbola
şewitî li ser Pira Heyder Paşa jê dertîne,

Canê canê heyran im canê

Wî le diya min tine, damariye

Kesekî min tine li welatê xerîb û xurbetê
têr li halê min bigirî

Canê hey canê, canê heyran im canê

Wî le Canê, canê hey canê canê hey canê
canê heyran im canê.

Wî le canê, mala bavê xirabê, wez ê
biketama bi hafa meydana Wî Stenbolê ji
xemîna dilê min û dost mihuba canê mi ra
çi fire ye.

Ez ê bala xwu didimê temamî kelik û
gemîne, de mala xwedî bişewite vapore
çarpa îskele ye

Wî eskerê temamî li îştîmayê, sûbayî
temamî li tekmlê temamî vî eskerê
denizçiyê behriye ye

Ez ê rabim kaxizkî yazmîş bikim. Ji
albayê xwu ra bişînim.

Kuro bira mala te xirabe tiyê teskereke
mi derxe, îro çendî car e li welatê xerîb û
xurbetê ez xerîb im, ketime çavê Gewra
xwe ya Canê,

Canê canê heyran im canê

Wî le diya min tine damariye,

Dilşewityê min tine li welatê xerîb û
xurbetê têr li halê min bigirî

Canê hey canê, canê heyran im canê

Nîşe: Ji bo parastina reseniyaya kilamê me
dest neda redaksiyona wê (Kovara W)

Ruşwet

Merivek hebû, di gundekî de dijiya, navê wî Teşxele bû. Zarokê wî hebûn, kitim bûn. Rojekê diçe nifûsê, ji midurê nifûsê re dibêje:

- Ez dixwazim nasnameya zarokê xwe derxim. Midur wî dişîne cem karmendekî. Teşxele diçe cem wî, ji wî re jî derdê xwe dibêje:

- Tu nasnameya zarokê min bidî min. Ew karmend jî wî dişîne cem yekê din, ew meriv jî îşê wî çênake. Teşxele jî di ber xwe de dibêje; "Seyî jî seyî re got û seyî jî ji dûvê xwe re got." Tê digihîjê ku ew ruşwetê nede wan, nikare nasnameya zarokê xwe ji wan bigire. Karmend wê demê bêruşwet kar nakin. Teşxele car din jî diçe cem midur jê re dibêje:

- Tu nasnameya zarokê min bidî. Ez ê diyariyeke gelek bi qîmet û bi bihagiran ji te re binim. Ji ber vê sedemê gel jî ji midur û karmendan pir aciz bûne. Dibên hema bila karê me nekeve nifûsê çi dibe bila bibe. Teşxele diçe mala xwe, ji xwe kar û barê wî seyd û nêçîr e. Hebekî tajiya wî û cilikek tajiya wî heye. Cilika tajiya wî jî pir gemar e, ji qirêjê reş dike û spî ketinê, bi cilikê re dişêlin.

Teşxele diçe kaxizek ji ambalajê tîne tê malê. Ew kaxiz jî cixcixe ye, gelek xweşik e, bi qordeleyeke rengîn girê dide û paket dike. Ew paket wek qutî gelek xweşik dibe. Bi sehera sibê re Teşxele berê xwe dide mala midur û diçe ber deriyê wan. Li derî dixe, jina midur derî vedike, dibîne ku wa ye camêrek li ber derî sekiniye. Paketek di destê wî de ye. Jinik li halê wî mêze dike wî nagire hundir. Ji ber ku ew meriv feqîr û belengaz e. Gazî mêrê xwê dike û dibêje:

- Ca were, merivek li ber derî ye, pirsas te dike. Ez wî nas nakim kî ye? Midur serê xwe dixe şibakê, Teşxele nas dike. Ji jina xwe re dibêje:

- Lez derî veke. Ew camêr Teşxele ye, wî

bigire hundir. Wî digirin hundir, taştêya wan jî li ber wan e. Teşxele diyariya xwe dide ser masê, ew jî li ser taştê rûdinê, bi wan re taştê dixwe. Midur nasnameyên zarokên wî ji cêba îşlika xwe derdixe, dirêjî mêvanê xwe dike. Teşxele radihêje nasnameyên xwe, ji destê wî digire û dixe cêba xwe. Çaya xwe vedixwin. Ketine axaftineke kûr, zarokên midur jî çav bi paketa diyarî xistine û li dorê diçin û tîn. Meraq dikan. Yek ji yekê re dibêje:

- Ev çi ye gelo? Ê din destê xwe daivêje qurdeleya pakêtê vedike. Bêhna cilika tajiye û tevî bişkula di nava malê de belav dibe. Mala wan gemar dibe. Jina midur bala wê dikevê diyariya mêvan ku çi bibîne. Cilikek tajiye û tevî qirêjê tevî bişkula li ser, li ber wê belav bû. Jinik bi ser midur û mêvan de hêrs dibe, qîrîn û qîjîn pê dikeve, ji beheca ji ser hişê xwe de diçe.

Midur ji Teşxelê re dibêje:

- Tu vê diyariya xwe ji vir bibe. Tu çi ji min bixwazî ez ê bidime te. Jinik ji qehra wê ji dest here. Teşxele dibêje:

- Ev diyariya min e. Ji bo te min aniye. Te ji min re nasname çêkiriye.

Min jî ji te re vê diyariyê anî, ev heqê te ye. Midur çi qasî hêvî û rica ji Teşxelê dike, ew camêr ji ya xwe nayê xwarê. Jinik çi qas tê ser hişê xwe, wê cilikê dibîne car din jî ji ser hişê xwe de diçe, dixeriqe. Midur ji wî re dibêje:

- Titûnek min a pir entîke heye û mengenekirî ye. A wa ye, di wê di tûrik de ye, here ji xwe re wî jî di ser de bibe. Teşxele tûrikê titûnê diavêje ser milê xwe û cilika xwe jî dide ber dilê xwe û gava ji mala midur derdikeve, dibêje: Gotinek me ya pêşiyar heye: 'Çav çavan germ dike bertîl keviran nerm dike.' Tu ji her kesî ruşwetê dixwazî, ê min jî ev ji min diqede.

Berhevkar: Rojîn Zarg